



Naveroka hejmara 8

Sernivîsar

Wergerandin di navbera zimanan de, r. 2

Husein Muhammed

Wergerandina makîneyî, r. 4

Celadet Bedirxan

Yekem ferhenga kurdî-kurdî, r. 50

Ergin Öpengin

Bizava wergerê di kurmanciyê de, r. 52

Hasan Aslan

Hînbûna kurdiya dimilî, r. 71

Cihê lêkera alîkar

"ê, dê, wê, yê" di hevokê de, r. 95

Hejmar û hejmarsazî

beşa duyem, r. 99

Zêdebûna dengê R li peyvan

bi hevkarî li gel Koma Zimanê Kurdî, r. 110

L. O. Fossum

Rêzimanekê kurdî ya pratîk, r. 111

Peter Trudgill (w: Hesenê Qazî)

Norwêjî wekû zimanêkî asayî, r. 113

"5000 peyvên kurdî di Quranê de"

bi kurmancî û zazakî, r. 122

Cudahiyên dengnasî

di navbera lehceyên kurdî de, r. 129

Edward Magin

Kurdish poetic feature & translation, r. 157

Haidar Mohamad & Ibrahim Morad

Problems of translating from English into Kurdish, r. 158

Zarname

Ferhengoka zimannasî ya kurdî-înglîzî, r. 168

Kurterêbera rastnivîsînê, r. 188

Sernivîsar

WERGERANDINA DI NAVBERA ZIMANAN DE

Mijara serekî ya vê hejmarê wergerandin e. Wergerandin yek ji babetên bingehîn yên derbarê ziman û zimannasiyê de ye. Loma em di vê hejmarê de ji çend aliyan ve bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî nêzîkî meseleyê dibin.

Bi kurmancî **Husein Muhammed** bi vekolîneke 50-rûpelî li ser wergerandina makîneyî anku wergerandina bi bernameyên kompûteran vê mijarê vedike. **Ergin Öpengin** dîroka bizav û tevgera wergerandina li kurmancî dide nasîn.

Bi inglîzî **Edward Magin** teza xwe ya masterê derbarê wergerandina helbestên kurdî (bi taybetî kurmancî) pêşkêş dike. Kanîzar hemû teza Maginî belav dike ku berhemeke hêja ye, ne tenê li ser wergerandina helbestan lê li ser zimanê kurdî bi awayekî giştî jî.

Heyder Mihemed û **Îbrahîm Elî** li ser pirsgirêkên wergerandina berhemên tiyatroyî ji inglîzî li kurdî (bi taybetî soranî) dinivîsin. Hesenê Qazî dîsa nivîsareke dirêj zimannasiyê ya profesor Peter Trudgill wergerandiye kurdiya soranî.

Bi zazakî **Roşan Lezgîn** nivîseke li ser meseleya peyvên kurdî di Quranê de ji kurmancî werdigerîne zazakî û em orijînal û wergera wê bi hev re belav dikin. **Hasan Aslan** bingehên rêzimana zazakî li kurmancî rabeî me dike û nimûne bi nimûne wan bi zazakî dinivîse û li kurmancî werdigerîne.

Ji bilî wergerandinê, em çend mijarên xwe yên herdemî jî didomînin:

Wek her carê, em di vê hejmarê de jî du kitêban didin nasîn. Yek jê "A Practical Kurdish Grammar" (Rêzîmaneke kurdî ya pratîk) ya **L. O. Fossum** ye ku sala 1919 bi inglîzî hatiye çapkirin. Em hemû wê kitêbê – ku heta niha jî yek ji baştirîn rêzîmanên kurdî yên bi inglîzî ye – dixin xizmeta xwandevanên xwe.

Kitêba din jî ferhenga **Celadet Elî Bedirxan** e ku wek yekem ferhenga kurdî-kurdî hatiye amadekirin lê heta sala 2009 nehatibû çapkirin. Destpêka ferhenga C. Bedirxanî amadekirî winda bûbû loma peyvên bi herfên A – E dest pê dikin ji aliyê zavayê wî **Selah Sadallah** ve dîsa hatibûn berhevkirin.

Di hejmara 8 de me vekolîneke berfireh li ser *hejmarên kurdî* dest pê kiribû. Ew lêkolîn di vê hejmarê de jî bi hejmarên rêzî didome û dê di hejmara 10 de jî berdewam be.

Nivîsareke me ya dirêj jî li ser *cudahiyên dengnasî di navbera lehceyên kurdî* de ye.

Vê carê jî em *Zarnameyê* anku ferhengoka xwe ya zimannasî dîsa berfirehtir belav dikin.

Kerem bikin kovara xwe Kanîzarê bixwînin û jê re binivîsin.

WERGERANDINA MAKÎNEYÎ

Husein Muhammed

Diyarî bo Muhemmed Teqevî û Zinar Ednan

1. NASANDINA MIJARÊ

Mebest ji **wergerandina makîneyî** (kurtkirî WM, bi inglîzî *machine translation, MT*) veguhastina berhemekî bi zimanekî tebîî (siriştî, xwezayî) nivîsandî (yan axiftî) li zimanekî din yê tebîî bi alîkariya makîneyan (kompûteran) e. Di zimannasiyê de wergerandina makîneyî beşek ji zimannasiya kompûterî (computational linguistics) e.

Di vê vekolînê de mebesta me wergerandina nivîsan (yan dangan) e, ne wergerandina tenê peyvan (ferhengên elektronîkî) û ne bernameyên veguhastina tekstên kurdî ji alfabeyeke kurdî (bo nimûne alfabeya latînî) li alfabeyeke din ya kurdî (bo nimûne alfabeya erebî).

Dîroka wergerandina makîneyî salên 1940 dest pê kir gava ku yekem teoriya wergerandina hat pêşkêşkirin. Yekem ceribandinên wergerandina makîneyî sala 1954 di wergerandina ji inglîzî li fransî li Brîtanyayê û ji rûsî li inglîzî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dest pê kirin.

Heta van salên dawiyê wergerandina makîneyî tenê di navbera çend zimanên mezin yên dinyayê (inglîzî, fransî, almanî, rûsî û hinekî derengtir japonî, çînî, erebî) de dihat kirin. Lê vê dawiyê mirov dikare bibêje ku hejmara zimanên ku wergerandina makîneyî pê tê kirin hilteqiye: Bo nimûne, navdartirîn bernameya wergerandinê, *Google Translate* (GT) wergerandina makîneyî di navbera nêzîkî 100 zimanan de dike.¹ Îsal yekem car kurdî jî (heta niha tenê kurmançî) tevî van zimanan bûye.

Bernameyên mezin yên wergerandinê êdî ne tenê wergerandina makîneyî ji zimanekî li zimanekî yan ji çend zimanan li zimanekî yan ji zimanekî li çend zimanan dikin. Ew êdî wergerandina makîneyî di

¹ <https://translate.google.com/>

navbera nêzîkî 100 zimanan de dîkin. Bi gotineke din, wergerandina ji her yekê ji wan zimanan li hemû wan zimanên din jî mimkin e.

Bo nimûne, *Google Translate* ne tenê wergera kurdî-înglîzî yan înglîzî-kurdî lê wergerandina di navbera kurdî û – wek mînak – erebî, farisî, tirkî, çînî, rûsî, hindî, japonî, koreyî, swahîlî û bi dehan zimanên din de dike. Heta eger mirov nizane teksta heyî bi çî zimanî ye jî, bernamêya navborî dikare ji mirovî re bibêje ew tekst bi çî zimanî ye û dikare bo mirovî li zimanê xwastî wergerîne.²

Bernameyên wergerandinê adeten li ser bîngehê xezîneyên tekstên wergerandî hatine avakirin. Bo nimûne, di xezîneya bernamêyê de dikare gelek tekstên kurdî û înglîzî hene ku wergerên hev in.

Wergerandina makîneyî wisa dixebite ku bernamêya wergerandinê bi otomatîkî ji xezîneya tekstên wergerandî li hevberên hevok û peyvên wergerandî digere. Bo nimûne, gava ku mirov bixwaze hevoka "navê te çî ye?" ji kurdî li înglîzî wergerîne, mirov wê tekstê di bernamêyê de dinivîse û bernamê li xezîneya xwe ya nivîsên wergerandî (kurdî-înglîzî) digere û hewl dide hevbera wê di nav tekstên înglîzî de bide.

² *Google Translate* tekstên wan zimanan nas dike ku GT wergerandinê pê dike. Eger zimanê tekstê di nav zimanên wergerandina wê bernamêyê de tine bin, hingê bernamê dê tekstê wek nivîsa bi zimanekî dişibe zimanê tekstê pêşkêş bike. Bo nimûne, eger mirov teksteke bi soranî bi alfabeya kurdî-erebî bide, GT bi piranî idia bike ku ew teksteke farisî ye (carinan idia dike ku teksteke urdûyî, peştûyî yan erebî ye) û hewl dide wê "ji farisî" (yan ji yek ji wan zimanên din yê gotî) wergerîne ji ber ku GT heta niha soranî nas nake û ji/li soranî wernagerîne. Lê eger mirov heman teksta soranî bi alfabeya kurdî-latînî binivîse, hingê GT wê tekstê wek kurmançî dihesibîne û hewl dide wê "ji kurmançî" wergerîne. Tevî ku soranî ji gelek hêlan ve nêzîkî farisî ye jî, lê wergerandina soraniya bi alfabeya kurdî-erebî "bi xêra farisî" bi bernamêyê qet bi ser nakeve. Ji bilî cudahiya herdu zimanan, herwiha cudahiya nivîsîna wan jî mezin e ji ber ku di farisî de adeten vokalên "e, ê, i, o, u" nayên nivîsîn. Wergerandina ji soraniya bi alfabeya kurdî-latînî "bi xêra kurmançî" bi bernamêyê jî gelek pîrsgirêkan bi xwe re tîne ji ber ku gelek peyvên soranî (bi taybetî formên çemandî/tewandî) yê peyvên di nav xezîneya xwe ya tekstên kurmançî de nabîne û carinan jî ji ber ku heman peyvê peyda dike lê maneya peyvê di kurmançî û soranî de ji hev cuda ye.

Berî ku kurdî (kurmançî) li GT were zêdekirin, bernamêyê tekstên kurmançî bi piranî wek nivîsên indonezî/malezî dihesibandin û hewl dida wan ji wan zimanan wergerîne. Sebebê vê texmîna bernamêyê bi esehî nayê zanîn lê ihtimalen ji ber ku hin peyvên wan zimanan û kurdî bi şikil dişibin hev. Lê di rastiyê de ti têkiliyeke malbata zimanî yan jî cîraniya zimanî di navbera kurdî û indonezî/malezî de nîne. Loma heta eger tekstên kurmançî wek indonezî/malezî bihatina nasîn û wergerandin jî, ji bilî tesadîfîyê, encama wergerê 100 % şaş dibû.

Hevokên wek "navê te çi ye?" bi ihtimaleke mezin dê bi temamî di xezîneya bernameyê de hebin û bername dê wergera wê yekser ji tekstên heyî bi temamî neqil bike û bi ihtimaleke mezin werger dê rast be.

Lê eger mirov hewl bide hin hevokên dirêjtir, tevlihevtir (komplekstir) yan nadirtir wergerîne, mimkin e ku ti hevokeke bi temamî wek wê di xezîneya bernameyê de di nav tekstên wergerandî de peyda nabe. Loma makîneya wergerandinê neçar e ku wergerandinê bi parvekirin û hevghandina naveroka du yan çend hevokên di xezîneyê de heyî pêk bîne.

Bo nimûne, belkî (yan jî bi ihtimaleke mezin) di xezîneya tekstên heyî ya bernameya wergerandinê de ti hevokên bi temamî wiha û wergera wê ya inglîzî peyda nebin: "Ez îro ji normal derengtir hişyar bûm ji ber ku duh êvarê zû xewa min li dema xwe nehat."

Lê dîsa jî bername dê hewl bide hevoka me wergerîne. Bername dê hevokê parçe-parçe bike û hewl bide her parçeyeke wan di xezîneya xwe ya tekstên wergerandî de bibîne. Tevî ku hevoka nimûne bi temamî di tekstên heyî de peyda nabe jî, bi ihtimaleke gelek mezin hemû peyvên wê dê di bernameya wergerandinê de peyda bibin ji ber ku hemû ew peyv di kurdî (kurmançî) de peyvên sade ne ku di gelek tekstan de tên dîtîn.

Gava ku bername hevoka me ya nimûne bi temamî wisa ji xezîneya xwe peyda neke jî, ew dê li hevokên pir nêzîkî wê bigere. Bo nimûne, mimkin e ku hevokeke wek "ez îro heta hişyar bûm" û herwiha hevokeke din ya bi awayê "duh êvarê zû xewa min nehat." bibîne.

Di hewla wergerandina hevoka me ya nimûne de, bernameya wergerandinê dê van herdu hevokên xwe yên kurttir bi kar bîne û peyvên mayî ("Ez îro ji *normal* derengtir hişyar bûm ji ber ku duh êvarê zû xewa min *li dema xwe* nehat.") jî ji hinek hevokên din yên di xezîneyê de bigire û wergereke li gor şiyana xwe pêşkêş bike.

2. BERNAMEYÊN WERGERANDINA MAKÎNEYÎ

Ji salên 1950an ve hejmareke mezin ya bernameyên wergerandinê hatine avakirin. Hinek ji wan tenê wergera ji zimanekî li zimanekî din (bo nimûne ji inglîzî li fransî) werdigerînin. Hinek bi dualî di navbera du zimanan de wegerandinê dikin (wek mînak ji almanî li inglîzî û ji inglîzî li almanî werdigerînin). Hinek jê wergerandinê ji zimanekî li çend zimanan dikin (bo nimûne ji inglîzî li fransî, rûsî û spanî) û hinek jî ji çend zimanan werdigerînin zimanekî (bo nimûne ji japonî, çînî û rûsî li inglîzî werdigerînin). Hinek bername di navbera çendîn zimanan de werdigerînin (bo nimûne ji her yek ji inglîzî, almanî, fransî, erebî, japonî, çînî, spanî, rûsî li her yekê wan zimanan).

Hinek ji bernameyên wergerandinê bo bikaranîna navxweyî anku hindirîn in. Bi gotineke din şîrket an dezgehek wê bo xwe bi kar tîne. Hinek bernameyên wergerandinê jî giştî ne û her kes dikare bo xwe bixebitîne. Li vê derê em ê çend ji van bernameyên wergerandinê yên giştî bidin nasîn, bi taybetî jî wan bernameyan ku kurdî jî di nav zimanên wan de heye anku ew ji/li kurdî jî werdigerînin.

Navdartirîn bernameya wergerandinê ya niha *Google Translate*³ (GT) e. Ew ji hemû bernameyên wergerandinê yên din zêdetir zimanan jî dihewîne. Ew di navbera teqriben 100 zimanan de werdigerîne û dikare ji her yekê ji wan li her yekê ji wan wergerîne. Lê wergerandina di navbera hemû zimanan de di GT de bi navbeynkariya inglîzî ye. Bo nimûne, eger em bixwazin nivîsekê ji çînî wergerînin fransî, GT pêşî wê ji çînî werdigerîne inglîzî (bêyî ku nîşanî mirovî bide) û dû re ji inglîzî werdigerîne fransî.

GT bi ihtimaleke mezin tek bernameya wergerandinê navneteweyî (ne ya kurdan avakirî) ye ku ji û li kurdî jî werdigerîne⁴ anku nivîsên bi kurdî (niha tenê kurmancî) werdigerîne zimanên din û nivîsên bi zimanên din werdigerîne kurdî. Bo nimûne, eger em di malika wergerandinê ya GT de bi kurdî binivîsin "Gelo tu ji zimanê xwe hez dikî?", bername dê wê di saniyekê de wek "Do you love your language?" li inglîzî wergerîne ber çavên bikarînerê bernameyê. Yan eger mirov nivîsa "He is my

³ <http://translate.google.com>

⁴ www.stars21.com jî ji/li kurdî werdigerîne lê di rastiyê de tenê kopîya GT ye û ne ti bernameyeke serbixwe ye.

friend” bi inglîzî di bernameyê de binivîse, ew dê yekser wê bo me wek ”Ew hevalê min e” wergerîne kurdî.

Duyem bernameya wergerandinê ya mezin *Bing Translator*⁵ e ku di navbera nêzîkî 60 zimanan de werdigerîne. Kurdî di nav de nîne lê bo nimûne erebî, farisî û tirkî hene.

Bi hejmara zimanên xwe, dûv re *Babylon* tê ku bi navê *Altavista* jî tê nasîn.⁶ Ew di navbera 30 zimanan de werdigerîne. Dîsa kurdî di nav de nîne lê bo nimûne erebî, farisî û tirkî hene.

Pey re *Babelfish*⁷ tê ku di navbera 15 zimanan de werdigerîne. Ne kurdî û ne jî farisî yan tirkî di nav de nînin lê erebî heye.

Bi ihtimaleke mezin tek bernameya wergerandinê ya kurdan ava kirî ya giştî *InKurdish*⁸ e. Ew 20 zimanan rêz dike lê di rastiyê de tenê dikare ji inglîzî û erebî wergerîne kurdî û ji kurdî jî tenê werdigerîne inglîzî. Ji kurdî mirov dikare alfabeya kurdî-erebî yan jî kurdî-latînî bibijêre. Ji lehceyên kurdî jî mirov dikare soranî yan kurmancî bibijêre.

Bernameya *InKurdish* zêdetir bo alfabeya kurdî-erebî û lehceya soranî hatiye avakirin û baştir li wê werdigerîne, ne li kurmancî. Di xezîneya bernameyê de tekst û wergerên kurdî yên bi alfabeya kurdî-erebî hatine danîn. Mirov dikare bibijêre ku werger li şûna soranî bi kurmancî be. Lê wisa diyar e ku xezîneya bernameyê ya kurmancî ne têra xwe zengîn e. Gava ku bername di xezîneya xwe de wergera peyvekê yan gotinê di kurmancî de nebîne, wê bi soranî dide. Ev jî kurmanciya wergerê dike sormancî.

InKurdish tek bernameya wergerandina ji/li soranî ye. Ew ne hindî GT profesyonel û pîse_yî ye lê wergerandina wê li soranî – eger ji kurmanciya GT ne baştir be – ne xirabtir e.

Yek ji hêjayiyên bernameya *InKurdish* ew e ku ew hem hevokan werdigerîne û hem jî li bin wê her peyvê bi hemû wateyên wê yek bi yek rêz dike. Wateyên peyva inglîzî hem bi kurmancî û hem jî bi soranî (bêyî ku wan ji hev parve bike) dide.

Divê vekolînê em ê ceribandînên wergerandina makîneyî û nimûneyên ji wan ji bernameya *Google Translate* bidin ji ber ku ew hem mezintirîn bernameya wergerandinê ya hemû dinyayê ye û ji ber

⁵ www.bing.com/translator

⁶ <http://translation.babylon-software.com/>

⁷ <https://www.babelfish.com/>

⁸ www.inkurdish.com

ku ew dikare ji kurdî wergerîne nêzîkî 100 zimanên din û ji wan zimanan jî wergerîne kurdî. Lê mijar û meseleyên ku em ê behs bikin ne tenê bi yek yan çend bernameyên wergerandinê ve girêdayî ne lê pirs û pirsgerêkên giştî yên hemû wergerandina makîneyî ne.

3. TESÎRA ÇAWANIYA ORIJÎNALÊ LI SER WERGERÊ

Xezîneya tekstên heyî û wergerên wan di bîra bernameyê de, bi awayekî giştî kalîteya wergerandina makîneyî baştir dîkin. Li aliyekî din, mijara tekstê çend bisinortir be, çêtir dikare were deqîq û rast were wergerandin.

Bo nimûne, pêşbînîkirinê derbarê rewşa hewayî hemû bi hejmareke pir bisinor ya peyv û hevokan tîr ragihandin (gotin yan nivîsîn). Loma mimkin e ku mirov hemû wan peyv û hevokan di bernameyê wergerandinê de bi cih bike û bi wê bernameyê her roj tekstên derbarê rewşa hewayî wergerîne. Wergerandina wisa dikare teqrîben bê kêmasî be.

Lê wek din bikaranîna zimanî pîralî û di pratîkê de bêsînor e: mirov herdem dikare hin hevokên nû yên qet ti caran heta hingê nehatî çêkirin ava bike. Bi taybetî di edebiyata spehî anku di roman, novel, çîrok, helbest û hwd. de hevokên gelek pîralî, asê û tevlihev hene û roj bi roj yên cuda tîr çêkirin ku belkî bi temamî yekta ne: ti hevokên bi temamî wek wan peyda nabin.

Di navbera hevokên pir sade û sabit yên pêşbînîkirinê derbarê rewşa hewayî li aliyekî û vehûnandinê taybet û yekta yên edebiyata spehî, li navê nivîsên nûçeyî hene ku bi gelek awayan sabit û sade ne lê dîsa jî hin tiştên taybet û carinan yekta jî hene.

Wergerandina makîneyî bi taybetî di mijara wergerandina nûçeyan de balkêş e: tekstên nûçeyî û agadarî bo bikarînerên bernameyên wergerandinê giring in ji ber ku mirov dixwaze bizane ka çi bûye yan çi dê bibe. Li aliyekî din jî, tekstên nûçeyî bo pêşxistina bernameyên wergerandinê jî pir giring in: Heman nûçe gelek caran li gelek zimanan tê wergerandin (bo nimûne li ser malperên nûçevanî

yên pirzimanî⁹). Ev nûçe dikarin bo nav xezîneya tekst û wergeran ya bernameya wergerandinê bîn wergirtin û bi xêra wan kalîteya wergerandinê were başkirin.

4. WERGERANDINA JI KURDÎ – INGLÎZÎ Û KURDÎ – ZIMANÊN DIN

Li jêr em ê bi nimûneyan li meseleyên serekî yên wergerê binêrin. Em ê pêşî behsa wergerandina di navbera kurmançî û inglîzî de bi rêya *Google Translate* (GT) bi berfirehî û bi nimûneyan bikin.

Dû re em ê bi behsa wergerandina bi heman bernameyê di navbera kurmançî û zimanên din de (bi qasî 100 zimanan) bikin. Sebebê cudahî û giringiya navbera kurmançî û inglîzî ne tenê ew e ku inglîzî zimanê serekî yê navneteweyî ye lê herwiha ji ber wê ye ku bernameya GT wergerandina navbera zimanên din bi rêya inglîzî dike. Bo nimûne, eger mirov bixwaze bi GT tekstekê ji kurdî wergerîne tirkî yan erebî, pêşî GT wê tekstê di sîstema xwe de ji kurdî werdigerîne inglîzî û pey re jî wê ji inglîzî werdigerîne tirkî yan erebî.

Ev "navbeynkariya" zimanê inglîzî ji bikarînerên GT re nayê dîtin lê navbeynkariya inglîzî di vê mijarê de bi berfirehî tê zanîn.¹⁰ Mirov dikare vê rastiyê bi hin nimûneyan jî isbat bike. Wek mînak, di inglîzî de "you" hem maneya "tu" û hem jî wateya "hûn" (û herwiha wateya "te" û "we") jî dide. Di kurdî û tirkî de "tu" (bi tirkî "sen") û "hûn" (bi tirkî "siz") ji hev cuda ne. Lê gava ku mirov hewl dide teksteke ev peyv tê de di navbera kurdî û tirkî de wergerîne, gelek caran "tu" û "hûn" di wergerandina bi GT de tevlihev dibin:

Min roja 20.11.2016 bi kurdî wiha nivîsîn û bi tirkî jî encameke wiha jê derket:

- wergerandina bi GT: kurdî "Hûn heval in" → tirkî "Sen arkadaş"
- wergerandina rast: kurdî "Hûn heval in" → tirkî "Siz arkadaş[sınız]"

⁹ Bi kurdî û hin zimanên din bo nimûne www.rudaw.net/kurmanci, www.krg.org, ku.hawarnews.com, www.anfkuordi.com û gelekên din.

¹⁰ Binêrin bo nimûne: <https://www.quora.com/Does-Google-Translate-use-English-as-an-intermediary-step-language>

Ev awayê bikaranîna inglîzî wek zimanê navber di wergerandina hemû zimanan de hem kêmasiyek e û hem jî derfetek e:

Ew kêmasiyek e ji ber ku ew şaşiyên muhtemele duqat yan çendqat dike: Hem di wergerandina makîneyî ya ji kurdî li inglîzî de kêmasî derdikevin û hem jî di wergerandina ji inglîzî li tirkî de kêmasî derdikevin anku kêmasî di wergerandina neyekser de xeletî zêdetir dibin. Loma eger GT xezîneyeke berhevdana tekstên kurmançî û tirkî berhev bi kar bianiya û wergera navbera kurdî û tirkî yekser bikira û inglîzî nexista navberê.

Ne tenê hebûna navbeynkariyê wergerandina di navbera kurdî û tirkî de lawaz dike lê navbeynkariya inglîzî rê li ber wê jî digire ku xezîneyên berfireh yê wergerên kurdî-tirkî û bi taybetî jî tirkî-kurdî nekevin xizmeta başkirina kalîteya wergerandina navbera kurdî û tirkî.

Li aliyekî din bi xêra navbeynkariya inglîzî wergerandina navbera kurdî û hejmareke mezin ya zimanên din jî mimkin dike ku wek din dê qet ne gengaz û pêkan bûya. Bo nimûne, mirov dikare niha bi GT di navbera kurdî û japonî, kurdî û hindî, kurdî û çînî û kurdî û gelek zimanên din de jî wergerandina makîneyî pêk bike. Ev tenê bi navbeynkariya inglîzî mimkin e ji ber ku xezîneya tekst û wergerên wan yê bi inglîzî û her yekê ji van zimanan hene lê di navbera kurdî û van zimanan de xezîneyên tekst û wergerên wan yan qet tine ne yan jî wisa kêm in ku bi ti awayî têra avakirina bernameyê bikêrhatî ya wergerandinê nakin ji ber ku hema-hema qet nivîs ji kaponî, hindî yan çînî (zimanên biçûk li alî) li kurdî nehatine wergerandin û ji kurdî jî li van zimanan nehatine wergerandin yan jî gelek-gelek kêman hatine wergerandin.

Anku navbeynkariya inglîzî hem kêmasiyan bi xwe re tîne ji ber ku xeletiyên wergerandinê zêde dike lê hem jî xêreke mezin li gel xwe tîne ji ber ku wergerandina di navbera zimanên wisa de jî mimkin dike ku ne xwedî xezîneyeke bikêrhatî ya tekst û wergerên hevpar in.

Di pêşerojê de dê baş be ku wergerandina yekser di navbera wan zimanan de hebe ku xwedî xezîneyeke dewlemend ya tekst û wergerên hevpar in (bo nimûne kurdî û tirkî ji ber ku di navbera van herdu zimanan de tekstên wergerandî gelek hene) lê inglîzî wek zimanê navbeynkar bimîne di navbera du zimanên wisa de ku ne xwedî xezîneyeke zengîn ya tekst û wergerên hevpar in (wek mînak kurdî-hindî yan çînî-kurdî).

5. NIMÛNE 1: WERGERANDINA JI KURDÎ LI INGLÎZÎ

Em ê li vê derê teksteke tîpîk ya nûçeyan ya bi kurmancî nivîsandî bi makîneyî, hê deqîqtir bi *Google Translate* li inglîzî wergerînin û wan bidin ber hev daku bi nimûneyan hêjahî û kêmasiyên wan diyar bikin. Em ê hewl bidin wan kêmasiyan berçav bikin ne bi tesadîfî di vê wergerê de hene lê heman pîrsgirêk tîpîk û berbelav in.

Metna orijînal bi kurmancî li ev e (bo hêskirina şirovekirinan li jêr, em ê bend û paragrafên nivîsara orijînal û wergera wê bi hejmaran rêz bikin. Di eslê nivîsa kurmancî û di wergera wê ya makîneyî de paragraf bêhejmar in – me ew lê zêde kirine):¹¹

- 1) **Parêzgarê Helebce: Terorîstan xwe veşartine**
- 2) Helebce (Rûdaw) – Parêzgarê Helebce ragihand ku ew çekdarên ku li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hatibûne dîtin xwe veşartine û hêzên ewlekariyê jî herêm dorpêç kirine.
- 3) Êvara roja Şemiyê (19/11/2016) li ber çemê gundê Giryanê ku dikeve 21 kîlometre bakûrê rojhilatê Helebceyê, 5 çekdarên ne naskirî hatine dîtin. Piştî ku hêzên ewlekariyê hatine agahdarkirin, di navbera çekdaran û hêzên asayîşa Helebceyê de şer derket.
- 4) Derbarê mijarê de Parêzgarê Helebceyê Elî Osman ji Rûdawê re axivî û got: “Niha rewşa ewlekarî ya Helebce û navçeyên wê di bin kontrolê de ye û ti pîrsgirêkekî ewlekariyê nîne. Ew devera ku çekdar lê hatine dîtin di bin dorpêçê de ye û çekdaran xwe veşartine. Helmeta girtina çekdaran berdewam dike.”

¹¹ Nivîsa kurmancî ji vê derê hatiye wergirtin: <http://rudaw.net/kurmanci/kurdistan/20112016>

- 5) Medyaya YNKê, li ser zarê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere dike ku ev koma çekdaran terorîst in û niha bi hevkarîya asayîşa Şarezûrê hatine dorpêçkirin.
- 6) Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê herwiha radigihîne ku zanyariyên wan li ser vê komê hebûye û hewiha hemwelatîyan piştrast dike ku dê mal û canê wan parastî be.
- 7) Pêşmergeyê bi navê Merîwan Mihemed Emîn (27) roja Şemiyê (19-11-2016), li gel 3 hevalê xwe yê din ji bo geşteyê çûbûne gundê Giryane û li wir rastê vê koma çekdar hatibûn.
- 8) Merîwan û hevalên wî, derbarê komê de asayîşê agahdar dikin û di vê navberê de koma çekdar gulle li wan dibarîne û Merîwan bi sivikî birîndar dibe.

Wergera kurmancî bi *Google Translate* wiha ye (li gor encama ku min roja 15.11.2016 bi vê bernameyê wergirtiye¹²):

1) Governor of Halabja: Terrorists have hidden their

- 2) Halabja (Reuters) - The governor of Halabja said the gunmen on the border of South and East had been hiding and surrounded by the security forces in the region.
- 3) On Saturday evening (19/11/2016) in the river village, located 21 kilometers north-east of Halabja, 5 fighters have been known. After that the security forces were informed, between gunmen and security forces in Halabja occurred.

¹² Mimkin e ku di wergerandina car û demên cuda de encama wergerandina makîneyê jî ne bi temamî wek hev be lê hin cuda tê de peyda bibin.

- 4) On the issue, the governor of Halabja Ali Othman spoke and said: "Now the security situation in the region of Halabja is under control and there is no security problem. Where armed but were under siege and gunmen hiding. Scotland continued arrest of the attackers. "
- 5) PUK media, quoted in the Kurdistan Region Security Service revealed that a group of armed terrorists in and cooperation with security experts have been surrounded.
- 6) Security Service also reported that their information on this group, and also Hua assure citizens that their life and property will be protected.
- 7) Alliance with storytelling Muhammad Amin (27), Saturday (19-11-2016), along with 3 other friend who had gone for the tour of the village girl right there and this armed group.
- 8) The man and his friends, inform the police about the group, and in the meantime, the armed group fired at them shows a man slightly injured.

6. NIRXANDINA NAVEROKA WERGERA NIMÛNE 1

Ji aliyê naverokê ve, bi awayekî giştî mirov dikare bibêje ku mijar û mesele di wergerê de jî hatiye parastin: hin çekdarên gumanbar li Helebceyê hatine dîtin, hin kesan hêzên asayîş û ewlehiyê agadar kirine û hêzên asayîşê li wan digerin.

Bo ku kêmasiyên naverokê werin dîtin, çêtir e em nivîsa orijînal ya kurdî û wergera wê ya inglîzî bend bi bend anku paragraf bi paragraf bidin ber hev. Li vê derê em ê tenê naveroka anku wateya teksta orijînal û ya werger bikin. Dû re em ê dorê bidin kêmasiyên (rê)zimanî anku vê gavê em ê guh nedin wan:

Benda 1

- Parêzgarê Helebce: Terorîstan xwe veşartine
- Governor of Halabja: Terrorists have hidden their

Wateya orişnala kurdî û wergera inglîzî bi temamî wek hev e.

Benda 2

- Helebce (Rûdaw) – Parêzgarê Helebce ragihand ku ew çekdarên ku li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hatibûne dîtin xwe veşartine û hêzên ewlekariyê jî herêm dorpêç kirine.
- Halabja (Reuters) - The governor of Halabja said the gunmen on the border of South and East had been hiding and surrounded by the security forces in the region.

Hem orişnal û hem jî werger diyar dîkin ku nûçe ji Helebceyê ye.

Teksta kurdî diyar dike ku nûçe ji aliyê Rûdawê ve hatiye belavkirin lê wergera inglîzî idia dike ku ajansa nûçeyan ya Reutersê ew pêşkêş kiriye. Ev bi zelalî şaşî ye. Sebeb ew e ku ihtimalen ev bernameya wergerandinê tora medyayî ya Rûdawê nas nake û li cihê wê navê ajanseke serekî ya navneteweyî daku ji ber ku li destpêka gelek nûçeyên inglîzî de dide. Gelek caran wergerandina makîneyî bi wê tê tawanbarkirin ku ew navên taybet (bo nimûne "Rûdaw" ku navê dezgeheke medyayê ye) ji navdêrên giştî ("rûdaw" anku "bûyer, hadîse, qewimîn") cuda nake. Eger mirov tenê peyva "Rûdaw" di GT de binivîse, ew dê wê wek "events" wergerîne ku maneya "rûdaw, bûyer, hadîse, qewimîn" bide. Lê li vê derê bernameyê fehm kiriye ku mebest ji "Rûdaw"ê ajanseke nûçeyan e lê navê wê yê rast di inglîzî de peyda nekiriye loma bi şaşî "Reuters" (bixwînin "Roytîrz") nivîsiye ku hem ajanseke nûçeyan e û hem jî bi deng û herfên xwe dişibe "Rûdaw"ê.

Meseleya "Rûdaw" û "Reuters"ê di wergerandina makîneyî de mijareke giring e: makîne hewl dide wateya peyvê peyda bike lê eger peyda nekir, hingê li navekî nêzîkî wî di zimanê wergir de digere. Mixabin ji rastderketina tesadîfî zêdetir caran ew dibe sebebê xeletiyê. (*şibandin*).

Wek din hevok bi mane û naveroka xwe ve rast hatiye neqilkirin. Tek kêmasiya heyî ew e ku di orijînalê de behsa Başûr û Rojhilatê *Kurdistanê* tê kirin lê di wergera inglîzî de peyva Kurdistan jê ketiye (*jêketin*).

Benda 3

- Êvara roja Şemiyê (19/11/2016) li ber çemê gundê Giryanê ku dikeve 21 kîlometre bakûrê rojhilatê Helebceyê, 5 çekdarên ne naskirî hatine dîtin. Piştî ku hêzên ewlekariyê hatine agahdarkirin, di navbera çekdaran û hêzên asayîşa Helebceyê de şer derket.
- On Saturday evening (19/11/2016) in the river village, located 21 kilometers north-east of Halabja, 5 fighters have been known. After that the security forces were informed, between gunmen and security forces in Halabja occurred.

Naveroka vê bendê bi piranî wek xwe maye lê hinek kêmasî tê de peyda bûne: di orijînalê kurdî de behsa dîtina çekdaran *li ber çemê gundê Giryanê* tê kirin lê di wergera inglîzî de tenê dibêje ew *li gundê çemî* (in the river village) hatine dîtin anku navê gundê anku Giryanê hatiye avêtin û nehatiye gotin ku çekdar li ber çemî hatine dîtin lê gotiye ku "li gundê çemî" hatine dîtin.

Di teksta kurdî de "5 çekdarên ne naskirî hatine dîtin" lê di wergerê de "5 şerker hatine zanîn / pêhesîn". Di teksta kurdî de tê gotin ku "şer derket" lê di wergerê de tenê dibêje "qewimî" (occurred) bêtir ku bibêje "şer qewimî".

Benda 4

- Derbarê mijarê de Parêzgarê Helebceyê Elî Osman ji Rûdawê re axivî û got: "Niha rewşa ewlekarî ya Helebce û navçeyên wê di bin kontrolê de ye û ti pirsgrêkekî ewlekariyê nîne. Ew devera ku çekdar lê hatine dîtin di bin dorpêçê de ye û çekdaran xwe veşartine. Helmeta girtina çekdaran berdewam dike."
- On the issue, the governor of Halabja Ali Othman spoke and said: "Now the security situation in the region of Halabja is under control and there is no security problem. Where armed but were under siege and gunmen hiding. Scotland continued arrest of the attackers. "

Hevoka yekem di orijînal û wergerê de wek hev e lê di ya kurdî de "ji Rûdawê re" heye ku ji wergerê hatiye avêtin (*jêketin*). Di heman hevokê de bi kurdî navê parêzgar anku walî wek "Elî Osman" hatiye nivîsîn lê di wergerê de wek "Ali Othman" ku zêdetir dişibe forma navê Osman bi erebî (Uthman). Yek ji prensîpên serekî yê navnasiyê niha ew e ku navên kesan (eger bi heman alfabeyê din) wek bi zimanê orijînal tên nivîsîn. Lê di wergerandina GT de navên kurdî yê esil-erebî adeten li gor rastnivîsîna inglîzî tên guherandin. Bo nimûne, "Mihemed, Hesên, Ehmed, Mistefa" di wergera inglîzî de dibin "Muhammad, Hassan, Husayn, Ahmad, Mustafa".

Herçi navên kurdî yê watedar in anku navên ji peyvên di zimanî de li kar in, gelek caran ew tên wergerandin tevî ku ew di tekstan de navê kesan jî bin. Loma bo nimûne "Karzan, Sosin" dibin "professional, tulip" anku "karzan/şareza, gula sosin" lê "Rizgar, Zozan" di ceribandîna min de wek xwe man. Li aliyekî din, navê keşan "Nêrgiz" bû "Narcissus" anku Narkîsosê xweperist li gor mîtolojiya yûnanî. (*meseleya navên taybet*)

Di hevoka duyem ya tekst û wergera me de behsa "Helebce û navçeyên wê" anku qezayên wê tê kirin lê di wergerê de gotina "devera/navçeya Helebceyê" (in the region of Halabja) hatiye bikaranîn.

Di hevoka sêyem de bi kurdî "Ew devera ku çekdar lê hatine dîtin di bin dorpêçê de ye û çekdaran xwe veşartine." Wergera wê ya inglîzî dibêje "bi çek bûn lê di bin dorpêçê de bûn û çekdar xwe vedişêrin." (Where armed but were under siege and gunmen hiding.) Anku naverok hinekî hatiye parastin lê gelek hin tişt jî guherîne.

Hevoka dawiyê ya vê bendê bi kurdî dibêje "Hemeta girtina çekdaran berdewam dike." Wergera wê ji nişkê ve tiştekî seyr û sosret diavêje ber mirovî û dibêje "Skotlandê / Îskoçyayê girtina êrişkeran dewam kir." (Scotland continued arrest of the attackers.)

Wek ku hatiye dîtin, nûçe li ser bûyereke li Kurdistanê ye û ti têkilî bi Skotlandê anku Îskoçyayê ve nîne. Lê dîsa jî wergera makîneyî wisa dibêje. "Helmet" hemle û operasyon e lê bernameyê li cihê wê navê welatê Skotlandê daye.

Sebebê vê sosretê ew e ku bernameya wergerandina peyva "helmet" di nav xezîneya xwe ya tekstên kurmancî yê wergerandî de nedîtiye. Di rastiyê de "helmet" di kurmancî de jî nû ye. Ew vê dawiyê ji soranî derbazî kurmancî bûye û di soranî de formeke metatezî (cihguherandina dengên di peyvê de) ji peyva erebî "hemle(t)" e ku di kurmancî de jî wek "hemle" tê bikaranîn.

Sebebê bijartina peyva "Skotland" li cihê "helmet" baş nayê zanîn. Yek ji sebebên minkin ew e ku di dema vê ceribandîna de xezîneya GT ti wergerên kurdî bo "Skotland" ya inglîzî nedinasîn. Belkî GT di lêgerîna xwe de "Helmet" nedîtibe û "fikirîbe" ka ew dikare çi be û madem ti werger bo "Skotland" jî di kurdî de di xezîneya wê de peyda nebûbin, wê wisa ew gihandibin hev.

Tevî ku encam şaş û heta pêkenok e jî lê wisa mirov dikare bibîne ku makîne bi rastî hewl dide kêmasiyan dagire.

Benda 5

- Medyaya YNKê, li ser zarê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere dike ku ev koma çekdaran terorîst in û niha bi hevkarîya asayîşa Şarezûrê hatine dorpêçkirin.
- PUK media, quoted in the Kurdistan Region Security Service revealed that a group of armed terrorists in and cooperation with security experts have been surrounded.

Ji destpêka vê bendê diyar dibe ku bernameya wergerandinê kurteyan jî nas dike: wê baş zaniye ku li şûna YNK wek kurteya Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (bi soranî Yekêtîy Niştîmanîy Kurdistan) di inglîzî de kurteya PUK (Patriotic Union of Kurdistan) tê bikaranîn û wisa wergerandiye.

Di orijîna kurdî de "Medyaya YNKê li ser zarê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere dike ku..." Lê di inglîzî de "Medyaya YNKê, ku Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê neqil kiriye, eşkere kir ku..." Anku di ya kurdî de medya zanîna dezgeha asayîşê belav dike lê di ya inglîzî de tam berevajî wê, dezgeha asayîşê ji zarê medyayê neqil dike!

Di kurdî de hatiye gotin ku "ev koma çekdaran terorîst in" lê di inglîzî de "grûpeke çekdarên terorîst lê ne" (a group of armed terrorists in).

Orijîna kurdî dibêje "û niha bi hevkarîya asayîşa Şarezûrê hatine dorpêçkirin" lê ya inglîzî dibêje "û bi hevkarî li gel şarezayên asayîşê hatine dorpêçkirin. Anku "Şarezûr" – ku navê bajarekî ye – ji aliyê bernameyê ve nehatiye nasîn û hatiye texmîn ku ew formeke ji peyva "şareza" be loma ew wek "expert" anku "şareza, pîspor, karzan, xebîr" hatiye wergerandin.

Ji meseleya "Şarezûr" û "şareza" tê fehmkirin ku eger peyvek di xezîneya bernameya wergerandinê de tine be, bername hewl dide peyveke bi şiklê xwe nêzîkî wê bibîne ji ber ku gelek caran peyvên bi şiklê xwe dişibin hev lê ne bi temamî wek hev tenê formên cuda yên di bingeh de eynî peyvê ne. Lê herdem ne wisa ye loma peydabûna xeletiyên wiha mimkin e.

Benda 6

- Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê herwiha radigihîne ku zanyariyên wan li ser vê komê hebûye û hewiha hemwelatîyan piştrast dike ku dê mal û canê wan parastî be.
- Security Service also reported that their information on this group, and also Hua assure citizens that their life and property will be protected.

Tevî ku ev bend ji hevokeke pir dirêj pêk hatiye jî, dîsa jî bernameyê agahiyên wê yên bingehîn baş di wergerê de jî dane. Lê hin tişt ji wergera inglîzî kêmtir in: Di orijînalê kurdî de behsa "Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê" tê kirin lê di wergerê de tenê behsa "Dezgeha Asayîşê" (Security Service). Di kurdî de "zanyariyên wan li ser vê komê hebûye" lê di inglîzî de "agahiya wan li ser vê komê" anku "hebûye" ji wergerê ketiye.

Di orijînalê kurdî de peyva "herwiha" bi şaşî wek "hewiha" hatiye nivîsîn. Ji ber vê şaşiyê, bernameyê ew wek "herwiha" nas nekiriye lê texmîn kiriye ku ew navekî çînî (yan zimanekî din yê Rojhilata Asyayê) yê bi şiklê "Hua" be û loma ev navê xerîb li wê derê peyda dibe.

Eger mirov "hewiha" berî wergerê rast bike anku bike "herwiha" û paşî wergerîne, hingê werger jî rast derdikeve û "herwiha" wek "also" rast li inglîzî tê wergerandin. Ev nimûne jî baş diyar dike ku bo wergerandina rast, divê nivîsa orijînal bi xwe jî rast hatibe nivîsîn. (***rastnivîsîna teksta orijînal wek şertê bingehîn bo rastderketina wergerê***).

Benda 7

- Pêşmergeyê bi navê Merîwan Mihemed Emîn (27) roja Şemiyê (19-11-2016), li gel 3 hevalê xwe yê din ji bo geşteyê çûbûne gundê Giryane û li wir rastê vê koma çekdar hatibûn.

- Alliance with storytelling Muhammad Amin (27), Saturday (19-11-2016), along with 3 other friend who had gone for the tour of the village girl right there and this armed group.

Ev bend jî ji hevokeke gelek dirêj pêk hatiye. Bi xêra wergerê, mirovê inglîzîzan lê kurdînezan dîsa dikare fikra esasî ji peyamê wergire: Kesek û sê hevalên xwe çûbûn geryanekê û wan û komeke çekdar hev dîtibûn û çekdaran fîşek berdabûn wan.

Lê dîsa di wergerandina vê bendê de çendîn şaşî û kêmasî peyda bûne. Beşa "Pêşmergeyê bi navê Merîwan" bi seyr û sosretî di inglîzî de bûye "Hevgirtina li gel çîrokbêjîyê" (Alliance with storytelling). Wisa diyar e ku xezîneya bernamêyê ne peyva "pêşmergeyê" û ne jî navê "Merîwan" nas nekirine.

Meseleya wergerandina "Merîwan" bi "çîrokbêjîyê" dûr û dirêj e: Makîneyê ew nav nas nekiriye lê texmîn kiriye ku ew dikare formek ji peyva kurmancî "meriv" (mirov) be ku bi inglîzî yek ji maneyên wê "relative" anku "xizm, kesûkar, mirov, meriv, eqreba" ye. Lê peyva inglîzî "relative" bi xwe jî pirwateyî ye û yek ji maneyên wê "vegotin, vegêran, çîrokbêjî" ye. Loma wergereke wiha seyr û sosret derketiye.

Wergerandina "Merîwan" bi "storytelling" anku "çîrokbêjî" nimûneyeke baş ji wan pirsgrîkan e ku peyvên pirwateyî di wergerandina makîneyî de peyda dikin.

Herwiha "gundê Giryane" di inglîzî de bûye "keçika gundî" (village girl). Ev bi zelaî ji ber hindê ye ku "Giryane" wek navê gundekî di xezîneya bernamêyê wergerandinê de peyda nebûye. Makîne lê geriyaye û ew şibandiye peyva inglîzî "girl" anku "keç, keçik".

Benda 8

- Merîwan û hevalên wî, derbarê komê de asayîşê agahdar dikin û di vê navberê de koma çekdar gulle li wan dibarîne û Merîwan bi sivikî birîndar dibe.
- The man and his friends, inform the police about the group, and in the meantime, the armed group fired at them shows a man slightly injured.

Bûyer terîben bi temamî di wergerê de jî wek di orijînalê kurdî hatiye parastin: hin kes komekê dibînin û asayîşê ji wê komê agadar dikin, kom bi sîlehan berdide wan û kesek jî bi sivikî birîndar dibe.

Di orijînalê kurdî de "qehreman"ê nûçeyê kesekî bi navê Merîwan e lê di inglîzî de li cihê navê wî yê taybet "mêrik, zelan" (the man) hatiye nivîsîn. Di metna kurdî de "koma çekdar gulle li wan dibarîne û Merîwan bi sivikî birîndar dibe" lê di wergera inglîzî de "koma çekdar agir/gule li wan barand nîşan dide zelamekî bi sivikî birîndar" (the armed group fired at them shows a man slightly injured).

7. NIRXANDINA ZIMANÊ WERGERA JI KURDÎ LI INGLÎZÎ

Me li jor wergera ji kurdî li inglîzî li gor parastin, windabûn, guherîn û berevajîbûna naverokê şirove kiriye. Niha jî em ê li gor ziman û rêzimana wergerê mijarê binirxînin.

Bi awayekî giştî mirov dikare bibêje ku wergera me ya nimûne ji aliyê ziman û rêzimanê ve bi piranî gelek biserketî ye. Piraniya mutleq ya hevokên di wergerê de bi temamî li gor rêzimana inglîzî ne yan jî teqrîben li gor wê rêzimanê rast in. Bi hin guherandin û rastkirinên biçûk wergera me dikare bi kêrî weşandinê were.

Kerem bikin em yek bi yek li bendên wergera xwe binêrin û hêjahî û kêmasiyên wan rêz bikin. Li vê derê em ê tenê li ser kêmasiyên (rê)zimanî wergerê rawestînin û zêde guh nedin kêmasiyên (rê)zimanî yên teksta orijînal (eger bo şirovekirina kêmasiyên wergerê ne zerûrî be).

Benda 1

- Parêzgarê Helebce: Terorîstan xwe veşartine
- Governor of Halabja: Terrorists have hidden their

Piraniya hevoka werger bi rêzimanî rast e lê "their" ya li dawiyê, ku wergera "xwe" ya kurdî ye, bi vî awayî di inglîzî de ne mimkin e. Wergera yekser ya hevokê dê wiha bûya: "Terrorists have hidden

themselves". Eger bernameya wergerandinê bi qasî wergêrên xwedîtecûbe jîr û zana ba, wê dê herwiha fehm bikira ku di vê mijarê de di kurdî de mirov dema borî ya dûdar (xwe veşartine = have hidden themselves) bi kar tîne lê di inglîzî de dema niha ya berdewam (are hiding = xwe vedişêrin, di xweveşartinê de ne).

Meseleyeke din jî gerguhêzî (transîtîvî) û negerguhêziya (intransîtîvî) lêkeran e: Di kurdî de veşartin lêkerekê gerguhêz e anku mirov tiştê dike. Bo ku mirov wî tiştî li xwe bike, divê cînavê veger / refleksîv "xwe" bi kar bîne. Lê di inglîzî de "hide" wek gelek lêkerên din jî yên inglîzî hem gerguhêz (transîtîv) û hem jî negerguhêz (intransîtîv) e loma beramberî "xwe" ya kurdî ne lazim e.

Benda 2

- Helebce (Rûdaw) – Parêzgarê Helebce ragihand ku ew çekdarên ku li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hatibûne dîtin xwe veşartine û hêzên ewlekariyê jî herêm dorpêç kirine.
- Halabja (Reuters) – The governor of Halabja said the gunmen on the border of South and East had been hiding and surrounded by the security forces in the region.

Ji aliyê rêzimanî ve ti kêmasî di wergera inglîzî ya vê bendê de nayê dîtin tevî ku ew ji hevokeke pir dirêj pêk hatiye jî. Lê wek werger, ew bi temamî di her xalê de ne wergera hevoka kurmançî ye. Bo nimûne, di teksta kurdî de çekdar "ku ... hatibûne dîtin xwe veşartine" lê di inglîzî de "ku ... hatibûne dîtin" hatiye avêtin. Li cihê "xwe veşartine" anku dema borî ya dûdar awayê "xw e veşartibû" (had been hiding) anku dema borî ya dûr hatiye bikaranîn.

Di orijînalê kurdî de "hêzên ewlekariyê jî herêm dorpêç kirine" hatiye nivîsîn lê di wergerê de bûye "ji aliyê hêzên ewlekariyê ve li deverê hatine dorpêçkirin". Anku di metna kurdî de herêm hatiye dorpêçkirin lê di wergera inglîzî de çekdar "ji aliyê hêzên ewlehiyê yên li herêmê ve hatine dorpêçkirin" yan jî "ji aliyê hêzên ewlehiyê ve li deverê hatine dorpêçkirin" (surrounded by the security forces in the region).

Di metna kurdî de parêzgarê Helebceyê ev bûyer "ragihand" lê di wergera inglîzî de wî ew bûyer "got" (said).

Benda 3

- Êvara roja Şemiyê (19/11/2016) li ber çemê gundê Giryane ku dikeve 21 kîlometre bakûrê rojhilatê Helebceyê, 5 çekdarên ne naskirî hatine dîtin. Piştî ku hêzên ewlekariyê hatine agahdarkirin, di navbera çekdaran û hêzên asayîşa Helebceyê de şer derket.
- On Saturday evening (19/11/2016) in the river village, located 21 kilometers north-east of Halabja, 5 fighters have been known. After that the security forces were informed, between gunmen and security forces in Halabja occurred.

Hevoka yekem ji aliyê rêzimanî ve bêkêmasî ye tevî ku – wek ku me di beşa nirxandina naverokê de da diyarkirin – ew bi temamî wateya orijînalê kurdî nade. Destpêka hevoka duyem jî bêkêmasî ye lê dawiya wê hem ji aliyê peyvnasî ve peyvek jê kême (li cihê "şer derket/qewimî" tenê "occurred" anku "qewimî / derket" heye. Cihê "occurred" li dawiya hevokê jî ne li gor peyvrêziya asayî û normal ya inglîzî ye. Bi zelalî ew ji ber tesîra peyvrêziya kurdî ye ku adeten lêker li dawiyê ye.

Benda 4

- Derbarê mijarê de Parêzgarê Helebceyê Elî Osman ji Rûdawê re axivî û got: "Niha rewşa ewlekarî ya Helebce û navçeyên wê di bin kontrolê de ye û ti pirsgrêkekî ewlekariyê nîne. Ew devera ku çekdar lê hatine dîtin di bin dorpêçê de ye û çekdaran xwe veşartine. Helmeta girtina çekdaran berdewam dike."
- On the issue, the governor of Halabja Ali Othman spoke and said: "Now the security situation in the region of Halabja is under control and there is no security problem. Where armed but were under siege and gunmen hiding. Scotland continued arrest of the attackers. "

Herdu hevokên destpêkî heta "ti pirsgrêkekî ewlekariyê nîne" pir bi dilsozî li gor orijînalê kurdî hatine wergerandin. Ew ji aliyê rêzimanî ve jî bê-êb û bêkêmasî ne. Lê ji aliyê bikaranîna biwêj û gotinan ve hevoka yekem bi "on the issue" dê ji inglîzîzimanan re gotineke xerîb e li vê derê. Herwiha li cihê "axivî û got" bikaranîna "spoke and said" ji aliyê rêzimanî ve 100 % rast in lê ji aliyê bikaranîna inglîzî ve mirov van gotinan bi hev re di haletên wiha de bi kar naîne.

Hevoka duyem "Niha ... nîne" hem ji aliyê rêzimanî û hem jî ji hêla bikaranîna zimanî ve kamil û mikemel e.

Hevoka sêyem ” Ew devera ku çekdar lê hatine dîtin di bin dorpêçê de ye û çekdaran xwe veşartine.” wek ”Where armed but were under siege and gunmen hiding” anku ”li cihê çekdar lê di bin dorpêçê de bûn û çekdar di di veşartinê” de. Wek vegerandina wê ya kurdî, hevoka inglîzî jî binuqsan û bikêmasî ye û ji aliyê rêzimanî ve ne temam e.

Hevoka çarem ”Helmata girtina çekdaran berdewam dike.” wek ”Scotland continued arrest of the attackers.” ku ne tenê ji aliyê naverokê ve ecêb e (wek ku me li jor diyar kir) lê ji hêla rêzimanî ve jî netemam e.

Ji aliyê watenasî ve balkêş e ku di vê hevokê de peyva ”çekdar” wek ”attacker” (êrişker) hatiye wergerandin. Li hin derên din yên heman teksta me ya nimûne ew bi çend peyvên din jî yên cuda hatiye wergerandin, wek ”gunmen” (tifengvan), ”armed” (biçek, bisîleh).

Ev nîşaneke berçav e ku bername herdem heman peyvê bi heman awayî wernagerîne lê li gor kontekstê û peyvên din yên hevokê yan bendê, hewl dide her carê hevberêke bo wê derê bikêrhatî peyda bike.

Benda 5

- Medyaya YNKê, li ser zarê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere dike ku ev koma çekdaran terorîst in û niha bi hevkariya asayîşa Şarezûrê hatine dorpêçkirin.
- PUK media, quoted in the Kurdistan Region Security Service revealed that a group of armed terrorists in and cooperation with security experts have been surrounded.

Di orijîнала kurdî de ”Medyaya YNKê li ser zarê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê eşkere dike” lê di wergera inglîzî de ”medyaya YNKê” ji aliyê Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê ve hatiye neqîlkirin. ”Ev koma çekdaran terorîst in” wek ”komeke terorîstên çekdar” hatiye wergerandin.

Peyvika kurdî "in" (wek "ew çekdar in") di wergerê de wek "in" maye lê "in" ya inglîzî ne hevwatera "in" ya kurdî ye lê maneya "li, tê de, di ... de" dide.

Gotina "niha bi hevkarîya asayîşa Şarezûrê hatine dorpêçkirin" wek "hevkarî li gel şarezayên asayîşê hatine dorpêçkirin" hatiye wergerandin. Hokera "niha" li inglîzî nehatiye wergerandin (divê "now" bûya). Hê jî girîngtir: "bi" (wek "bi hevkarîya...") ya kurdî di wergerê bûye "with" (li gel, pê re) ku hevokê ji bingeş ve diguherîne: Di orijînalê kurdî de asayîşa Şarezûrê dorpêçker e anku wê dor li çekdaran girtiye lê di wergera inglîzî de "şarezayên ewlehiyê" dorpêçkirî ne anku hêzeke din ew dorpêç kirine.

Benda 6

- Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê herwiha radigihîne ku zanyariyên wan li ser vê komê hebûye û hewiha hemwelatîyan piştrast dike ku dê mal û canê wan parastî be.
- Security Service also reported that their information on this group, and also Hua assure citizens that their life and property will be protected.

Di wergera inglîzî gotina "Herêma Kurdistanê" kêma e. Herwiha "zanyariyên wan ... hebûye" wek tenê zanyariyên wan" (their information) hatiye wergerandin. Ji ber xeletîya di peyva "herwiha" de (ku di tekstê de wek "hewiha" hatiye nivîsîn) bernameyê ew wek herwiha nas nekiriye û wek navê Hua fehî kirîye û wergerandiye. "mal û canê wan" wek "their life and property" hatiye wergerandin ku dibe "can û malê wan". Sebebê vê guherandina peyvrêziyê ew e ku adeten ev gotin bi peyvrêziya wek "life and property" (can û mal) di inglîzî de tê, ne wek "property and life" (mal û can). Bi heman awayî bo nimûne gotina kurdî "reş û spî" bi GT wek "ebyedh we eswed" (spî û reş) tê wergerandin ji ber ku di kurdî de reş berî spî lê di erebî de spî berî reş tê.

Bend 7

- Pêşmergeyê bi navê Merîwan Mihemed Emîn (27) roja Şemiyê (19-11-2016), li gel 3 hevalê xwe yê din ji bo geştekî çûbûne gundê Giryane û li wir rastê vê koma çekdar hatibûn.

- Alliance with storytelling Muhammad Amin (27), Saturday (19-11-2016), along with 3 other friend who had gone for the tour of the village girl right there and this armed group.

Wergerandina vê bendê belkî ji hemû yên din yên vê teksta me ya nimûne kêmtir biserketî ye. Bernameya wergerê çendîn peyvên teksta kurdî şaş fehm kirin û çewt wergerandine: "pêşmergeyê, Merîwan, Giryane". Gotina "bi navê" nehatiye wergerandin.

Gotina "3 other friend" li gor rêzimana inglîzî şaş e – divê "three other friends" ba anku S li dawîya peyva "friend" heba. Sebebê vê xeletiyê çewtiya di orijînalê kurdî de ye: di metna kurdî de "li gel 3 hevalê xwe" hatiye nivîsîn lê bi rastî divê "li gel 3 hevalên xwe" ba anku li dawîya peyva "hevalê" dengê N jî heba.

Bernameya wergerandinê "li wir rastê vê koma çekdar hatibûn" jî baş fehm nekiriye loma ew wek "li wir rastê vê koma çekdar hatibûn" (right there and this armed group) wergerandiye. Werger hem şaş e û hem jî nerêzimanî ye anku ji aliyê rêzimanî ve nerast e. Yek ji sebebên serekî ew e ku di vê parçehevokê de biwêja "rastî hatin" hatiye kelaştin û peyvên "vê koma çekdar" ketine navbera wan. Gelek caran bo bernameyên wergerandinê zehmet e ku biwêj û îdyomên parvekirî yan kelijandî bigihînin hev û wan wek biwêj fehm bikin û wisa wergerînin.

Benda 8

- Merîwan û hevalên wî, derbarê komê de asayîşê agahdar dikin û di vê navberê de koma çekdar gulle li wan dibarîne û Merîwan bi sivikî birîndar dibe.
- The man and his friends, inform the police about the group, and in the meantime, the armed group fired at them shows a man slightly injured.

Ji ber sebebên li jortir di beşa nîrxandina naveroka wergerê de diyar kirî, bernameya wergerandinê navê "Merîwan" nas nekiriye û ew wek "mêrik" wergerandiye. Wek din ji aliyê rêzimanî ve hevoka inglîzî teqrîben bêkêmasî ye. Tenê di navbera "the armed group fired at them" (koma çekdar gule

berdan wan) û "shows a man slightly injured" (mêrikekî bi sivikî birîndarbûyî nîşan dide) de tiştêkî pêwîst kême.

Ji aliyê wekhevî û deqîqiya orijînal û werger hinekî ji hev cuda ne: orijînal kurdî dibêje "gulle li wan dibarîne" anku dema niha bi kar tîne lê werger dibêje "gule li wan barandin" (fired at them) anku dema borî ya sade dixebitîne. Peyvika "û" ya navbera "dibarîne" û "Merîwan" de nehatiye wergerandin. Dîsa di metna kurdî de dibêje "bi sivikî birîndar dibe" anku dema niha diemilîne lê di inglîzî de dibêje "bi sivikî birîndarbûyî" (slightly injured).

8. NIMÛNE 2: WERGERANDINA JI INGLÎZÎ LI KURDÎ

Li vê derê em ê teksteke bi inglîzî nivîsandî bînin û wê bi wergerandina makîneyî, bi bernameya *Google Translate* (GT) li kurdî wergerînin. Dûv re em ê encama wergerê ji aliyê naveroka wê û ji hêla zimanê wê ve bend bi bend binirxînin.

Orijînala metna inglîzî wiha ye (hejmarên bend û paragrafan ji aliyê me ve lê hatine zêdekirin daku pey re şirovekirin û amajekirin bi wan hêsan be):¹³

1) German court acquits 'Sharia Police' in Wuppertal

- 2) A German court has ruled that seven Muslim men who formed a Sharia street patrol did not break laws against political uniforms.
- 3) The group sparked outrage in the western city of Wuppertal in 2014, when they approached people in orange vests bearing the words "Sharia Police".
- 4) They demanded that locals stop gambling, listening to music, and drinking alcohol.
- 5) The group's alleged organiser, Sven Lau, is a well-known Islamist preacher.
- 6) He is facing separate charges of supporting a terrorist group fighting in Syria.
- 7) A film of the "patrol" appeared on YouTube, prompting condemnation from the Central Council of Muslims in Germany, who said their behaviour was "harmful to Muslims".

¹³ Metna inglîzî ji vê derê hatiye wergirtin: <http://www.bbc.com/news/world-europe-38056243>

- 8) Wuppertal's district court ruled that the seven vigilantes could only have broken the law - which was originally aimed at street movements such as the early Nazi party - if their uniforms were "suggestively militant or intimidating", a court spokesman said.
- 9) In this case, it found that the vests were not threatening, noting that one witness mistook the gang for a stag do.
- 10) The same court threw out the case last year, but was overruled on appeal by a higher court which felt the ban on uniforms could be applied in this case.
- 11) Monday's verdict is not yet final and may still be appealed.
- 12) So-called "Sharia patrols" by ultra-conservative Muslim men have been seen in other European cities including London, Copenhagen and Hamburg.

Wergera wê ya makîneyî jî wiha ye (li gor wergerandina bi GT roja 22.11.2016):

- 1) **'Polîsan Şerîayê' gunehkar dadgehê German li Wuppertal**
- 2) A dadgehê German hatiye biryar da ku heft mirovên Muslim ku dewriya kolanan Şerîayê kir qanûnên li dijî bergên siyasî bişkînin ne avakirin.
- 3) Koma berxwdan li rojavayê bajarê Wuppertal di 2014 de, nêzîkatîyên, gava ku ew kesên ku di êlekên orange hildigrin peyvên "Polîsan Şerîayê" bûm.
- 4) Wan xwest ku şênîyên rawestîne û qumarê de, guhdariya mûzîkê, û vexwarina alkoholê.
- 5) organizer îdîaya komê de, Sven Lau, ku peyvbêjê îslamî yên navdar e.
- 6) Ew doz cuda yên piştigiriya komeke terorîst li Sûriyê şer bi rû ye.
- 7) A film ya "de vedorgerîneke" re xuya bû li ser YouTube, li cezayî de ji Konseya Navendî ya misilmanên li Almanyayê, ku got: helwesta xwe "xisar ji bo misilmanên" bû.
- 8) berdevkê dadgehê re got, eger û bergên xwe "Hêzên milîtan an jî tehdîd dikin" bûn - dadgehê navçeya Wuppertal ya biryar da ku heft milîsên tenê dikare qanûna şikandin - ku di destpêkê de li tevgerên kolanan armanc bû, wek partiya Nazîyan zû.
- 9) Di vê rewşê de jî, dît ku êlekên hatin tehdît nakim, diyar kir ku kes şahidiya UAV çeteyên ku ji bo Stag bikin.
- 10) Herwiha heman dadgehê avêtin derve rewşê de, sala par, di heman demê de li ser banga ji layê dadgeha bilind ku hest qedexeya li ser bergên nikaribû wê di vê rewşê de serî li defa bû.
- 11) biryara Duşemê e ne niha dawî û dibe ku hê jî gilî bike.

- 12) So-bi navê "dewriyeyên Şerîayê" ji aliyê mirovan Muslim ultra-muhafazakar li bajarên din ên Ewropayê di nav wan de li Londonê, Kopenhagê û Hamburg dîtin.

9. NIRXANDINA NIMÛNE 2

Gava ku mirov li wergera kurdî dinêre, dibîne ku ji bilî peyva "German" (di bendên 1 û 2 de) û peyva "so-" (li destpêka benda 12), bernameyê kariye hemû peyvên inglîzî yên vê nivîsa nimûne wergerîne kurdî. Ji aliyê naverokê ve ji wergerê fehm bide ku mijar li ser dadgekirina hin kesên misilman e ku xwe kiriye "polîsên şerîetê", li kolanan geriyane û hewl dane hin tiştan li hin kesan qedexa bikin û loma ew niha tînin darizandin anku mehkemekirin.

Lê tevî ku bernameyê kariye teqrîben hemû peyvên tekstê ji inglîzî li kurdî wergerîne jî, dîsa gelek pirsgerêkên rêzimanî, hevoksazî û naverokî di wergerê de hene. Li jor em ê van hem van kêmasiyan destnîşan bikin, hem li sebebên wan kêmasiyan bigerin û hem jî li kêmasiyên – yan tevliheviyên – naverokê û sebebên tînegihîştina wê vekolin. Dû re em ê cudahiyan wergerandina ji inglîzî li kurdî li û wergerandina ji kurdî li inglîzî bidin ber hev û sebebên biserketina mezin ya wergerên kurdî-inglîzî û biserketina kêmtir ya wergerandina inglîzî-kurdî diyar bikin. Piştî wê jî em ê li ser îmkânên baştirkirina wergerandina inglîzî-kurdî rawestin.

Benda 1

- German court acquits 'Sharia Police' in Wuppertal
- 'Polîsan Şerîayê' gunehkar dadgehê German li Wuppertal

Orijînalê inglîzî dibêje "Dadgeha almanî 'polîsê şerîetê' berdide". Wergera vê bendê bi çendîn awayan şaş e: a) li cihê berdanê behsa gunehkaran dike, 2) li şûna "dadgeha almanî" dinivîse "dadgehê German" anku peyva inglîzî "German" li kurdî wernegerandiye. Li şûna "polîsên şerîetê" yan "polîsê şerîetê" (di inglîzî de "Sharia Police" yekhejmar e lê dikare bi pirhejmarî jî li kurdî were wergerandin) wek "Polîsan Şerîayê" hatiye nivîsîn. Heta eger "şerîayê" li şûna "şerîetê" rast be jî, "ji aliyê ravek û hevgerêdanê ve divê "polîsên şerîayê" bûya, ne "polîsan şerîayê"

Ji aliyê naverokê ve ne mimkin e mirov ji wergerê fehm bike ku ew kes hatine berdan. Belkî heta berevajî wê, ji wergerê zêdetir wisa heçku dadgehê ew wek "gunehkar" dîtibin. Ji xwe peyva "gunehkar" jî ne peyveke huqûqî lê dînî ye. Li cihê wê di zimanê huqûqî de divê "tawanbar, sûcdar, tawankar" yan tişteki wisa hatiba bikaranîn.

Benda 2

- A German court has ruled that seven Muslim men who formed a Sharia street patrol did not break laws against political uniforms.
- A dadgehê German hatiye biryar da ku heft mirovên Muslim ku dewriya kolanan Şerîayê kir qanûnên li dijî bergên siyasî bişkînin ne avakirin.

Orijînala inglîzî dibêje "Dadgeheke almanî biryar daye ku heft mîrên misilman, yên ku dewriyeke kolanan ya şerîetê pêk anîbû, qanûna dijî unîformên siyasî neşkandiye."

Dîsa di wergerê de piraniya peyvan rast hatine wergerandin lê struktûr û avaniya hevoka werger wisa tevlihev e. Mirov jê fehm dike ku dadgehê biryarek derbarê heft mirovên misilman de, dewriya kolanan kiriye, daye lê ji wergerê qet ne diyar e ka biryara dadgehê çawa bû.

Eger mirov yek bi yek li beşên vê bendê binêre, mirov dikare bi kêmî van kêmasiyan bibîne:

- Bernameyê nizaniye ka peyva "a" ya destpêkê çawa wergerîne kurdî. "A" di inglîzî de di van haletan de nîşana yekhejmariya nediya e ku di kurdî de bi paşgira "-ek" tê diyarkirin: "a court = dadgeh-ek". Di vê hevokê de û li cihên din jî gava ku hevok bi vê peyvika "a" dest pê dike, bernameya wergerê ya GT wê wek xwe di kurdî de dihêle û nizane wê bi paşgira "-ek" biguherîne.
- Bernameyê peyva "German" (almanî, almanyayî) wernegerandiye. Ev tişteki xerîb û heta belkî sosret e jî ji ber ku bername gelek peyvên pir nadirtir jî nas dike û werdigerîne.
- "has ruled" bi rastî bi maneya "biryar daye" ye lê bi şaşî wek "hatiye biryar da" hatiye wergerandin.
- "seven Muslim men" tê wateya "heft mîrên/zelamên misilman" lê wek "heft mirovên Muslim" hatiye wergerandin.

- "who formed a Sharia street patrol" teqrîben rast hatiye wergerandin wek "ku dewriya kolanan Şerîayê kir" ku rastiya wê dê wiha bûya "ku dewriya kolanan ya şerîetê ava kir".
- "did not break laws against political uniforms" bi rastî wateya "qanûnên dijî unîformên/bergên siyasî neşkandin" dide lê wek "qanûnên li dijî bergên siyasî bişkînin ne" wergerandiye.
- Peyva li dawîya benda kurdî anku "avakirin" ihtimal e ku ji wergera "formed" e ku teqrîben li nîva benda inglîzî peyda dibe. Ev dide diyarkirin ku bernamê fehm dike ku di kurdî de adeten lêker li dawiyê ye û hewl dide axlebe lêkerê bîne dawîya hevoka kurdî tevî ku di inglîzî de ne wisa be jî. Ev jî yek ji gavên pêşketina bernamêyê diyar dike tevî ku encam ne herdem rast be jî.

Benda 3

- The group sparked outrage in the western city of Wuppertal in 2014, when they approached people in orange vests bearing the words "Sharia Police".
- Koma berxwdan li rojavayê bajarê Wuppertal di 2014 de, nêzîkatiyên, gava ku ew kesên ku di êlekên orange hildigrin peyvên "Polîsan Şerîayê" bûm.

Orijînala inglîzî dibêje "Ew kom bû sebebê qehrê li rojavayê bajarê Wuppertalê di 2014 de gava ku ew bi êlekên pirteqalî yên peyvên "Polîsê şerîetê" li ser nêzîkî xelkê bûn. Ji hevokê beşa " li rojavayê bajarê Wuppertal di 2014 de" bûn baş hatiye wergerandin. Wek din kêmasiyên mezin hene ku hem têgihiştina ji hevokê zehmet yan mehal dîkin û/yan ji aliyê rêzimanî ve şaş in. Em çend ji wan destnîşan bikin:

- Nayê zanîn ku gotina "berxwedan" (di wergerê de wek "berxwdan") çima di wergerê de peyda bûye. Li aliyekî din, peyva "qehir" (yan jî "kerb, kîn") peyda nabe tevî ku "outrage" ya di teksta orijînal de maneya wê dide.
- "they approached" tê wateya "ew nêzîk bûn, wan xwe nêzîk kir" lê di wergerê de peyva "nêzîkatiyên" hatiye bikaranîn ku hem ji aliyê wateyê ve û hem jî ji hêla rêzimanî ve li vê derê şaş e.

- "orange" hem maneya fêkiyê "pirteqal" (porteqal) û hem jî ya rengê "pirteqalî" (porteqalî) dide. Gelek seyr û sosret e ku bernamaya wergerandinê ti hevberake kurdî bo wê peyva pir sade peyda nekiriye.
- Peyva "bûm" hem ji aliyê rastnivîsînê ve (diviya "bûm" ba), hem ji hêla rêzimanî ve û hem jî li terefê naverokê ve li vê derê ne mimkin e.

Benda 4

- They demanded that locals stop gambling, listening to music, and drinking alcohol.
- Wan xwest ku şênîyên rawestîne û qumarê de, guhdariya mûzîkê, û vexwarina alkoholê.

Orijînalê inglîzî dibêje "Wan daxwaz kir ku taxî/mehelî dest ji qumarê, guhdarîkirina muzîkê û vexwarina alkoholê berdin". Tevî çend kêmasiyan û şaşiyên rêzimanî jî, wergera makîneyî jî ya vê bendê beramberî ya gelek bendên din yê vê nimûneya me ya wergerandina makîneyî, ev bend teqrîben baş tê fehmkirin – yan jî mirov dikare bibêje ku yek ji wan kêmbandan e ku ji nivîsê tîn fehmkirin.

Benda 5

- The group's alleged organiser, Sven Lau, is a well-known Islamist preacher.
- organizer îdîaya komê de, Sven Lau, ku peyvbêjê îslamî yê navdar e.

Ev bend bi inglîzî dibêje "Organîzatorê idiakirî yê komê, Sven Lau, waizekî/xutbexwînekî navdêr yê îslamî ye."

Di wergerandina GT de peyva inglîzî "organizer" nehatiye wergerandin, peyva "alleged" (idiakirî, gumanjêbirî) wek "îdîaya hatiye wergerandina, sebebê peyvika "de" li pey peyvika "komê" nayê zanîn û çend kêmasiyên din.

Benda 6

- He is facing separate charges of supporting a terrorist group fighting in Syria.
- Ew doz cuda yê piştgiriya komeke terorîst li Sûriyê şer bi rû ye.

Orijînala inglîzî dibêje "Ew rû bi rûyî hin tometên cuda ye derbarê îştgirîkirina komeke terorîstî ku li Sûriyê şer dike."

Wergera vê bendê jî ne bêkêmasî ye lê dîsa jî mirov dikare fikra wê ya bingehîn fehm bike.

Ji aliyê rêzimanî ve jî kêmasî hene: bo nimûne, "doz cuda" divê "dozên cuda" bûya, li berê wan divê daçek heba û li şûna "bi rû ye" divê "rû bi rû ye" bûya.

Lê dîsa jî hêjayî lêfikirînê ye ku tevî kêmasî û xeletiyên jî, wisa dixuye ku bername gelek cudahiyên inglîzî û kurdî fehm dike û hewl dide li gor taybetmendiyên kurdî wergerê bike:

Bo nimûne, di inglîzî de adeten rengdêr berî navdêrê tê û di kurdî de jî axlebe navdêr berî rengdêrê tê. Loma bernameyê "separate charges" (rengdêr + navdêr) kiriye "doz cuda" (navdêr + rengdêr) tevî ku nikariye wan bi ravekê ("doz-ên cuda") bi hev ve girê bide jî.

Nimûneyeke din jî cihê lêkerê (fiil, verb) di hevokên kurdî û inglîzî de ye. Di inglîzî de adeten lêker li dûv kirde (fail, subjekt) tê û ne li dawîya hevokê lê di kurdî de lêker axlebe li dawîya hevokê bi cih dibe. Di vê bendê de lêkera bingehîn "is facing" di inglîzî de pir nêzîkî destpêka hevoka me ya dirêj e lê bernameyê fehm kiriye ku di kurdî de lêker bi piranî li dawiyê ye loma ew wek "bi rû ye" ne li nêzîkî destpêka lê li dawîya hevokê bi cih kiriye.

Bila şaşiyên heyî mirovî nexapînin: bernameyên wergerandinê gelek jîr in tevî ku zimanên tebîî û berhemên bi wan afirandî helbet hê jî zengîntir û jîrtir in jî.

Benda 7

- A film of the "patrol" appeared on YouTube, prompting condemnation from the Central Council of Muslims in Germany, who said their behaviour was "harmful to Muslims".
- A film ya "de vedorgerîneke" re xuya bû li ser YouTube, li cezayî de ji Konseya Navendî ya misilmanên li Almanyayê ku got: helwesta xwe "xisar ji bo misilmanên" bû.

Orijînala inglîzî dibêje: "Filmekî 'dewriyê' li ser YouTube belav bû ku bû sebebê şermazarkirinê ji aliyê Encumena Navendî ya Misilmanan li Almanyayê ku got reftara wan "bo misilmanan ziyandar e".

Wergera kurdî ya vê bendê tevlihev e û bi gelek zorî û zehmetiyan tê fehmkirin lê dîsa jî gelek tişt jê fehmbar in: mirov tê digihe ku filmekî vîdyoyî yê wê "vedorgerîn"ê anku dewriyê li ser YouTube hatiye belavkirin û ku "Konseya Navendî ya misilmanên li Almanyayê" gotiye ku ew "xisar [e] ji bo misilman[an]".

Benda 8

- Wuppertal's district court ruled that the seven vigilantes could only have broken the law - which was originally aimed at street movements such as the early Nazi party - if their uniforms were "suggestively militant or intimidating", a court spokesman said.
- berdevkê dadgehê re got, eger û bergên xwe "Hêzên milîtan an jî tehdîd dikin" bûn - dadgehê navçeya Wuppertal ya biryar da ku heft milîsên tenê dikare qanûna şikandin - ku di destpêkê de li tevgerên kolanan armanc bû, wek partiya Nazîyan zû.

Orijînala inglîzî dibêje: "Dadgeha deverî ya Wuppertalê biryar da ku wan heft zêrevan dê tenê hingê qanûn – ku bi eslê xwe bi armanca dijî bizavên kolanî yê wek Partiya Nazî ya berê – binpê kiriba eger unîformên wan "bi pêşniyazkî çekdar yan bêzarker" bûna, berdevkekî dadgehê got.

Dîsa wergera kurdî tijî tevlihevî û asêti ye ku têgihiştina rast ya bendê gelek dijwar dikin. Lê ya rast orijînala bendê bi xwe jî dirêj û asê ye û çend hevok di nav hev re ne.

Li vê derê dixwazim bi taybetî bala xwandevanên hêja bikêşim ser peyvrêziya orijînalê û ya wergera wê. Di orijînalê inglîzî de "berdevkekî dadgehê got" (a court spokesman said) li dawiyê ye lê wergerê ew aniye destpêkê. Bi dîtina min ev jîriyeke mezin ya bernameyê diyar dike ji ber ku ew dizane ku di kurdî de adeten bêjer an qiseker tê nasandin anku tê gotin ka kê gotiye û paşî ka çi gotiye.

Benda 9

- In this case, it found that the vests were not threatening, noting that one witness mistook the gang for a stag do.
- Di vê rewşê de jî, dît ku êlekên hatin tehdît nakim, diyar kir ku kes şahidiya UAV çeteyên ku ji bo Stag bikin.

Orijînalê inglîzî dibêje: "Di vê mijarê de, wê [dadgehê] wisa dît ku êlek ne tehdîdker bûn û destnîşan kir ku yek ji şahidan bi şaşî bawer kir ku ew nijde şahiyê zavatiyê ye."

Bernameyê wergera çend peyvên di vê bendê de peyda nekiriye. Hevberêb "stag do" (şahiya zavatiyê) jê re zehmet bû û herwiha lêkera "mistook" (şaş fehm kir, çewt hesab kir) jî baş nehatine dan. Herwiha mirov nizane ka mebesta "êlekên hatin tehdît nakim" ew e ku bi wan êlekan tehdîd in yan jî na. Ji aliyê rêzimanî ve jî hebûna forma "nakim" xerîb e ji ber ku mesele ne "ez" im.

Benda 10

- The same court threw out the case last year, but was overruled on appeal by a higher court which felt the ban on uniforms could be applied in this case.
- Herwiha heman dadgehê avêtin derve rewşê de, sala par, di heman demê de li ser banga ji layê dadgeha bilind ku hest qedexeya li ser bergên nikaribû wê di vê rewşê de serî li defa bû.

Orijînalê inglîzî dibêje: "Eynî dadgehê ev doz par derxistibû lê biryar li ser gilîkirinê hatibû qelibandin ji aliyê dadgeheke ve bilindtir ve ya ku hest dikir ku qedexeya li ser unîforman bi kêrê vê dozê jî tê."

Hemû peyvên bendê hatine wergerandin û piraniya wan rast jî. Lê dîsa jî têgihiştina vê bendê ji wergerê gelek zor û zehmet e.

Benda 11

- Monday's verdict is not yet final and may still be appealed.
- biryara Duşemê e ne niha dawî û dibe ku hê jî gilî bike.

Orijînala inglîzî dibêje: "Biryara roja duşemê heta niha nîhaî ye û hê jî dikare were gilîkirin.

Li hin beşên vê bendê peyvêrîziya inglîzî li gor kurdî hatiye eyarkirin, bo nimûne "Monday's verdict = biryara Duşemê". Lê di hin beşan de jî peyv bi peyv hatiye wergerandin, bo nimûne "is not yet final = e ne niha dawî" (li cihê "niha ne dawî ye").

Benda 12

- So-called "Sharia patrols" by ultra-conservative Muslim men have been seen in other European cities including London, Copenhagen and Hamburg.
- So-bi navê "dewriyeyên Şerîayê" ji aliyê mirovan Muslim ultra-muhafazakar li bajarên din ên Ewropayê di nav wan de li Londonê, Kopenhagê û Hamburg dîtin.

Orijînala inglîzî dibêje: Wek tên binavkirin, "Dewriyên şerîetê" ji aliyê mêrên misilman yê pir kevneperist ve li hin bajarên din jî yê ewropî hatine dîtin, di nav wan de li London, Kopenhag û Hamburgê.

Tevî hin şaşiyên biçûk jî, wergera makîneyî ya vê bendê teqrîben baş tê fehmkirin.

Bernameyê ti wergereke yekser bo "so-called" (wek ku tê binavkirin, bi navê) peyda nekiriye, loma "so-" ya inglîzî di wergerê de parastiye. Di wergerandina "ultra-conservative" de "ultra-" ya ewropî parastiye (di kurdî de jî carinan tê bikaranîn) lê "conservative" bi peyva bi eslê xwe erebî-îranî (muhafaza ji erebî, -kar ji îranî) lê bi şiklê tirkî "muhafazakar" pêşkêş kiriye.

Di rêzkirina nav(dêr)an de adeten hemû yan jî tenê ya dawiyê tê çemandin. Di wergerê de wek berevajî wê hatiye kirin: "li Londonê, Kopenhagê û Hamburg" anku ya yekem û duyem çemandine lê ya sêyem neçemandiye.

10. ÇIMA WERGERANDINA MAKÎNEYÎ WISA BIKÊMASÎ YE?

Kerem bikin li vê hevoka inglîzî binêrin:

- I can help you.

Hevok li gor rêzimana inglîzî bêtêmasî ye anku ji aliyê (rê)zimanî ve her tiştê wê rast e.

Em bifikirin ku kesekî qet kurdî nizane lê dixwaze hewl bide vê hevokê bi alîkariya ferhengan li kurdî wergerîne. Di inglîzî de ev hemû peyv xwerû anku neçemandî/netewandî ne. Di her ferhenga giştî ya inglîzî-kurdî de bi ihtimaleke pir mezin ev hemû peyv dê peyda bibin. Eger kesê dixwaze vê hevokê bi alîkariya ferhengan wergerîne kurmançî, ew dê li ber van peyvên inglîzî wergerên wiha bibîne:

- I = ez
- can = karîn (yan "şîyan, kanîn")
- help = alîkarî (yan "alîkarî kirin")
- you = tu

Bi xêra ferhengê kesê kurdînezan dê bikare vê hevoka inglîzî wiha li kurdî wergerîne:

- "Ez karîn alîkarî tu" yan "Ez karîn alîkarî kirin tu"

Lê her kurmançîaxiv dizane ku ev hevok li gor rêzimana kurdî ne rast in tevî ku her yek ji peyva inglîzî peyv-bi-peyv rast hatine wergerandin ji ber ku: I = ez, can = karîn, help = alîkarî (yan "alîkarî kirin") û you = tu.

Kesên kurdîzan û inglîzîzan dizanin ku "I can help you" divê wek "ez dikarim alîkariya te bikim" yan jî li gor devokan hinekî cuda, bo nimûne "ez dişêma harîkariya te bikim", "ez dikanim alî te bikim", "ez dişêma harî te bikim" û hwd. Lê formên peyvan yê devokî çî bin jî, ya giring ew e ku di kurdî de mirov nikare peyvan yekser ji ferhengan bigire û wan li pey hev rêz bike bêyî ku hinek ji wan biçemîne / bitewîne yan jî bi peyva dûv wan ve bi hin paşgiran girê bide.

Li vê derê em ê hewl bidin çend sebebên bingehîn yê zehmetiyên wergerandina makîneyî diyar bikin. Hinek ji wan helbet di wergerandina mirovan de jî dijwar in lê wergêrên mirov dizanin kengî çî formê yan çî alternatîvê bi kar bînin. Dûv re em ê diyar bikin ka tevî hemû asteng û asêtiya jî çawa wergerandina makîneyî roj bi roj dikemile û xwe nêzîkî asta wergerandina wergêrên baş yê mirov dike.

10.1 Formên peyvan yê çemandî û girêdayî

Di ferhengan de adeten tenê forma xwerû ji her peyvê hatiye rêzkirin û li zimanekî din hatiye wergerandin yan jî bi heman zimanî hatiye şirovekirin. Formên çemandî û girêdayî (biravek, ravekdar, izafedar)

Bo nimûne, mirov dikare di ferhengên kurmancî-inglîzî de bi hêsanî van peyvan bibîne "mezin, sêv, kirin" lê adeten di ferhengan de ev formên wan nayên rêzkirin:

- mezintir, mezintirîn
- sêvê, sêva, sêvan, sêvên, sêvek, sêvekê, sêveke
- kir, kiriye, kirine, kiribû, kiribûn, dikir, dikirin, nekir, dikim, dike, dikî, dikin, bikim, bikî, bikin...

Bo ku bername bikare nivîsên kurdî li inglîzî wergerîne, divê ne tenê peyvên wek "mezin, sêv, kirin" di xezîneya bernameyê de li inglîzî hatibin wergerandin lê divê ku hemû ev formên wan jî hebin û li hevberên wan yê inglîzî hatibin wergerandin.

Bo nimûne, divê "mezin" wek "big", "mezintir" wek "bigger" û "mezintirîn" jî wek "biggest" hatibin wergerandin; "sêv" wek "apple", "sêvek" wek "an apple" û "sêvan" jî wek "apples" hatibin wergerandin; û "kirin" wek "do", "kir" wek "did", "kiriye" wek "done" hatibin wergerandin û hwd.

Em dizanin ku ji her lêkereke (fiileke, verbeke) kurdî bi dehan formên li gor kesan, deman û erênî/neyînî û hwd. cuda hene. Divê ew hemû form di xezîneya bernameya wergerandinê de hebin û her yek ji wan li inglîzî hatibin wergerandin heta ku bername bikare wan rast wergerîne. Avakirina xezîneyeke wisa ya peyvan jî gelek ji rêzkirina peyvên neçemandî/netewandî yên zimanekî û wergerandina wan li zimanekî din zehmettir e.

Lê wek prensîp mimkin e ku her forma her peyva kurdî di xezîneya bernameya wergerandinê de were berhevkirin û li gel wergera wê ya inglîzî were qeydkirin û bername wisa were saz kirin ku bo wergerandinê wan peyvan û wateyên wan yên inglîzî bibîne. Lê pirsgirêkên wergerandina makîneyî bi vê jî naqedin û xilas nabin. Loma kerem bikin em li astengiyên din jî binêrin:

10.2. Heman forma zimanekî bi çend formên zimanê din

Berhevkirin û wergerandina her forma her peyva kurdî jî û qeydkirina wan di xezîneya bernameya wergerandinê de hemû pirsgirêkên wergerandinê çareser nake. Yek ji sebebên bingehîn jî ew e ku heman forma heman peyva zimanekî dikare di zimanekî din de hevwatera du yan zêdetir forman be.

Bo nimûne, peyva inglîzî "books" pirhejmariya peyva "book" (kitêb, pirtûk) e. Lê "books" li gor hevokan bi sê awayên ji hev cuda li kurmançî tê wergerandin, "kitêb, kitêban, kitêbên" (yan "pirtûk, pirtûkan, pirtûkên"):

- I bought two *books* = min du *kitêb* kirîn.
- I like *books* = ez ji *kitêban* hez dikim.
- story *books* = *kitêbên* çîrokan

Anku ne bes e ku di xezîneya bernameya wergerandinê de "books" wek "kitêb", "kitêban" yan "kitêbên" hatibe wergerandin û qeydkirin lê divê bi her sê awayan hatibe qeydkirin.

Lê heta eger "books" bi her sê awayên kurdî hatibe wergerandin jî, dîsa pirsgerêk ew e ka bername dê çawa bizane forma rast bo cihê rast bibijêre û wan tevlihev neke û nimûneyên me yên li jor meselen wiha wernegerîne:

- I bought two *books* = *min du *kitêbên* kirîn.
- I like *books* = *ez ji *kitêb* hez dikim.
- story *books* = **kitêban* çîrokan

Ev mesele bi taybetî li gel wergerandina lêkerên inglîzî li kurdî dijwar û asê ye. Inglîzî bi piraniya cînavên kesî re heman forma lêkerê bi kar tîne lê kurdî li gel piraniya cînavan bo her yekê formeke cuda dixebitîne. Bo nimûne:

- I say = ez dibêjim
- you say = tu dibêjî; hûn dibêjin
- he/she says = ew dibêje
- we say = em dibêjin
- they say = ew dibêjin

Bo ku bername bikare wergerandinê ji kurmancî li inglîzî baş bike, divê peyvên "dibêjim, dibêjî, dibêjin" wek "say" di xezîneya bernameyê de hatibin wergerandin. Lê dîsa jî di wergerandina ji inglîzî li kurdî de divê bername bibijêre ka peyva "say" wek "dibêjim", "dibêjî" yan "dibêjin" wergerîne. Di bijartina formê de jî mimkin e ku forma rast were bijartin lê mimkin e ku ya ne rast jî were bijartin û mirov wergerên wiha şaş bibîne:

- *ez dibêjin
- *em dibêjî
- *hûn dibêjim

Heman forma "say" herwiha raweya fermanî ya yekhejmar û pirhejmar e (bibêje, bibêjin) û herwiha forma rader anku mesder/infinîtîv e jî (gotin). Ev wergerandina ji kurdî li inglîzî hêsan dike ji ber ku di kurdî de "bibêje", "bibêjin" yan jî "gotin" be, di wergera inglîzî de ew dê hemû bibin "say". Lê ev

wergerandina ji inglîzî li kurdî dijwar dike ji ber ku bo bernamê ne hêsan e forma rast ji nav "bibêje, bibêjin, gotin, dibêjim, dibêjî, dibêjin" bibijêre.

Heta hê jî formên din yên kurdî yên dîsa bi maneya "say" ya inglîzî hene, bo nimûne: "bibêjim, bibêjî". Û mesele teqrîben li gel her lêkera kurdî wiha ye.

Eger ev pirsgerêk jî were çareserkerin, hê jî kêşe û arîşeyên wergerandinê hene ku em ê li jêrtir binasînin.

10.3. Pirwatetiya peyv

Bo ku bernamê kompûterî bikarin wergerandinê bikin, divê di wan de xezîneyeke bi hejmareke pir mezin ya peyv û hevokên di navbera du zimanan de wergerandî hebe. Bo nimûne, bo wergerandineke baş di navbera kurdî û inglîzî de, divê ku di xezîneya bernamê de hemû peyvên di kurdî û inglîzî de mimkin li hev hatibin wergerandin daku her cara mirov peyv an hevokê kurdî binivîse, bernamê di xezîneya xwe de peyvên hevoka kurdî û wergerên wan bibîne.

Lê di her zimanî de peyvên pirwateyî hene ku maneya du yan zêdetir tiştan didin. Hevberên wan di herdu zimanan de ne herdem wek hev pirwateyî ne. Bo nimûne, di inglîzî de peyva "old" heman maneya "pîr" dide û hem jî wateya "kevn". Loma mirov dikare bi inglîzî wiha bibêje:

- an old house = xaniyekî kevn
- an old woman = jineke pîr

Mirovên kurdîzan dizanin ku mirov ji xaniyan re dibêje "kevn" û ji jinên biemir re jî dipêje "pîr". Lê bernamê ku tê de "old" hem wek "kevn" û hem jî wek "pîr" hatiye wergerandin (ji ber ku bi rastî jî wan herdu maneyan dide) mimkin e ku encamên wiha yên wergerê bide:

- an old house = xaniyekî pîr
- an old woman = jineke kevn

Em dikarin nimûneyeke berevajî bidin. Di inglîzî de "woman" maneya "jin" dide lê tenê bi wateya xwe ya "mirovên mê" û ne bi wateya "mehrkiriya mêrekî". Peyva "wife" jî maneya "jin" dide lê tenê bi wateya "mehrkiriya mêrekî" û ne bi wateya "mirovên mê".

Di kurdî de "jin" hem maneya "woman" û hem jî ya "wife" dide. Loma di hevokên cuda de wergêrên baş yên mirov peyva "jin" li gor kontekst û maneyê herdem wek hev wernagerînin. Kerem bikin li van hevokan binêrin:

- jina min = my wife (ne "my woman")
- Jinek û kurê xwe = a woman and her son (ne "a wife and her son")

Lê mimkin e ku bernameya wergerandinê li herdu cihan eynî peyvê bi kar bîne yan jî heta wan li cihê hev jî bixebitîne ku li gor zimanê şaşî derdikevin.

10.4. Cudahiyên peyvrêziyê

Bo wergerandina rast, ne bes e ku bernameya wergerandinê di xezîneya xwe de hemû formên hemû peyvên herdu zimanên wergerandinê qeyd kiribin û bikare wateya rast û forma rast bibijêre. Herwiha divê ku peyvrêziya zimanê wergerandinê jî rast were bikaranîn. Bi gotineke din, ne bes e ku li cihê her peyva inglîzî di tekstê de wateya wê ya kurdî were danîn.

Bo nimûne, gotina inglîzî "white snow" ji peyvên "white" (spî) û "snow" (berf/befr) pêk hatiye. Lê ne bes e ku bernameya wergerandina li cihê "white" binivîse "spî" û li "snow" jî "berf/befr" anku wê gotinê wek "spî berf" yan "spî berf" bike kurdî. Bo ku wergera kurdî rast be, bernameya wergerandinê bikare cihê peyvên "white snow" di kurdî de berovajî bike (û "a" li peyva "berf/befr" zêde bike) û wê wek "berfa spî" yan "befra spî" pêşkêşî me bike.

Mesele ne tenê du peyvên li ber hev in ku divê cihê wan bi hev were guherandin lê di hevokên dirêj de gelek asêtir e. Bo nimûne, di inglîzî de lêkera serekî adeten piştî bikerî / kirdeyî tê û li nêzîkî

destpêka hevokê ye lê di kurdî de lêkera serekî bi piranî li dawiya hevokê ye. Kerem bikin em li nimûneyekê binêrin ("wrote / nivîsî" lêker e):

- I wrote a short letter to a friend of mine.
- Min nameyeke kurt bo hevalekî xwe nivîsî.

Bo ku wergerandina makîneyî biserketî be, ne bes e ku bername bizane "wrote" wek "nivîsî" wergerîne lê divê herwiha bizane cihê wê ji teqrîben destpêka hevokê raguhêze dawiya hevokê.

10.5. Biwêj û parvebûna wan

Bernameya wergerandinê ya kurdî-înglîzî dê bizane ku "dest" bi wek "hand", "pê" (bi wê/wî/wan) wek "by" û "kirin" jî wek "do" wergerîne. Lê ne mimkin e mirov gotina biwêjî/îdyomî ya kurdî "dest pê kirin" wek "hand by do" li înglîzî wergerîne ji ber ku di înglîzî de gotineke wisa maneya "dest pê kirin"ê nade.

Di înglîzî de "dest pê kirin" dikare bo nimûne bi peyvên "begin", "start" û hin peyvên din jî were wergerandin lê bi ti awayî nikare peyv bi peyv wek "hand by do" were bikaranîn.

Bo cudakirina biwêjên çendpeyvî ji wan peyvên yek bi yek di wergerandinê de, divê bername fehm bike ka kengî mesele biwêj e û kengî jî tenê peyvên li pey hev in ku divê her yek bi maneya xwe ya bingehîn were wergerandin.

Heta eger mirov biwêjên wiha wek biwêj di xezîneya bernameya wergerandinê de qeyd bike û herdem wan wek biwêj weregerîne jî, gelek caran ev biwêjên çendpeyvî di bikaranîna di hevokan de parve dibin û beşên wan ji hev dûr dikevin. Bo nimûne:

- Wê dest bi xwandina zimannasiyê li zanîngehê *nekir*.

Anku heta eger xezîneya bernameya wergerandinê biwêja "dest pê kirin" wek gotineke bi maneya "begin, start" ya inglîzî qeyd kiribe û hem bike jî, ne bes e lê divê wê bi forma wê ya parvebûyî (dest bi ... nekir) û guheriyayî ("pê" bûye "bi" û "kirin" bûye "nekir").

11. GELO TI HÊVÎ HEYE?

Wek ku li jor hatiye diyarkirin, hejmareke mezin ya astengî û astêtiyan li pêşiya bernameyên wergerandinê heye, bo nimûne: formên çemandî yan girêdayî yên peyvan, pirwatetiya peyvan, wergerandina heman forma peyvê bi çend awayên cuda li gor kontekstê, biwêj û herwiha cudahiyan peyvrêziyê.

Madem ku hinde zehmetî li pêşiya bernameyên wergerandinê hebin, gelo qet mimkin e ku wergerên baş û bikalîte ji bernameyên wergerandinê derkevin? Gelo bernameyên wergerandinê ne tenê zimanî dilewitînin û dibin sebebên têgihîştinên çewt û xelet? Ma ne çêtir e ku em bi yekcarî dest ji wergerandina makîneyî berdin?

Bi rastî jî eger mirov li nimûneya 2 anku li wergerandina me ya ji inglîzî li kurdî binêre, xwandevaran dê biqehere û bêhêvî bibe û hest bike "De ev çi ziman e, wey hawar! Ma heqê mirovî heye ku zimanî wiha diherimîne?!"

Rast e ku gelek kêmasiyên wergerandina makîneyî hene. Lê gava ku mirov li astengên li pêşiya bernameyên wergerandinê dibîne, bi rastî ecêb e ku ew dikarin wê bikin ya ku niha dikin jî.

Tevî ku wergerandina ji inglîzî (yan ji her zimanekî din) li kurdî hê jî wergerên pir tevlihev û bêserûber dide jî, di rastiyê de hê jî niha ve jî bername dikare gelek ji van astengan çareser bike. Em dikarin bi çend nimûneyan li meseleyê binêrin:

- **formên cuda yên peyvan:** Bo nimûne, bernameya wergerandinê di teksta ji kurdî li inglîzî wergerandî de forma "agadar dikin" jî nas kiriye û rast wergerandiye tevî ku ew formeke çemandî ji "agadar kirin" e. Pirsgirêk ew e ku bername carinan hin forman nas nake.

- **pirwatetiya peyvan:** Bo nimûne, tevî ku "old" ya inglîzî bi kurdî hem "kevn" û hem jî "pîr" e, dîsa jî GT dizane "an old man" wek "zilamekî pîr" (ne "*zilamekî kevn") û "an old house" jî wek "xaniyekî kevin" (ne "*xaniyekî pîr") wergerîne. Pirsgirêk ew e ku bername carinan nizane forma rast bide.
- **eynî peyv bi zimanekî wek maneya çend peyvên zimanê din:** Bo nimûne, peyva inglîzî "say" li gor kontekst û rewşê di kurdî de dikare wek "gotin, dibêjim, dibêjî, dibêjin, bibêje/bêje, bibêjin/bêjin, bibêjim/bêjim, bibêjî/bêjî..." were wergerandin. Lê dîsa jî gava ku mirov bi GT binivîse "I say", bername dizane wê wek "ez dibêjim" (ne "*ez dibêjî, ez dibêjin, ez bibêje...") wergerîne. Eger mirov binivîse "you say", dîsa bername dikare wê li gor rêzimana kurdî wê wek "tu dibêjî" (ne "*tu dibêjim" yan "tu dibêjin...") wergerîne. Pirsgirêk ew e ku hin caran bername forma rast nade.
- **cudahiyên peyvrêziyê:** Bo nimûne, di kurdî de adeten navdêra raveber berî rengdêra raveker tê lê di inglîzî de peyvrêziya wan berevajî ye. Bo nimûne, bername dizane "hevalekî baş" wek "a good friend" wergerîne anku peyva cihê peyva "friend" (heval) di wergerê de ne li destpêkê lê li dawiyê be tevî ku hevwatera wê ya kurdî "heval" li destpêkê ye. Herwiha bo nimûne GT dizane ku adeten di kurdî de lêker li dawiya hevokê tê loma wê di wergerê de gelek caran li dawiyê bi cih dike tevî ku hevwatera wê ya inglîzî ne li dawiya hevokê be jî. Bo nimûne, GT hevoka inglîzî "I wrote a letter" rast wek "min nameyek nivîsî" werdigerîne ("wrote/nivîsî" lêkerên van hevokan in) anku lêkera kurdî "nivîsî" li dawiya hevokê bi cih kiriye tevî ku hevwatera wê ya inglîzî ne li dawiya hevokê ye.
- **biwêj û parvebûna wan:** Bernameya GT heta gelek biwêjan û formên wan yên parvebûyî jî nas dike û baş werdigerîne. Bo nimûne, ew biwêja kurdî "dest pê kirin" ne peyv bi peyv wek "hand by do" lê wek biwêj bi awayê "to begin" werdigerîne inglîzî. Ne tenê forma raderî û ferhengî ya "dest pê kirin" lê GT dikare herwiha forma wê ya parvebûyî "dest bi ... kir" di hevokên wek bo nimûne "Wê dest bi xwendinê li zanîngehê kir" jî kir nas dike û wê rast wek "she began to study at the university" wergerîne.

Gelo bernameya wergerandinê çawa ev pirsgirêk çareser kirine? Û madem ku çareser kirine, çima dîsa jî pirsgirêk hene?

Di bernameyên wergerandinê de ne tenê peyv û bergindên/hevberên wan yên bi zimanekî din hatine xezînekirin lê hevokên temam û wergerên wan yên temam jî hatine qeyd- û tomarkirin.

Bername hewl dide ku heta mimkin be hevokên yan heta bend û paragrafên temam yên wek wergera xwastî di xezîneya xwe de bibîne.

Bo nimûne, eger mirov bixwaze hevoka “ew hevalekî min yê gelek hêja ye” wergerîne û di xezîneya bernameyê de jî “ew hevalekî min yê gelek hêja ye” wergerandî hebe, hingê bername dê wê wergera wê hevokê bi temamî neqil bike. Eger di xezîneyê de tevahiya hevokê wisa tine be, ew dê hewl bide beşên heyî ji wê derê neqil bike, bo nimûne “ew helavekî min yê hêja ye” anku bêyî peyva “gelek”. Yan jî “hevalekî min yê gelek hêja” û hwd. Çiqas beşa hazir wergerandî hebe, çêtir e.

Bi ihtimaleke mezin di xezîneya GT de hazir wergerandî “an old house” wek “xaniyekî kevin” û “an old man” wek “zilamekî pîr” hene û GT wan wisa neqil dike ber çavê daxwazkerê wergerandinê. Loma GT dizane kengî “old” wek “pîr” û kengî jî wek “kevin/kevn” wergerîne.

Lê her komik (fraz) yan her hevok di xezîneya bernameya wergerandinê de peyda nabe loma kêmasî di wergerê de çêdibin. Lê çendî hevokên hazir zêdetir hebin, werger jî hind rasttir derdikeve. Loma ji ber ku xezîneya tekstên wergerandî yên bo nimûne inglîzî-fransî ji yên inglîzî-kurdî bi ihtimaleke gelek mezin zengîntir e, loma bernameya wergerandinê dikare ji inglîzî-kurdî baştir wergerandinê di navbera inglîzî-fransî de bike.

Lê roj bi roj xezîneya tekstên wergerandî yên bernameya GT tê zengînkirin anku wergerên heyî lê tên zêdekirin, ji aliyê bikaranîneran ve tên rastkirin û bername bi gelek awayên din jî pêş dikeve. Berî 10 – 20 salan wergerandina makîneyî ya inglîzî-fransî jî gelek perîşan û şepirze bû lê niha gelek pêş ketiye. Wergerandina inglîzî-kurdî jî roj bi roj dikemile û bername hewl dide gav bi gav hevokên baştir û kêr-kêmasîtir di kurdî de jî bi kar bîne.

12. ÇIMA WERGERA KURDÎ-INGLÎZÎ JI YA INGLÎZÎ-KURDÎ BISERKETÎTIR E?

Me li jortir got ku sebebê biserketîtîrbûna wergerandina bo nimûne inglîzî-fransî beramberî inglîzî-kurdî ji hindê ye ku xezîneya tekstên wergerandî yên inglîzî-fransî ji yên inglîzî-kurdî zêdetir loma bernameya wergerandinê, bo nimûne GT, dikare baştir li fransî wergerîne.

Lê wergerandina inglîzî-kurdî (ji inglîzî li kurdî) û ya kurdî-inglîzî (anku ji inglîzî li kurdî) heman xezîneya tekstên wergerandî bi kar tînin lê dîsa jî wergerandina kurdî-inglîzî ji wergerandina inglîzî-kurdî biserketîtir e. Bi gotineke din, gava ku mirov teksteke kurdî bi bernameya wergerandinê dike inglîzî, piraniya wergerê rast e û hevokên wê li gor rêzimanê bêkêmasî ne. Lê gava ku mirov tekstekê ji inglîzî wergerîne kurdî, gelek kêmasî û şaşiyên rêzimanî û naverokî peyda dibin.

Gelo sebebên vê cudahiyê çi ne?

Du sebebên serekî hene ku yek jê avaniya anku struktûra zimanê inglîzî bi xwe ye û din jî xezîneya berfireh ya tekstên inglîzî yên bernameyê ne.

Kurdî zimanekî wisa ye ku bi taybetî lêkerên wî pir diçemin anku ditewin. Li gor kes, hejmar û demê, şiklên lêkerên kurdî ji hev cuda be. Bo nimûne:

- ez dikim
- tu dikî
- ew dike
- em/hûn/ew dikin

Lê di inglîzî de ji bilî "ew" ya yekhejmar, li gel hemû yên din "do" bi maneya kirinê tê bikaranîn:

- I do (ez dikim)
- you do (tu dikî; hûn dikin)
- he does (ew/mêr dike), she does (ew/jin dike)
- we do (em dikin)

- they do (ew dikin)

Mesele ne tenê lêker in lê herwiha navdêr jî di kurdî de bi çendîn awayan diçemin lê di inglîzî de tenê wek yekhejmar û pirhejmar (ne li gor halê xwerû û halê çemandî). Bo nimûne, li cihê “2 kitêb, kitêbên mezin, di wan kitêban de” – ku sê formên cuda yên peyva “kitêb” in – di inglîzî de li her sê cihan heman şiklê “books” (ku pirhejmariya peyva “book” e) tê bikaranîn.

Gava ku bernameya wergerandinê ji kurdî werdigerîne, bo wê hêsantir e ku “dikim, dikî, dikin” hemûyan wek “do” wergerîne yan jî “kitêb, kitêban, kitêbên” hemûyan bike “books”. Loma kêmasî di wergerandina ji kurdî li inglîzî de kêr in.

Lê gava ku bername ji inglîzî werdigerîne, ne wisa hêsan e biryarê bide ka “do” bike “dikim, dikî, dikin, bikim, bikî, bikin, kirin...” anku kîjan ji van formên bibijêre heta ku li gor rêzimana kurdî rast be.

Sebebê din yê baştir wergerandin kurdî-inglîzî beramberî inglîzî-kurdî ew e ku bername baştir sîstema zimanê inglîzî fehm dike. Mîmkin e ku ji destpêkê ve avakerên bernameyê ew zêdetir li gor şert û mercên zimanê inglîzî saz kiriye. Lê hê jî giringtir ew e ku di xezîneya bernameyê de hejmara tekstên cûr bi cûr yên inglîzî pir in û bi xêra wan, bername fehm dike ka hevokên inglîzî divê çawa werin avakirin.

Wergerandina li inglîzî jî ne herdem wek niha biserketî bû. Wergerandina li kurdî jî dê ne herdem wek niha bikêmasî be. Xezîneyên bernameyên wergerandinê, bi taybetî gencîneya bernameya GT, roj bi roj dikemile û dixemile û diperise. Loma hêviyeke xurt heye ku wergerandina li kurdî jî dê di çend salan de pir pêş bikeve.

13. WERGERANDINA MAKÎNEYÎ BI KÊRÎ ÇI TÊ?

Gelek caran rexne û heta henek jî bi wergerandina makîneyî tên kirin. Heta vê dawiyê jî bi taybetî wergeran bi xwe ew hem wek tehdîd û hem jî wek heqaret li dijî karê xwe yê dijwar dihesiband.

Lê vê dawiyê êdî pispore û şarezayên wergerandinê jî êdî dizanin rol û nirxê bidin wergerandina makîneyî.

Ti kes nabêje ku wergerandina makîneyî bêtêmasî ye. Lê eger mirov wergerandina makîneyî baş bi kar bîne, sûd û feydeyê wê dikare gelek mezin be. Du rolên sereke yên wergerandina makîneyî hene:

Têgihiştin

Bi alîkariya wergerandina makîneyî mirov dikare ji tekstên bi qasî 100 zimanên cuda nivîsandî tê bigire ka teqrîben li ser çî ne û mebesta wan çî ye. Heta eger mirov nizane ka tekst bi çî zimanî hatiye nivîsîn jî, bo nimûne bernamêya GT dikare zimanê tekstê venase¹⁴ û wergerîne. Hingê bikarîner dikare bi xwe biryarê bide ka pêwîst e ku wê tekstê bi wergêrekî mirov bide wergerandin an jî ew agahiyên ku makîneya wergerandinê dane bes in (werger tê fehmkirin an jî tekst ne wisa girîng e ku were wergerandin).

Wergerandina xav

Wergêrên pispore û şareza jî dikarin bernamêyên wergerandinê bi kar binin û feyde jê bibînin. Bo nimûne, nûçeya ku me di vekolîna xwe de ji kurdî li inglîzî wergerandine, bi piranî baş hatiye wergerandin. Eger wergerandina teksteke wisa ji wergêrekî were xwastin, ew dikare zû wê bi bernamêya wergerandinê wergerîne û dû re teksta orijînal û ya werger bide ber hev û wergerê li gor pêwîstiyên rêzimanî û naverokî sererast bike. Wergerandina wiha gelek ji wergerandina hevok bi

¹⁴ Eger tekst tenê ji çend peyvan pêk hatibe yan jî bi zimanekî wisa hatibe nivîsîn ku GT pê wergerandinê nake, hingê mimkin e ku zimanê tekstê neyê nasîn.

hevok hêsantir û bileztir e. Anku wergêr dikare beşên sade û sivik bi makîneyê wergerîne û dem û bala xwe bide ser cihên dijwar yên tekstê.


Wergerandina makîneya ya ji zimanên din (bo nimûne ji kurdî) li inglîzî êdî gihiştiye wê merhele û qonaxê ku wergerandina xav yan wergerandina destpêkî ya tekstên nûçeyî¹⁵ bi bernameyan were kirin û karê wergêran êdî rastkirina şaşî û kêmasiyan be.

Wergerandina ji inglîzî li piraniya zimanên din (bo nimûne li kurdî, tirkî, erebî, farisî) hê jî negihiştiye wê merheleyê ku ew bi awayekî giştî wergerandinê li ber wergêrên pîspor zûtir û bileztir bike. Loma heta vê gavê ew zêdetir tenê bi kêrî têgihiştinê tên. Eger wergêr hewl bide teksta ji inglîzî li kurdî bi bernameya wergerandinê wergerandî rast bike, belkî ew rastkirin dê ji wergerandinê zêdetir demê bixwaze.

Lê wergerandina makîneyî ya li kurdî jî roj bi roj pêşve diçe û hêviyeke xurt heye ku di çend salan de ew karê wergêrên kurd jî pir hêsantir bike û bileztir bike. Ev jî dê pir di xizmeta zimanê kurdî de be ji ber ku kurdî bi lezgîni hewceyî tevgereke xurt ya wergerandina ji zimanên din, bi taybetî ji inglîzî, heye.

¹⁵ Wergerandina edebiyata spehî (helbest, roman, çîrok, novel, şano) hê negihiştiye wê merheleyê û ne diyar e ka dê ti caran bi bernameyên wergerandinê mimkin be yan na.

Celadet Alî Bedirxan: Ferheng kurdî – kurdî



Danerê alfabeya niha ya kurdî-latînî Celadet Alî Bedirxan (1893 – 1951) li gel çendîn karên din yên hêja herwiha ferhengeke kurdî-kurdî jî amade kiribû ku ihtimalen yekem ferhenga kurdî bi kurdî bû (yên kurdî bi zimanekî yan zimanekî din bi kurdî berî wî jî hebûn). Lê ev ferheng demeke dirêj nehatibû çapkirin. Ferheng sala 2009 di nav weşanên Avestayê de wek kitêb hatiye belavkirin.

Ferheng ji 330 rûpelan pêk tê ku ji bilî beşên ferhengî herwiha pêşgotineke keça Celadet Bedirxanî, Sînem Berdirxan û herwiha nivîsareke dirêj ya C. Bedirxanî bi xwe li ser nasandina alfabeya kurdî-latînî cih girtiye.

Ferheng bi xwe ji sê beşan pêk tê. Peyvên bi herfên F – Z dest pê dikin û herwiha beşa dawiyê ji peyvên bi tîpa E dest pê dikin ew peyv in ku C. Bedirxan bi xwe amade kirine û şirove û nimûneyên wan jî nivîsîne. Wî herwiha peyvên bi herfên A – E jî dest pê dikin nivîsîbûn lê mixabin ew winda bûne û di vê kitêbê de jî nehatine çapkirin.

Li cihê beşên windabûyî, peyvên bi herfên A – E dîsa ji aliyê zavayê C. Bedirxan anku Selah Saladallah ve hatine hazirkirin û di vê kitêbê de jî li gor rêzbendîya alfabeyê li berî beşên mayî yên ferhenga Bedirxanî hatine bicihkirin.

Di ferhengê de texmînen 8000 – 9000 serpeyv peyda dibin. Piraniya peyvan hatine bi kurdî hatine şirovekirin lê hejmareke ne kêr jî tenê hatine rêzîkirin lê ti şirove (û ti nimûne jî) jê re nehatine dan. Bo nimûne, mirov dikare hin peyvên bê şirove hiştî ji herfa Ş bide "şamoyî, şaran, şebîk, şelik, şelm, şelûf, şemase, şembilêlk, şem, şemixandin, şemixîn, şepne, şerix, şerûdî, şerût, şetat, şewt, şexf..."

Rast e ku vê kitêbê wek texmînen yekem ferhenga kurdî bi kurdî dê helbet gelek kêmasî hebin ji ber ku C. Bedirxan ew di kêr-îmkaniyên mezin de amade kiriye. Lê mixabin amadekerên ferhengê bo çapê jî ev peyv bi şirove yan nimûneyan temam nekirine.

Carinan li cihê şiroveyên kurdî, hatiye gotin ku maneya peyvê bi erebî çî ye tevî ku divê ev ferhengeke kurdî bi kurdî bûya. Bo nimûne, "pişkîn: bi erebî Etis jê re tê gotin..."

Di beşa aliyê C. Bedirxanî ve amadekirî de li gel şiroveyan, li ber hin serpeyvan herwiha yek yan du-sê nimûneyên bikaranînê jî hene. Lê ne cinsê rêzimanî (mê yan nêr) yê navdêran û ne jî rehê dema niha yê lêkeran hatiye diyarkirin. Di beşa Selah Sadallahî de ti nimûneyên bikaranînê jî peyda nabin.

Beşa S. Sadallah tenê ji 6 herfan (a, b, c, ç, d, e) pêk hatiye lê dîsa jî ew bi qasî 90 rûpelan digire, beramberî 26 herfên din ku tenê 190 rûpel girtine tevî ku kêr peyvên kurdî bi C, Ç û E dest pê dikin. Anku beşên pêşiyê ji yên dawiyê gelek berfirehtir in. Wek din jî ji etîmolojî ve jî cudahiyeke mezin di navbera wan de heye: Bedirxan bi zelaî peyvên xwe ji axiftinên kurmancî lê herwiha jî kêr ferhengên heyî yên wê demê yên kurdî û herwiha yên osmanî wergirtine. Di ferhengê de C. Bedirxan ji peyvên bi eslê xwe erebî nereviye. Berevajî wî, S. Sadallah piraniya peyvên xwe ji ferhengên soranî wergirtine ku wan jî piraniya wan ji farisî neqil kirine. Herwiha hin peyvên ji tirkî de jî tê de hene, bo nimûne "balte: tefşo, tivir (mebesta wî "tevr" e), bivir, zomp" (< tirkî "balta = bivir). Lê heta ji Sadallah hatiye, wî cih nedaye peyvên bi eslê xwe erebî tevî ku ew di kurdî de berbelav bin jî. Bo nimûne, mirov peyvên "daîre, ders, dewam, dewlet" tê de nabîne (lê "dersdar: derskar, mamosta, seyda, hînkâr" û "dewlemend: dewletî, zengînî, jêhatî").

Hem di beşa Bedirxanî amadekirî de û hem jî di ya ji aliyê Sadallahî ve hatiye hazirkirin ji aliyekî ve hejmareke pir mezin ya peyvên rojane tê de peyda nabin û li aliyê din jî pir peyvên nadir û xerîb tê de peyda dibin.

Werger û wergêran di kurmanciyê de:

paşxane û hindek pirsên îroyî

Ergin Öpengin

1. Sereta¹⁶

Yekem nimûneyên wergerê¹⁷ di kurmanciyê de, wergeraşerefname yaşerefxanê Bedlîsî ya Mela Mehmûdê Bayezîdî û hindek nusxeyên Încilê ne ku di nivê duyem ê sedeya XIXê de jilayê mîsyonerên rojavayî hatine encamdan.¹⁸ Heke em vê diyardeyê di nava çarçoweya siyasî û edebî ya wê çaxê de bi cih bikin û wisa tefsîr bikin, bêguman destpêkeke nisebeten ne-zêde-dereng e. Lê belê, em dibînin ku van nimûneyên pêşî rê li ber duristbûna tradîsyonekê venekirî ye; lewre heta serê salên 80yan, gava roşnabîrên kurd li Ewrûpaya rojava kelk jiderfetên sazûmanî û dewletî wergirtin û ji bo dabînkirina (tedarîkkirin) materyalên dersên kurdî di xwendegehan de dest bi wergêrana deqên edebiyata cihanî kirin, hîç hewleke birêkûpêk a wergêranê xuya nebûbû li ser sehneya roşnabîriya bakurê Kurdistanê. Ev qederê deheyên dawî ne liv û bizaveke wergêranê di kurmanciyê de berçav e. Lê belê, van hewlanheta nihaşeweyê projeyên berfireh negirtibû, bêtir di çarçoweya hêz ûşiyana kesê/a wergêr de bû. Di demekê de ku Kurd bi zimanê xwe nedihatine perwerdekirin û kar û xebata sazî û dezgehên kurdî ya bi pênavê ziman û edebiyata kurdî tûşî kosp û astengên yasayî û pratîk dibû, bêguman zêde muhtemel nebû ku bizaveke xwedan-bername û birêkûpêk a wergerê pêk bihata. Herwiha, serinçek bi ser serhatiya wergerê di kurmanciyê de diselimîne ku rewşawergerê hevterîb (

¹⁶ Gelek spas bo kak Remezan Alan û kak Bawer Ronahî ku nusxeyeke pêştir a vê gotarê xwendin û bitêbîniyên xwe pişkdar bûn di kêmkirina kêmasiyên nivîsarê de.

¹⁷ Li vir ‘wergêran’, prosa veguhastina deqekê ye ji zimanekî bo zimanekî din, anku kiryar û mijûliya venivîsandina deqekê bi zimanekî din e. Heçî ‘werger’ e, ew netîceya kiryara wergêranê ye. Wergêran (*translating*) kiryar e û werger (*translation*) encam e.

¹⁸ Li vir qesta me bi tenê kitêbên wergêrayî ne; heke na sala 1925ê Încilek bo kurdî tê wergêran lê belê ji ber ku wergereke birêkûpêk û têgihiştinbar nîne nahê çapkirin. Ji bo zanyariyên zêdetir bnr. Thomas (1990). Herwiha ihtimal e ku berî vê tarîxê wergerên bi kurdî çap bibin, lê halê heyî zanyariyên di destê me de van berheman wekî nimûneyên pêşîn ên wergera kurdî didêrin.

paralel) bûye digel rewşa siyasî û civakî û roşinbîrî. Li ser vê paşxaneyê, em dê di vê gotarê de hewl bidin serhatiya wergerê di kurmanciyê de pêşkêşbikin û serinceketaybet bidine ser bizava wergerê ya piştî salên 80yan da ku taybetî û layenên serekî yênhewlên wergêranê, her digel kêşe û girîftên ku ew bizav tûşî bûyê, destnîşan bikin. Lê belê, sereta, em dê munaqeseyeke teorîk pêşkêşbikin ji bo ronkirina hindêk layenan, paşê dêawireke mêjûyî bidine ser pêşketin û werara (tekamûl, guhorîn) zimanê kurdî ji bo dabînkirina bingeheke mêjûyî da ku rê bide tehlîleke birêkûpêktir ji bo têgihiştina îroya meydana wergerakurdî.¹⁹

2. Wergerandin û cûreyên wê

Jakobson (1959/2000:113) modêlekê pêşniyar dike bo jêkcihêkirina cûreyên wergerê. Sê cûrewergeran bi nav dike: wergera navzimanî (intralingual), wergera di navbera zimanan de (interlingual) û wergera di navbera sîstemên semiyotîk de (inter-semiotic translation). Wergera navzimanî, verêkxistina deqekê ye bi heman zimanî; wate, bi pêy profilaxwendevanan venivîsîna deqekê ye da ku ew deq berdest û xwendinbar be bo xwînerên wîzimanî. Bo nimûne, berhevokê ji çîrok û meselokên ku Mela Mehmûdê Bayezîdî di salên 1850an de berhev kiribûn, heke îro jinûve bêne çapkirin pêwîst nake gelek bêne sadekirin û bihêsanîr bêne venivîsandin, lê belê, berhema Mem û Zîn bi kurdiya îro , ku bi amadekirina Jan Dostî derçûye, adaptasyoneke pir berfireh û pêdaçûyî ye ku peyv û qalibên wê heta dereceke bilind hatine nûjenkirin û derbirrînên stîlistîk li zimanê nûjen hatine guncandin. Wergeranavbera du zimanan, li layê din, wergêrana ji zimanekî bo zimanekî din e. Wate, ew cûreyê wergêranê ye ku em bi rengekî asayî ji têgeha wergêranê têdigihin. Cûreyê sêyem ew e ku jêre gotiye wergera di navbera sîstemên semiyotîk de, ku di vê de nîşanên zimanî bi rêyasîstemên nîşanên ne-zimanî teneşîrovekirin (Jakobson 1959). Bo nimûne, filîmekî jiromanekê hatî adaptekirin nimûne ye ji bo wergera di navbera sîstemên semiyotîk de. Di vanhersê

¹⁹ Divêt diyar bikin ku di vê lêkolînê de em serincê nadin ser çawanî û rexneya wergeran; hevîdar înlêkolînên dîtir ronkatiyê bixine ser wî layenê girîng. Herwiha, wergerên ku wekî kitêb bi kurmanciya bakur û li Kurdistanê bakur, Tirkiye û li Ewrûpa çapkirî mijara vê gotarê ne.

cûreyên wergerê de jî armanc dabînkirin û pêşkêşkirina deqekê ye bişewazekî nû. Behsa me bi tenê li ser cûreyê wergera di navbera zimanan de ye.

Lêre pirsyarek xwe dadisepîne sebarek bi wergera di navbera lehceyên kurdî de. Gelo gava emdeqeke edebî ji soranî vediguhêzin kurmanciyê, karê em dikin wergêran e an na? Diyar eedîtor û rewşenbîrên kurd nejdil in jê re bêjin « werger » lewre gelek caran wesfê wergerê li berhemên ji soranî bo kurmanciyê hatî veguhastin nakin, bi tenê îfadeya « ji soranî » an jî « kurmanciya wê » dinivîsin. Heke em li jêr ronîya vê polîkirina/senifandina Jakobsonî ya sê-cûreyî meseleyê lêk bidin, em dê bibînin ku, di cewher de, karê ku wergêrê ji îngilîziyêdeqekê vediguhêze kurmanciyê û karê yê deqekê ji soranîyê vediguhêze kurmanciyê hemantişt e. Rast e ku, ji ber nêzîkî û zêdeyiya hevbeşiyên peyvî û rêzimanî, qelibandina deqê ji soranî bo kurmanciyê dê bêserêştir û hêsantir be, lê belê gava ji soranîyê werdigêre jî armanc ji wî kar û kiryarê ew e ku deqa bi soranî bo xwînerê kurmanciyê bi heman naverok ûmuadiliya stîlîstîk berdest be. Wate, adaptasyonek nîne ku armanca wê hêskirina ûxwendinbartirkirina deqê be ji bo xwînerên kurmanciyê, belku her wekî deqa ku ji îngilîziyê wergêran, venivîsandina deqê ye bi sîstemeke din a zimanî. Ji ber vê hindê, em dê di vêgotarê de berhemên ji soranî hatî veguhastin jî bi nimûneyên wergerê hesêb bikin, her wekîdeqên ji zimanên din.

3. Awirvedaneke mêjûyî li ser pêşketina zimanê kurdî

Digel îslamîbûna Rojhilata Navîn bi sedsala VIIIê re, zimanê erebî piraniya kardayên/fonksiyonên bilind ên zimanên herêmê zeft kirin; bi vî rengî, zimanê kurdî jî wekî zimanêndin daket statûyeke duhemî. Tenanet di xanedanên Kurdan ên sedsalên X-XIIan de jî dîsazimanê kurdî bêtir wek zimanê axiftinê maye di nav xelkî de (Nebez 2008:58). Bi tenê digelmîrekiyên Kurdan ên sedsala XVIê kurdiyê di nav derdorên esîlzade yên rêveber de nîrxekîdiyar bi dest xist. Bruinessen (1989:43) dibêje ku tradîsyona edebî ya kurdî, di qesrên binemalên torin ên sedsalên XVI û XVIIan de dest pê kir. Ew barûdoxa ku li rûyê zimanî ve destxweşbû, kir ku neslekeşairan rabe ku berhemên xwe bi kurdî nivîsandin, ji wan Mela useynê Bateyî (1414-1495), Elî Herîrî (1425-1541?), Feqiyê Teyran (1590-1660), MelayêCizîrî (1570-1640), Ehmedê Xanî (1650/51-1707) û hwd. Lê belê, ev bizav û pêşketinên limalika zimanê kurdî, li jêr sî û sîbera serdestiya zimanê erebî û farsî bi rê ve diçû. Em dikarin vê

qenaetê ji wan risteyên Ehmedê Xanî derbixin ku di Mem Zîn ê de gazindan li wê hindê dike ku zimanê kurdî bi şayanî xwe di rewacê de nîne.²⁰ Herwiha, rola zimanê kurdî ya bihêsankirina perwerde û fêrbûna erebiyê bertengkirî dîsa nîşaneya wê statûya duhemî ya kurdiyê ye.²¹ Piştî rûxîna hemû mîrekiyên otonom ên Kurdan di nîvê duyem ê sedeya XIXandê, kurdî, ji bilî hejmareke girîng aşairên ku bi piranî bi soranî dinivîsîn û xwedankarîgerî bûn di nav cemawerê de, bi esasî bû xem û barê wan cemiyet û komeleyên çandî û siyasî yênkurdan ku di dawiya sedsala XIXan û serê sedsala XXan de li Stembol û bajarên din hatibûnvekirin. Herwiha, wê heyamê, kurdiyê statûya xwe ya duhemî di perwerdeya li medreseyan de jî parastiye. Dîsa wan heyaman, li Stembol û bajare-merkeziyên din ên Rojhilatê Navîn, yekem kovar û rojnameyên kurdî hatine belavkirin. Di nav wê çarçoweya giştî ya roşinbîriyakurdî de, ji sala 1844ê heta avabûna komara Tirkîyeyê ya 1923yê, li Tirkîyeyê 20 kitêbhatibûne belavkirin (Malmisanij 2006:18). Lê belê, li pey avabûna komarê, digel înkîlab û sazkarîyên salên 1924 û 1925an²², hemû fealiyetên bi û bo zimanê kurdî derqanûnî îlam bûne û bi vî rengî, ber û bergehê pêşketina zimanê kurdî, anku sazkarîyên kulliyatê ku jiyana modern û bajarî li zimanî ferz dike, mecbûr ma berê xwe bide derveyî sînorên welat û Tirkîyeyê.

3.1. Modernîzasyona zimanî ya kurdiyê

²⁰ Bo nimûne beytên li xwarê nîşaneya vê hizrê ne. Ji bo kurdiya wê brn. Xanî (2010 [1695]); ji bowergera wê ya îngilîzî, ku beytên li xwarê jê hatine wergirtin, bnr. Khani (2008 [1695]):6/19

<i>Çibkim ku qewî kesad e bazar</i>	<i>However the market is stagnant</i>
<i>Nînin ji qumaşî ra xerîdar</i>	<i>No one is buying our garment</i>
<i>6/35 Neqdê me mebêje kêmbuha ye</i>	<i>So do not say that our coinage has little value</i>
<i>Bêşikêê şahê şahrewa ye</i>	<i>That's unminted by a king of kings</i>
<i>Ger dê bibuwa bi derbê menqûş</i>	<i>Had it been engraved when minted</i>
<i>Nedma wehe bêrewac û mexşûş</i>	<i>It would be in currency not counterfeit</i>
<i>Mehbûb e bi kes ne namîzad e</i>	<i>Beloved indepted to no one</i>
<i>Lew bextesiyah û namurad e</i>	<i>So it is doomed and unfulfilled</i>

²¹ Ferhenga menzûm a kurdî-erebî-kurdî *Nûbehara Biçûkan* (1683) ya Ehmedê Xanî û rêzimana erebî ya bi raveyên kurdî bi navê *Tessrîf* ya Elî Teremaxî (sedsala XVIIê) delîlên vê hizrê ne.

²² Qanûn û sazkarîyên wekî *Tevhîd-î tedrîsat* (1924), *Rakirina xelîfetiye* (1924), *girtina medreseyan* (1924), *Qanûna Takrîr-i Sukûn* (1925) ku li pey *Serhildana Şêx Seîd* (1925) hatibû birêxistin û *Şark Islahat Planı* (1925) (*Pîlana Isleheta Rojhilatê*) ya nihênî, ji bilî muhtewa û karîgeriyên xwe yê din, detpêka yasayîbûna bêtehemuliya dewletê ne jî li hember zimanê kurdî.

Xebat û xîretkêşîya Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Bedirxan di serî de, ya ekola Hawarê bigîştî, ku li dor kovarên Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-45), Roja Nû (1943-46) û Stêr (1943-45) şikl û şêwe girtin, xaleke wergerxanê ne di pêşketina bunyewî ya kurmanciyê de. Digel vê hindê jî, ji ber neyasayîbûn û bi perawêzxistina (marjînalîzasyon) kurdiyê ya di qadagîştî de, karîgeriya wan xebatan a di bikaranîna zimanî de li Tîrkiye û bakurê Kurdistanê, hetaserê salên 1980yan esxerî û kêmbûye. Bo nimûne, ji nivîsarên bi kurdî yên ku di kovarênwekî Îlî Yurd (1958), Dicle-Fîrat (1962) hwd. de, ku wê çaxê bi tirkî derdiketin û carinancih didane nivîsarên bi kurdî jî, diyar dibe ku nivîskar û edîtorên wan kovaran zêde haydar nebûne ji normên zimanî yên ekola Hawarê. Lewma wisa diyar e ku xebatên Bedirxaniyanşîyane du qonaxên pîlansaziya zimanî, wate destnîşankirina norman û kodîfikasyon (tedwîn), pêk bînin, lê belê qonaxên sepandin û sabîdkirina normên zimanî pê re nehatine. Ji ber vêhindê, hejmara sercemê (hemû) kitêbên ku di navbera 1923 û 1980yê de li Tîrkiyeyê hatine belavkirin 20 e (Malmîsanîj 2006:19). Heyama piştî 1980yan heta digihe serê salên 2000an, navenda modernîzasyona temînolojîk a kurdî û dariştina materyelên fêrkariya zimanî, diyasporaya kurd a li welatên Ewropayê bûye, lê bi taybetî diyasporaya kurd a li Swêdê. Mîrov dikare wê bi perawêzxistin û jêrdestkirina kurdiyê û tevkariya diyasporayê di pêşketinazimanî de li ser hejmara kitêbên belavkirî jî bixwîne; zîra, di demekê de ku di navbera salên 1974-2005an de li Swêdê 657 kitêb hatine belavkirin (Scalbert-Yücel 2007: §24-31) li Tîrkiyeyê hejmara sercemê kitêbên ku ji 1844ê heta 2005ê hatî belavkirin 632 e, ku nîvê wani nav pênc salên dawî de derçûne (Malmîsanîj 2006:22).

Digel rabûna qismî ya qedexeya xerîb û xêşim a li ser bikaranîna kurdiyê li Tîrkiyeyê, axirî berebere normên zimanî di nav xelkî de cihek ji xwe re bi dest xistin.²³ Zîra, tevî çarçoweya kultûrî û siyasî ya salên 90an, ku bi zext û tepeseriyêşikl girtibû, ji bilî avabûna navendên kultûrî, enstîtûyên kurdî û weşanxaneyên ku bi kurdî jî kitêb belav dikirin, li Tîrkiyeyê yekemîn rojnameya hefteyî ya bi kurdî jî dişa di wê qonaxê de derçû. Herwiha, weşana Med-Tv'yê, ku di 1995ê de dest pê kir û hejmareke televîzyonên din dane dû, xwedanê roleke girîng bûn ji ber ku êdî derwazeyeke giştgir vebûbû ku netîceyên hewlên sabîdkirina normên zimanî bikevine nav jiyana rojane ya xelkî. Bi vî rengî, van pêşketinan, heta dereceyekê, rol û kardayên taze yên pratîk û sehî (perceptual) spartine kurdiya ku ji ber binecihbûna jiyana bajarî û xwendîngehan rewşa wê ya di nav jiyana rojane de pir hesas bûbû. Ev werar bileztir lêhat gava di 2002ê de yasaya ku rê dida fêrkariya “ zimanên herêmî ” hate

²³ Helbet, berî rabûna wê qedexeyê jî, di nav bergehê siyasî yê pir daxiraw de zimanê kurdî bi rêya weşanên deryasayî lê bi taybetî bi rêya radyoya Êrevanê qadeke giştî ya qismî bi dest xistibû.

qebûlkin. Vebûna dersên taybet ên zimanê kurdî,²⁴ salane çapbûna zêdetir ji sed kitêban, zêdebûna televîzyonên kurdî yê peykî, hebûna qewî ya medyaya vîrtûel a kurdî, axirî birêkktina televîzyonad ewletî ya bi navê TRT 6 di 2009ê de û behsên li ser avakirina departmanên ziman û edebiyata kurdî fakterên serekî ne ku wê heyamê xwedankarîgerî bûne li ser normalîzasyona zimanê kurdî.

4. Werger di kurmanciya bakur de heta salên 80yan

Pêşketina wergerê heta dereceyeke mezin hevterîb bûye digel geşedana kultûrî û zimanî kuserhatiya wê pir bi kurtî hate behskirin. Kevntirîn wergera kurdî nîşana wê yekê ye, lewre, yekem kitêba bo kurdî hatî wergêran, Încîlek e, Încîla Matthew ku sala 1856ê bi elifbêya ermenî li Stembolê hatiye belavkirin.²⁵ Mîsyonerên mesîhî yê ermenî ev kitêba ku di hemandemê de yekemîn kitêba kurdî ya çapkirî ye, ji zimanê yûnanî wergêrane. Her li dû wê, sala 1961ê, wergereke din derket ku ew jîşîrove û raveya Încilê bû û li Stembolê çap bûbû. Serenavê wê Alfabece ye û bi kurmançî ye. Di wê kitêbê de armanc têgihandina zarokan e û agahî li ser tarîxa zimanê kurdî hene. Temoyê keşeyekî kurd-ermenî jî beşine din ji Încîlê wergêrane û American Bible Associationê ew sala 1972ê çap kirine. Herwiha, sala 1891ê, dîsa Încîl û mezmurên wê, bi wergêrana çend keşeyên ermenî hatine belavkirin.²⁶ Komekexebatê ku American Board of Comissions for Foreing Missionsê wezîfedar kiribû, bi xebateke dîrûdirêj Încîlên Matthew û Mark di 1922yê de û ya Lûqa di 1923yê de belav kirin (Thomas 1990:216). Malmîsanij (2006:18) diyar dike ku di navbera 1856 û 1923yê de sercem 7 wergerên Încilê bi kurdî hatibûne çapkirin, hemû jî ji layê Ermenî û mîsyonerên rojavayî ve.

Ev Încîl ji aliyê saziyên mîsyonerên mesîhî ve bi hevkarîya digel Kurdan dihatine wergêran û çapkirin, û armanc jê ew bû ew ermeniyên ku di nav Kurdan de bere bere bi zimanê kurdî emel dikirin îstifadê

²⁴ Berî ku ev ders bi biryara rêveberên xwe ve bêne girtin, sertîfîkaya dersan dabûne 1179 şagirtan, û gavahatine girtin, 1780 şagirtên nivîsî hebûn. (bnr. Akin 2007).

²⁵ Dehqan (2009) sala çapkirina wê Încilê wekî 1965 dide, lê li ser nusxeya eslî ya kitêbê wek 1957 hatiye.

²⁶ Ji bo nirxandineke Încîla bi elifbêya ermenî ya bi kurdî, bnr. B. W. Stead, 'Kurdistan for Christ', *The Moslem World*, 10(3) (1920), r. 247. Herwiha bnr. K. J. Thomas, '[Translations of the Bible into]Kurdish', *Encyclopaedia Iranica IV* (1990), r. 214.

jê bibînin û ji ser dîne xwe neçin; herwiha, veğerandina Kurdên musulman bo ser dîne xristiyanîyê jî armanca wan wergeran bû.

Wergereke din a kevn a Încîlê di 1947ê de, bi wergêrana Kamuran Alî Bedirxan û ThomasBoisê keşeyê Domînîkan, li Beyrûdê, bi tîpên latînî û erebî hate belavkirin.²⁷ Wan herwiha berhemeke bi navê Metelokên hezretî Silêman jî ji Îbrani wergêraye (Thomas 1990: 215).

Dîsa yek ji wergerên pêşî yên kurdî ji destê Mela Mehmûdê Bayezîdî, di salên 1858-59an dehat. Wî pişkek ji kitêbaşerefname ya Sherefîxanê Bedlîsî, bi serenavê “Tevarîxî qedîmîKurdistan ” ji farsîyê wergêra kurmancîyê. Dîsa di wan salan de rojhilatnas Peter Lerch dîtêba xwe de, ya bi navê Forschungen uber die Kurden und die iranischen Nordchaldaer cihdide wergera kurdî ya hejmareke çîrok û metelokên ji fînlandî û tirkî.

Di wê serdema mîsyoneran de wergêrana tekstan ji endîşeyên zimanî bêtir bo xizmeta dîni bû. Gava li Stembolê kovarên cemiyetên Kurdan derdikevin, hindek nimûne ji wergerên helbestan tê de tene belavkirin û hew. Piştî Bayezîdî, bo cara yekem di sala 1931ê de, Erebêşemo bi wergêrana Koçekê Derewîn a Aleksandr Araratyan nimûneya wergereke edebî ûxwedan-endîşeyêke zimanî pêşkêşdike. Heta digihe salên 80yan, bi tenê hindek xebatênCeladet Alî Bedirxan, Kamuran Alî Bedirxan, Qedrîcan û Osman Sebrî tene pêşçavan.Celadet Alî Bedirxanî çîrokeke bi eslê xwe îngilîzî ji frensî wergêra û di 1943yê de lişamêçap kir; Kamuran Alî Bedirxanî ji bilî Încîl û metelokên ku hatine behskirin, herwiha, 36 Çarînên Xeyam û gelek sûretên Qurana Pîroz û qederê 700 hedîs wergêran û di Hawarê de beşbi beşbelav kirin. Qedrîcanî jî beşine ji romaneke fînlandî bi navê Di welatê zembeqê gewir [gewr] de di hejmarên Roja Nû de belav kirin; herwiha wî çîrokek ji erebî di hejmara 13ê yaRonahîyê de belav kiriye.

Wek me gotî, serencama wergera kurdî lazim e ji çarçoweya giştî ya edîsyon û roşinbîriyakurdî nehê cudakirin. Gava mirov li hejmara kitêbên ji nivê duyem ê sedeya XIXê heta digihesalên 1980yan dinihêre, mirov têdigihe ku rewşa wergera kurdî, ku huzûreke/mewcûdiyetekeyekar zeîf heye, pir derasayî nîne. Lewre em dibînin ku edeb û çapa bi kurdî jî kêr zêde di heman rewşê de bûye; ji sala

²⁷ Me ev têgeh ji gotara Remezan Alanî wergirtiye ku nivîskar bi vê têgehê ji bo meyla giştî ya di warê edebiyat û mijûliya zimanî ya kurdîyê de diîne û dibêje ku hesta mesûliyetê, ku hesta motor û karîger edî nivîskariya kurdî de, rêya derhatin û rabûna edebiyateke xwedanendî şeyên estetîkeke takekesî ûheqîqî dixitimîne. Bo lêkdaneke berfireh bnr. Alan (2009: 11-18).

1843yê heta 1923yê, sercem 30 kitêb, û dîsa ji 1923yê heta 1980yê bi tenê 20 kitêb hatine çapkirin ku hemû jî piştî sala 1965ê derketine.

5. Werger di serdema nûjen de

Piştî salên heştêyî du qewimînên girîng bûn hoy û egerên wê hindê ku warê weşan û wergêriya kurdî ruh û dînamîzmekê peyda bike. Ya yekem ew bû ku hejmareke mezin aroşinbîrên kurd, digel derbeya (kûdeta) 1980yê a li Tirkîyeyê revîn bo Ewropayê. Bixîretkêşîya wan roşinbîran, bi taybetî li Swêdê, weşanxaneyên kurdî vebûn, kovar û kitêbên bikurdî derçûn û dersên zimanê kurdî di xwendîngehan de bûne hander/motîwasyon û mecbûriyetek ku berhemên pedagojîk bêne duristkirin. Qewimîna duyem jî, rakirina qismî ya qedexeya bikaranîna zimanê kurdî ya di weşanan de bû di 1991ê de. Piştî wê tarîxê êdî li Tirkîyeyê bi taybetî li Stembolê weşanên kurdî diyar bûn.

5.1. Hejmar û sala çapbûna wergeran


Di vê serdemê de, nimûneyên pêşîyê ji wergera kurdî ya edebî berev dawîya salên heştêyanderçûne. Tablo 1 nîşan dide ku ji 1980ê heta 1991ê, bi tenê heşt kitêb hatine wergêran, ku hemû jî piştî 1988ê. Piştî sala 1992yê zêdebûneke aşkera tê ber çavan di hejmara wergeran de û heta sala 2001ê hejmara wan digihe 58ê. Lê bêguman di deheya dawî de, navbera salên 2002-2009, wergera kurdî meydaneke gelek firehtir bi dest dixe û hejmara kitêbên çapkirî digihe 126ê. 19 kitêbên sala çapa wan nediya jî dîsa di nav van du deheyên dawî de, lê bitaybetî di deheya dawî de derçûne.

Wergerên kurdî yên sê deheyên dawî	
1980 – 1991	8

1992 – 2001	58
2002 - 2009	126
Sala çapê nediya	19
Sercem	211

Tablo 1. Hejmara wergerên ku di navbera qonaxên girîng de hatine çapkirin

Grafîk 1, ku hejmara wergerên çapbûyî yên piştî sala 1992yê rêz dike, nîşan dide ku wergerakurdî, ji bilî çend salan, bi giştî sal bi sal berev zêdebûnê ve çûye. Lê piştî salên 2000an êdî her sal zêdetir ji dehan kitêb hatine çapkirin.




Grafîk 1. Sal bi sal hejmara wergerên kurdî

Piştî salên 2000an, di nav komelgeya kurdî ya bakurî de werçerxanek pêk hat di gotara siyasîde û pê re têkoşîna bo ziman û mafên kultûrî kete rêza pêşî. Her di wan salan de bi giştî diwarê weşangeriya kurdî de liveke berçav heye û kovarên kurdî jî lêk zêde dibin. Lewma evhejmar nîşan didin ku wergera kurdî ku pêşî bi pêngavên kurt û di nav çepereke pir teng de birê ve diçû, piştî sala 2004an cihê xwe qahîmtir kiriye û di nav weşangerî û xwendevaniya kurdî de cihek ji xwe re terxan kiriye.

5.2. Destpêka li diyasporayê dewama li welatî

Berhemên pêşî yê bi kurdî li diyasporayê serê salên 80yan derketin. Lê ji bilî hindek kitêbên zarokan, heta sala 1988ê, gava kuşervanekî biçûk ê Vîetnamî ji nav weşanên Roja Nû derçû, hîç kitêbeke wergêrayî nehatibû belavkirin. Di demekê de ku li diyasporayê tovên wergera edebiyata nûjen a cîhanî dihatine reşandin, wate di salên nevbêra 1988-1991ê de, li welatî ji ber qedexeyên li ser bikaranîna zimanî di qada giştî de hêj hîç hewl nedihatine ber çavan. Grafîk 2 nîşan dide ku salên 90an dibe heyamek ku tê de zimanê kurdî bi rengekî ciddî xwe liwarê wergerê digire. Weşanên Roja Nû, Nûdem û Apec bi taybetî lez û serûberekê didin wergerê. Dîsa di heman heyaman de, sala 1996ê, yekemîn kovara wergerê ya bi kurdî derdikeve bi navê Nûdem Werger. Wergera ku heta hingî, ji bilî çend nimûneyan, di navçarçoweya edebiyatê de mabû, digel hejmara yekem û dawî ya Nûdem Werger ê, xwe li deqênwekî rexneya edebî, zimannasî û hwd. ceriband. Piştî rabûna qedexeya li ser bikaranîna zimanî di asta yasayî de, li Stembolê hêdî hêdî weşanxane û saziyên kultûrî û lêkolînî yê kurdî vebûn û vê yekê digel xwe rê li ber derçûna wergerên kurdî jî vekir. Bi vî rengî, derçûna çend dîwanên helbestan ji nav weşanên Avestayê bi qewlê destpêkekê ye bo wergerên çapkirî yê kurdî li Tirkîyeyê.



Grafîk 2 (jor). Nisbeta wergeran di nav sercemê kitêbên çapkirî de li Tîrkiye û Kurdistanê Bakur

grafîk 3 (jêr). Werara wergerên kurdî li diyaspora û li welatî

Bêguman, aşkera ye ku ev hejmara bilind a wergeran li Ewrûpayê û hejmara nisbeten pir kêma yên li Tîrkiyeyê pêwendîdar e digel rewşa giştî ya roşinbîriya li wan herdu mekanan. Li Ewrûpayê tecrûbeyên Kurdan di warê weşangerî û kovargerîyê û herwiha di perwerdeyê de rêdabû ku berhemên wêjeya cîhanî bîne wergêran bo kurdî. Lê li Tîrkiyeyê hem îmkânên çapkirina berheman pir kêma bûn hem jî cemaetê xwendevanan ku wergêrana wan deqanferz bike zêde nedihate ber çavan. Dîsa jî bi giştî 15 kitêb hatine wergêran û ji wan bi tenê çend lib, wekî versiyoneke kurt a Mirovên Hejar a Victor Hugo û Qaqlîbaz a Richard Bachderîyeke cîhanî ne li ber edebiyata kurdî, yên din bi piranî berhemên nivîskarên soranîzimanin an jî yên nivîskarên kurd ên tirkî nûs in ku bo kurdî hatine wergêran.

Piştî gorrankariyên serê salên 2000an, ku li jor hatine behskirin, li Tîrkiyeyê hewlên roşinbîriya kurdîşîkl û şewazên kemilî wergirtin û meydana siyasî û civakî bû hoyê wê hindê ku serinceke taybet

bikeve ser weşanên bi kurdî. Ev pêşketinên li Tirkîyeyê heta dereceyekêfonksiyona esasî ya weşangerî û wergêriya li Ewrûpayê jê stand û di vê nisbetê de wergerên li Ewrûpayê kêmtir lêhatin. Piraniya weşanxaneyên ku salên 90an bi awayekî çalak bo wergerakurdî dixebitîn hatine girtin û erkê wan kete ser milê weşanxane û saziyên li welatî, bi taybetîyên li Stembolê. Lewma di navbera 2002 û 2009ê de li Ewrûpayê li dor 37 kitêb hatine belavkirin ku ev rêje, nisbet bi salên pêştir gelek kême. Lê belê ji Grafîk 2 diyar e ku bihejmara xwe ya ku digihe 105 kitêban, di vê qonaxa navborî de li welatî ji sercema salên berêzêdetir kitêb hatine wergêran. Hejmara wergeran bi nisbeta kitêbên bi kurdî çapkirî (Grafîk 3) diyar dike ku pişka wergeran, di salên ewil de dîsa pir kême lê piştî 2005an dînamîzmeke dindikeve nav wergera kurdî.

Bêguman di vê yekê de pişka herî mezin ya weşanxaneya Lîs ê ye ku bêtir ji zimanê tirkîhelbest û çîrok dane wergêran û herwiha weşanxaneya Avesta ku bêtir berhemên soranî berdest dikirin bo xwendevanên kurmancîziman lê herwiha hewleke taybet dida bodabînkirina berhemên esasî li ser dîrok û komelgeya kurdî. Weşanxaneya Bajar jî bi wîzyonaxwe ya xweser a naskirina edebî cîhanî bi zimanê kurdî û bi wergerên ji zimanê resennimûneyên girîng ji helbest û çîroka cîhanî dane wergêran.

5.3. Çeşnê wergeran

Di nav kitêbên wergêrayî de yek dikare çeşnên wek helbest, çîrok, roman, mîtos, ceribandin, deqên dînî, biyografî, bîranîn, û bi hejmarên kême jî be, lêkolînên warên zanistên komelayetîyên wek dîrok û antropolojî bibîne. Em li jêr wergeran di bin sê grûban de tesnîf dikin: i) helbest; ii) berhemên li ser esasê gêrraneweyewegotinê, anku wergerên edebî yên ne-helbestîwek çîrok, roman, biyografî, ceribandin, bîranîn hwd.; iii) wergerên ne-edebî, anku lêkolînêndîsîplînên cihê û ceribandinên li ser dîrok, siyaseta hwd.

Çeşnê kitêbên wergêrayî	Hejmara kitêbên çapbûyî
Helbest	39
deqên edebî yên vegotinê	140

deqên ne-edebî	39
Sercem	211

Tablo 2. Çeşnên kitêbên wergêrrayî

Diyar e ku deqên edebî, bi 179 berheman, bêendaze zêdetir in ji deqên ne-edebî. Deqên edebîyên ne-helbestî bi 140 berheman beşê herî mezin e û çîrok an jî novel (çîrokên dirêj) xwediyê para herî mezin e. Koleksiyoneke çîrokên Edgar Allan Poe bi wergera Samî Hezîl teşebusa herî dilêrane diyar e di vê barê de; herwiha çîrokên Çexov, Sadiq Hidayet, Samed Behrengî, Ezîz Nesîn çendek in ji çîroknivîsên wergêrrayî. Hejmara romanên jî pişkeke girîng e lê belê piraniya wan di şêwaza çîrokên dirêj de ne û romanên avaker ên edebiyata cîhanî bi tenê çendek in. Ji bilî Navê min sor e ya Orhan Pamukî, Bîreweriya Laşa Ehlam Mustegani, çend kitêbên Ernest Hemingway û Dostoyevskî ji wergerên romanên in.şano hêj jî warekî qels e, hejmara hemû deqên şanoyî ye.²⁸ Hejmareke antolojiyan jî tene ber çavan. Ceribandinên edebî qet nîne. Ceribandinên bişêwaza deqên dînî, bi taybetî nivîsarên Elîşerîetî û Mustafa Islamoglu tene ber çavan.

Rêjeya wergerên helbestî nisbet bi çeşnên dîtir pareke girîng e. Ji wan beşek deqên helbestîyên klasîk û dînî ne, beşeke nekêm ji soranî ne wek Ewdila Peşêw û Kejal Ehmed û beşeke girîng jî dîsa wergera helbestênşairên tirk e. Helbesta rojavayî qewî cihê xwe nedîtiye di wergera kurdî de, lê dîsa jî dîwanên T.S. Eliot, Ezra Pound, William Butler Yeats, ku biwergera Kawa Nemirî bûne kurdî, hewlên herî qewî diyar in di warê wergera helbestan de.

Heçî warê deqên ne-edebî ye, bi tenê 32 berhem hatine wergêran. Ji wan deh, wergera berhemên Abdullah Ocalanî ne. Dehên din jî kitêbên li ser dîroka Kurdistanê ne. Wergera lêkolînên akademîk bi çend nimûneyan ve sînordar e. Gava mirov berfirehiyameydana deqên ne-edebî, anku dîrok, civaknasî, siyaseta, û gelekşaxên din ên zanistênkomelayetî diine ber çavan, bêguman ev hejmar pir kêmtir e, bi taybetî di demekê de ku dehanlêkolînên li ser meseleyên kurdî ji nav weşanên weşanxaneyên kurdî lê bi zimanê tirkîderdîçin. Bêguman gelek layenên vê kêmiya wergera deqên lêkolînî hene, bi taybetî nebûna xwendevanên ku li bendê ne deqên lêkolînî bi kurdî bixwînin;

²⁸ Sînem Bedirxan diyar dike ku ew werger hêj nehatiye çapkirin; lê di berhema navborî de (Thomas1990) 1947 wekî sala çapê û Beyrûd wekî cihê çapê hatiye destnîşankirin.

herwiha, di gelek dîsîplînên zanistên komelayetî de zimanê kurdî bi awayekî ciddî nehatiye ceribandin û termînolojiyeke deqîq û tekmîl jê re durist nebûye. Berhemên heta niha hatî wergêran jî bêtir îstifadeyê ji zimanê rojnamevaniyê dikin. Tevî van sebebên, li pêşkêşasî û îhmalkariya di warê wergerên lêkolînên zanistên komelayetî de pirsyarek xwe dadisepîne: Gelo ev awayê pêşketina nivîs û wergera kurdî di heman demê de pesendkirina hewlên folklorîzasyonê nîne ku hêzên serdest û nehezên kurdî bi sedan salan e dixwazin pêk bînin? Lewre aşkera ye ku gava zimanek dinav çend qadên diyar de hate zêde û hepskirin, rê venabe ku ew ziman hemû potansiyela xwêderbîne û tîrê hemû layênên jiyana takekesê hevçax û bajarî û xwenda bike. Herwiha, têgihiştina ku kurdî bi tenê kêrê edebiyatê tê û zanistên nûjen pê nayêne derbirrîn tê bihêzkerin. Diyar e divêt ku weşanger, edîtor û wergêrên kurdî fikr û helwêstên xwe bînine jêr pirsyaran û helwêsta xwe ron bikin.

5.4. Zimanê berdest wek zimanê jêder bo wergêriya kurdî

Wergerên kurdî ji hejmareke zimanên cîhanê hatine kirin, wek tirkî, swêdî, inglîzî, farsî, danî û hwd. Tabloya li jêrê rêjeya wan zimanan a di warê wergera kurdî de nîşan dide:

Ziman	Hejmara berheman	Ziman	Hejmara berheman
tirkî	97	danî (danmarkî)	3
swêdî	24	elmanî	3
inglîzî	18	kirmanckî (zazakî)	1
soranî	18	ermenî	1
farisî	12	norwejî	1
fransî	9	swêdî-tirkî	8
erebî	9	tirkî-almanî	1

rûsî	4	tirkî-înglîzî	1
nediyar	1	sercem	211

Tablo 3. Zimanên ku berhem jê hatine wergêran

Wergerên kurdî bi giştî ji 11 ziman û ji 2 lehceyên kurdî hatine kirin. Deh berhem jî ji duzimanan pêkve hatine wergêran; lê belê, di piraniya wan wergerên ji du zimanan de zimanêslî yê wergerê tirkî ye û zimanê din bi tenê ji bo kontrol û tesdîqkirinê di prosesa wergerê decih girtiye. Bi vî rengî, hejmara wergerên ji tirkî digihe 107ê; yanî zêdetir ji nivê sercemê berheman ji tirkî hatine wergêran. Swêdî, wek zimanê welatê nû yê piraniya roşinbîrên kurdên li diasporayê, bûye çavkaniyeke adan ji bo wergera kurdî. Înglîzî digel ku yek ji wanzimanan e ku li ser Kurdan herî zêde berhem pê hatine nivîsandin û herwiha xwendiyê kulliyateke bêpayan a edebiyata cîhanî ye, bi tenê ji 18 berheman re bûye zimanê jêder êwergerê. Soranî bi taybetî di warê helbest û çîrokan de zimanekî girîng e bo wergera kurdî ku 18 berhem jê hatine wergêran. Dîsa farsî, frensî û erebî bi rêzê 12, 9 û 9 berheman, ziman inku reng dane nav wergera kurdî. Çar lêkolînên ji rûsî bi wergera Têmûrê Xelîl, girîngiyek daye zimanê rûsî di wergerên lêkolînê de. Herwiha ji danî, ermenî, kîrmanckî û norwêjî jî nimûne hatine.

Hejmara nisbeten bêhed bilind a wergerên ji tirkî pêdivî bi çendşîroveyan e. Li Tirkiyeyê xwînerekî asayî yê pirtûkên kurdî di heman demê de xwendewar [îng. literate; tr. okur-yazar] e di zimanê tirkî de jî. Hebûna kurdîxwînen ku nikarin bi tirkî bixwînin ne muhtemel e, û heke hebin jî awarteyî ne. Herwiha, ji ber ku piraniya xwendevanên kurdîxwîn heta astekê çûne xwendingehan, ku perwerde li xwendingehan bi tenê bi tirkî ye û dîsa ji ber ku piraniya wan xwendina zankoyê tewaw kiriye, reng e ji bo gelek ji wan xwendina bi tirkî ji ya kurdî pir hêsantir be. Di rewşeke wisa de pirsyar ev e: aya çima û bi çi handanekê berhemên bi tirkî tene wergêran bo kurdiyê, di demekê de ku xwendina wan berheman bi zimanê resen -tirkî-hêsantir û destxweştir e ji xwendevanan re?

Mentiqa wergêranê ya bingehî, berdestkirina berheman e bo wan kesên ku bi zimanê resen êwan berheman nizanin an jî nikarin pê bixwînin. Di cewher de, gelek rexne hene li ser esasêwergerê bi xwe, ji ber ku hîç wergerek nikare cihê deqa resen bigire; û ev yek di her halekê dekêmasiyeke esasî ye bo pratîka wergêranê. Gotineke latînî ya meşhûr heye di warê wergerê de ku dibêje traduttore

traditiore wate, wergêran xiyamet e. Herwiha, Berman (1995:42) dibêjêku « her wergerek ji tebîetê xwe, yanî ji ber ku werger e, biqisûr e ». Lê belê, nebûna rêyekedin ji bilî wergêranê rewaiyekê dide karê wergêranê. Heçî meseleya berhemên ku ji zimanê tirkî bo kurdî hatine wergêran e, ew rewşeke cuda nîşan dide: ew pêdivî û neçariya kurewayiyê dide karê wergerê nîne li meydana, lewre heman berhem bi tirkî, yanî bi zimanekî ku ji wan re destxweştir e, berdest in. Diyar e wergêr û weşanger ne li dûqetandina/çareser kirina kêmasî an jî pêwîstiyê xwendevanan in, belku li dû berterefkirinakêmasiyeke 13 zimanî bi xwe ne. Bêguman, di halê seferberiyê wisa de endîşeyên estetîk û karzanî nabin ewelîyetên (priority) wergêr û edîtoran, û ev yek bi xwe re hindêk netîceyên xerab diîne ku em dê li jêrî behsê lê bikin. Kêşeyê girîng ku ji vê rewşa behskirî derdihê, kêşeya wergêrana ji zimanê duyem e, yanî wergêrana wergerê an jî wergera wergerê ye.

5.5. Helwesta derbarê zimanê resen

Rexneya zimanî ya wergeran derveyî çepera vê gotarê ye; lê belê, me divê çend têbîniyanderbarê zimanê jêder ê wergeran û giraniya zimanê tirkî ya di sercemê berheman dederbibirin. Ji 211 berhemên destnîşankirî 36 ji zimanekî duyem hatine wergêran; bi gotinekêdin, wergêrana wergerê ne. Hêjayî gotinê ye ku qederê 28 lib ji wan ji tirkî hatine wergêranyên din ji swêdî û elmanî ne. Bo nimûne, berhemên nivîskarên rûs, îngilîz, elman û fars ên wekî Tolstoy, Dostoyevskî, Jack London, Bertolt Brecht, Nietzsche, Elîşerîetî, SamedBehrengî ji tirkî hatine wergêran. Wisa diyar e ku tirkî îro bûye dergehek ku tê re berhemên edebiyata cîhanê dikevine nav zimanê kurdî. Çunku, diyar e yek ji her çar kitêbên ku ji tirkî hatine wergêran bo kurdî, bi eslê xwe ne bi tirkî ne lê ji zimanekî din hatine wergêran bo tirkî û ji wê wergera li tirkî jî hatine wergêran bo kurdî. Rast e ku, weku weşanger li ser bergê piştê yê wan kitêban dinivîsin, « ziman û pirtûkxaneya kurdî bi wergera van berhemandewlemendtir » dibe; lê belê ev rewş di heman demê de îşaretê bi çend layenên hesas ên wergêriya kurdî jî dikin. Layenê yekem ew e ku hesasiyeteke giştî sebarek bi wergera jizimanê jêder nîne. Ji bilî weşanxaneyên wekî Bajar (nemaye), Lîs, û Avesta, weşanxane û edîtorên din xwediyê helwêsteke zelal nînin li dijî wergêrana wergeran. Ev yek bêgumanhevkat nîşana wê hindê ye ku meydana fireh a wergêriya kurdî durist nebûye ku tê de hebûna wergêrên xwedanê behreya

wergêrana ji zimanên cuda û cîyawaz rê bide danûstandinû munaqeseyên çawaniya wergeran. Layenê duyem, zimanê tirkî ne ji ber hîlbijartinawergêran a li ser esasê prensîbên zimanî û estetîk û rêkûpêkiya wergerên bi wî zimanî, belku ji ber ku tenya ziman e ku ew wergêr dikarin jê deqan wergêrin bûye dergehê edebiyatacîhanî. Serqise, bi tenê ji ber ku zimanê berdest e werger ji tirkî têne kirin. Bi vî awayî, wergera kurdî mecbûrî zimanê tirkî ye û ev yek lewane ye zerermend be ji ber ku di karêhunerî de ne mecbûriyet lê vîn û daxwaza navxweyî ya hunermendî ye ku nîrxê estetîk bilinddike. Herwiha, têgihiştineke wisa durist dibe weku zanîna zimanê tirkî bes e bo encamdana wergerê ji vî zimanî. Ev yek rê li ber wê hindê digire ku têgihiştineke kemilî û qabiliyeteke wergêr û wergêranê durist bibe di meydana wergêriya kurdî da. Layenê sêyem, ev hind wergerên ji zimanê duyem nîşana wê hindê ne ku wergera kurdî prêzeyeke erzan e bi wateya ku rêzlênegirtina prensîbên wergera çak rewşeke asayî ye.

Mirov dikare bipirse gelo bi wergêrana ji wergerê çi ji dest diçe? Heke me qebûl be kuwergêran ne tenê raguhastina peyv û hevokan e ji zimanekî bo zimanekî dîtir, belku di hemandemê de raguhastina cîhanbîniya [ing. worldwiev; tr. dünya görüşü] zimanekî ye ku di navawa û rehendên wî zimanî de ye, hingî divê bê teslîmkirin ku nivîskarek berhema xwe di nav çarçoweya îmkan û taybetiyên zimanê xwe de dinivîse; wate, nivîskar berhema xwe bi wê cîhanbîniyê dinivîse ku awa û rehendên wî zimanî jê re dabîn dikin. Taybetî û xweseriyên zimanan asteng in li ber wê hindê ku di navbera du zimanan de hevahengiyeke deqîq hebe ji bo têgihiştin û derberrîna rewşan. Gava wergêrek ji zimanekî deqekê werdigêre, pêşî hewldide cîhanbînî û derberrîna, ku temsîla tefsîra nivîskarî ya rewşê rûdanê ye, di nav çarçoweyazimanê resen de têbigihe û di serê xwe de ron bike; paşê êdî dest pê dike muadilekê di zimanê xwe de peyda bike, helbet vê carê bi îmkanên ku zimanê wî/wê rê didinê. Lewma, gava em deqekê ji zimanê duyem werdigêrin, êdî hîç karê me bi cîhanbînî û têgihiştina nivîskarî ya diçarçoweya zimanê xwe de namîne, ji ber ku êdî di zimanê duyem de, anku zimanê ku deq bohatiye wergêran, tefsîr û formûlasyoneke din û cuda wergirtiye. Bi gotineke din, aura ya xwe, çemka meşhûr a Walter Benjamin, ji dest daye. Diyar e xweşû nexweş, wergêr çend behredar be û wergêraneke çend kêrhatî jî be, her wergerek digel xwe hindek taybetî û layenên deqaresen jê kêr dike, ev yek di tebîetê wergerê de ye; herwiha, guhorîna cîhanbînî û tefsîra xweser a ku ziman pêşkêşî nivîskar û xwendevanan dike, serbixwe fakterên girîng in û delîlên wê hindê ne ku wergêrana wergerê rê li ber digire ku werger ji karîgerî û potansiyela xwe jidest bide.

5.6. Edebiyata Zarokan

Edebiyata zarokan di nav nirxandinên li jorê de cih negirt. Heke em serinceke pir kurt bidin ser wergêrana edebiyata zarokan em dibînin ku Swêd, diaspora, serkêşe di duristkirina kulliyateke berhemên edebiyata zarokan de. Bi taybetî weşanxaneyê Apecê, di encama kar û hewlên wergêrên wekî Mehmûd Lewendî, Amed Tîgrîs, Mûrad Ciwan, Seyîdxan Anter û redaksiyoneke profesyonel a desteyeke nivîskar û rewşenbîrên kurd, zêdetir ji 65 pirtûkên zarokan ên ji swêdî hatî wergêran çap kirine. Yek ji projeyên herî girîng û birêkûpêk ên wergera kurdî bêguman ev rêza pirtûkên zarokan a Apecê ye. Herwiha, weşanxaneyên wek Nûdem, Avesta û Weqfa Kurdî ya Kultûrî li Swêdê jî pirtûkên zarokan bi formateke kuxwendinê li pêşçavên zarokanşîrîn bike çap kirine. Ligel vê hindê, kêşeya giştî ya nexwendewariya zarokên kurdî bi zimanê dayikê nahêle ku kulliyata pirtûkên zarokan birêkûpêkî erkê xwe bi cih bîne.

6. Encam û nirxandin

Helsengandineke berteng a warê wergera di kurmanciyê de çend layenên serekî nîşanî medan. Me dît ku werara wergera kurdî heta dereceyeke bilind hevterîb bûye digel rewşa giştî yaroşinbîrî û weşana bi kurdî. Lewre destpêka ku bi handerên dînî û bi destê mîsyoneran bi rêketiye, digel hewl û xebatên derdora Hawarêşîkî roşinbîrî û zimanî digire; lê belê, çawaveguhastina tecrûbe û tradîsyonê di navbera van du qonaxên navborî de pêk nehatibe, tesîrahewlên qonaxa Hawarê jî heta salên 80yan zêde nahêne dîtin li Kurdistana Bakur û li Tirkîyeyê. Di wê qonaxa sêyem de, bi îmkân û têgihiştinên nûjen, rewta ku bal û hêza xwe dide ser wergerê di nav sê deheyan de, ji 12 zimanan, lê bi taybetî ji zimanê serdest ê li welatî, anku ji zimanê tirkî, bi hejmareke girîng kitêban werdigêre kurmanciyê û bi vî rengî tevkarîyê di wê hindê de dike ku dergehê edebiyat û nivîsevaniya cîhanî li kurmanciyê vebe. Lê belê, tehlîleke kurt nîşan da ku bizava wergerê di kurmanciyê de, di çarçoweya bêderfetî û bêpiştevaniya hukûmî û zanistî de li ser esaseke zêde-ne-qahîm bi rê ve çûye û diçe; lewre prensîbên wek girîngiya zimanê resen di wergêranê de û têgihiştineke esxerî ji prosesa wergêranê gelek caran nebûneşertên edîtor û weşangerên kurd. Bi vî rengî, bêyî ku bikevine nav helwêsteke qet'î û redker beramber wergera ji zimanekî duyem -lewre tê heye carinan encamên

rêkûpêk jê derbên- li me ron bû ku bendetiya wergera kurdî bi zimanê tirkî, di çarçoweyeke giştî de, bûye binasê hindêk kêşeyên bineretî û meydana. Herwiha, wek xulase, edebiyat û nivîsevaniya kurmançî divê êdî lê binêre ka bo çi hejmareke navên wergêrên kurd nîne ku bi karê xwe yê wergêriyê bêne pêş; ka çima wergêr, bi wateya kesê an kesa ku bişêwazekî pîşeyî xerîkî karê wergêranê ye, durist nabe di nav Kurmancên bakur de. Xuya yeku serbenek ji bo yek ji gelek bersivên muhtemel ên vê pirsê di ferqa di navbera 'wergêran' û 'werger'ê de ye, lewre nirxandinên me yê li jorî îşaretê bi vê yekê dikin ku di meydana wergera kurmançiyê de, xema bingehî ne kiryar û pêvajoya wergêranê ye, belku werger e, anku encam e xema û awat ne awa û çawaniya berhemên wergêrayî.

Têbînî:

- Gelek spas bo kak Remezan Alan û kak Bawer Ronahî ku nusxeyeke pêştir a vê gotarê xwendin û bitêbîniyên xwe pişkdar bûn di kêmkirina kêmasiyên nivîsarê de.
 - Li vir 'wergêran', prosesa veguhastina deqekê ye ji zimanekî bo zimanekî din, anku kiryar û mijûliya venivîsandina deqekê bi zimanekî din e. Heçî 'werger' e, ew netîceya kiryara wergêranê ye. Wergêran (*translating*) kiryar e û werger (*translation*) encam e.
 - Li vir qesta me bi tenê kitêbên wergêrayî ne; heke na sala 1925ê Încîlek bo kurdî tê wergêran lê belê ji ber ku wergereke birêkûpêk û têgihîştinbar nîne nahê çapkirin. Ji bo zanyariyên zêdetir bnr. Thomas (1990). Herwiha ihtimal e ku berî vê tarîxê wergerên bi kurdî çap bibin, lê halê heyî zanyariyên di destê me de van berhemên wekî nimûneyên pêşîn ên wergera kurdî didêrin.
 - Divêt diyar bikin ku di vê lêkolînê de em serincê nadin ser çawanî û rexneya wergeran; hêvîdar in lêkolînên dîtir ronkatiyê bixine ser wî layenê girîng. Herwiha, wergerên ku wekî kitêb bi kurmançiya bakur û li Kurdistanê bakur, Tirkîye û li Ewropa çapkirî mijara vê gotarê ne.
 - Bo nimûne beytên li xwarê nîşaneyê wê hizrê ne. Ji bo kurdiya wê brn. Xanî (2010 [1695]); ji bowergera wê ya îngilîzî, ku beytên li xwarê jê hatine wergirtin, bnr. Khani (2008 [1695]):6/19
- | | |
|--|--|
| <i>Çibkim ku qewî kesad e bazar</i> | <i>However the market is stagnant</i> |
| <i>Nînin ji qumaşî ra xerîdar</i> | <i>No one is buying our garment</i> |
| <i>6/35 Neqdê me mebeje kêmbuha ye</i> | <i>So do not say that our coinage has little value</i> |
| <i>Bêşikê şahê şahrewa ye</i> | <i>That's unminted by a king of kings</i> |
| <i>Ger dê bibuwa bi derbê menqûş</i> | <i>Had it been engraved when minted</i> |
| <i>Nedma wehe bêrewac û mexşûş</i> | <i>It would be in currency not counterfeit</i> |
| <i>Mehbûb e bi kes ne namizad e</i> | <i>Beloved indepted to no one</i> |
| <i>Lew bextesiyah û namurad e</i> | <i>So it is doomed and unfulfilled</i> |
- Ferhenga menzûm a kurdî-erebî-kurdî *Nûbehara Biçûkan* (1683) ya Ehmedê Xanî û rêzimana erebî ya bi raveyên kurdî bi navê *Tessrîf* ya Elî Teremaxî (sedsala XVIIê) delîlên vê hizrê ne.
 - Qanûn û sazkarîyên wekî *Tevhîd-î tadrîsat* (1924), *Rakirina xelîfetiye* (1924), *girtina medreseyan* (1924), *Qanûna Takrîr-i Sukûn* (1925) ku li pey *Serhildana Şêx Seîd* (1925) hatibû birêxistin û *Şark Islahat Planı* (1925) (*Pîlana Isleheta Rojhilatê*) ya nihênî, ji bilî muhtewa û karîgeriyên xwe yê din, detpêka yasayîbûna bêtehemuliya dewletê ne ji li hember zimanê kurdî.
 - Helbet, berî rabûna wê qedexeyê jî, di nav bergehê siyasî yê pir daxiraw de zimanê kurdî bi rêya weşanên deryasayî lê bi taybetî bi rêya radyoya Êrevanê qadeke giştî ya qismî bi dest xistibû.
 - Berî ku ev ders bi biryara rêveberên xwe ve bêne girtin, serûfîkaya dersan dabûne 1179 şagirtan, û gavahatine girtin, 1780 şagirtên nivîsî hebûn. (bnr. Akin 2007).

10. Dehqan (2009) sala çapkirina wê Incilê wekî 1965 dide, lê li ser nusxeya eslî ya kitêbê wek 1957 hatiye.
11. Ji bo nixandineke Încîla bi elifbêya ermenî ya bi kurdî, bnr. B. W. Stead, 'Kurdistan for Christ', *The Moslem World*, 10(3) (1920), r. 247. Herwiha bnr. K. J. Thomas, '[Translations of the Bible into]Kurdish', *Encyclopaedia Iranica IV* (1990), r. 214.
12. Sînem Bedirxan diyar dike ku ew werger hêj nehatiye çapkirin ; lê di berhema navborî de (Thomas1990) 1947 wekî sala çapê û Beyrûd wekî cihê çapê hatiye destnîşankirin.
13. Me ev têgeh ji gotara Remezan Alanî wergirtiye ku nivîskar bi vê têgehê ji bo meyla giştî ya di warê edebiyat û mijûliya zimanî ya kurdî de diîne û dibêje ku hesta mesûliyetê, ku hesta motor û karîger edi nivîskariya kurdî de, rêya derhatin û rabûna edebiyateke xwedanendî şeyên estetîkeke takekesî ûheqîqî dixitimîne. Bo lêkdaneke berfireh bnr. Alan (2009: 11-18).

Çavkanî

Alan R. 2009. Bendname. Stembol: Avesta.

American Bible Society. 1857. Injil Xode e me' Isa el Mesihe nevesandyn be deste Madteos Markos Luqas u Hanna. [The Gospel of our Lord Jesus Christ written by Matthew, Mark, Luke and John]. Stembol:

American Bible Society Pub. No. 685.American Bible Society. 1953. Incila Luqa [The Gospel of Luke]. Bêrûd: ABS Publication No. 677B.

American Bible Society. 1947. Metheloke'n Hezrete Sileman [The Proverbs of Solomon]. Bêrûd: ABS Publication No. 677p.B

ayazidi M. M. 1986. Tevarîxî qedîmî Kurdistan (Histoire ancienne du Kurdistan), Izdatel'stva Nauka, Glavnajaredaksija vostocnoj literatury. Moskova.

Berman A. 1995. Pour une critique des traductions: John Donne. Paris: Gallimard.

Benjamin W. 1923. The Task of Translator (wergêrana ji elmanî bo îngilîzî Harry Zohn, 1968). di nav de: Venuti L. (ed.) 2000. The Translation Studies Reader. London: Routledge, 75-85.

Dehqan M. 2009. A Kirmashani translation of the Gospel of John. *Journal of Eastern Christian Studies* 61(1-2):207-211.

Jakobson R. 1959. On Linguistic Aspects of Translation. di nav de: Venuti L. (ed.) 2000. The Translation Studies Reader. London: Routledge, 113-18.

Malmîsanij 2006. The Past and the Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey. [Kitêba înternetî berdest e bi îngilîzî]: <http://www.npage.org/IMG/pdf/Turkey.pdf> (30 Gulan 2010).

Oustinoff M. 2003. La Traduction. Paris: PUF [çapa sêyem a rastkirî 2009].

Perrin I. 2000. L'anglais: comment traduire ?. Paris: Hachette.

Peter L. 1857-1858. Forschungen uber die Kurden und die iranischen Nordchaldaer. St. Petersburg: Eggers.

Thomas K. J. 1990. [Translations of the Bible into] Kurdish, Encyclopaedia Iranica. cild IV: 214.

Xanî, Ehmed. 2010 [1695]. Mem û Zîn. (kurdî-tirkî, wergêran û tehlîla Kadri Yildirim) Istanbul: Avesta Yayınları.

Khani, Ahmed. 2008. Mem and Zin. Cihê çapkirinê û weşanxane nehatiye diyarkirin.

HINEK PRATÎK JI BO HÎNBÛNA KURDIYA DIMILÎ (ZAZAKÎ)

Hasan Aslan

DERSA 1

Ez - Ez

Ti - Tu

O - Ew (nêr) [No - Ev]

A - Ew (mê) [Na - Ev]

Ma - Em

Şima - Hûn

Ê - Ew [Nê - Ev]

Ez Hesên a: Ez Hesên im

Ti Hesên î: Tu Hesên î

Ti Zelal a: Tu Zelal î

O/No Hesên o: Ew/Ev Hesên e

A/Na Zelal a: Ew/Ev Zelal e

Ma kurd ê: Em kurd in

Şima kurd ê: Hûn kurd in

Ê/Nê kurd ê: Ew/Ev kurd in

Ez tirk nîya: Ez ne tirk im

Ti tirk nîyî: Tu ne tirk î (nêr)

Ti tirke nîya: Tu ne tirk î (mê)

O/No tirk nîyo: Ew ne tirk e

A/Na tirke nîya: Ew ne tirk e

Ma tirkî nîyê: Em ne tirk in

Şima tirkî nîyê: Hûn ne tirk in

Ê/Nê tirkî nîyê: Ew/Ev ne tirk in

DERSA 2

Mi(n) - Min

To - Te

Ey - Wî [Ney - Vî]

Aye - Wê [Naye - Vê]

Ci (Ey, Aye): Wî, Wê

Ma - Me

Şima - We

Înan - Wan [Nînan - Van]

*Hesenî - Hesenî/Hesen (çemandî, yanî peyvên nêr bi "-(y)î dibin çemandî)

*Zelale - Zelalê (di zazakî de peyvên mê nayên çemandin, "Zelale" hem çemandî hem neçemandî ye lê carinan ew herfa "-e"ya dawîya wê dikeve, ketina wê jî ne têkildarî çemandinê ye)

*merdiman - mirovan

Nameyê mi: Navê min

Birayê Hesenî: Birayê Hesenî

Lajê ci/ey: Lawê wî

Waya Zelale: Xweha Zelalê

Maya/Dayika mi: Diya/Dayika min

Keynaya ci/aye: Keça wê

Nameyê to çi yo?: Navê te çi ye?

Nameyê mi Hesen o: Navê min Hesen e

Nameyê mi Zelal a: Navê min Zelal e

(Wekî tê dîtîn, Hesen peyveke nêr e lewma dawîya hevokê dibe o; Zelale peyveke mê ye lewma dawî dibe a, û "e"ya dawiyê dikeve. Rêbaza rêzimanê ye: Gava kopula tê -e"ya dawiyê dikeve. Ji bo yên nû hîn dibin mimkun e mijareke zor be, lê hêvîdar im dê piştî demekê meseleya ketina "-e" hêsantir be.)

Ti kam î?: Tu kî yî?

Ez birayê Hesenî ya: Ez birayê Hesenî me

Hesen birayê min o: Hesen birayê min e

O Hesen o, no zî lajê ci yo: Ew Hesen e, ev jî lawê wî ye.

Ti kam a?: Tu kî yî?

Ez waya Zelal a: Ez xweha Zelalê me ["Ez waya Zelale ya" XELET E, "-e"ya dawiyê dikeve.]

Zelale waya min a: Zelal xweha min e

A Zelal a, na zî keynaya ci ya: Ew Zelal e, ev jî keça wê ye

DERSA 3

Kam: Kî

Kamî/Kê: Kê

Kamca: Kûder, Kîder (ca: cih, der)

Kotî, Ça: Kû

Kamcîn: Kîjan

Key: Kengî

Kua, Kwa, Ka, Kanî: Ka, Kanî

Çend, Çiqas: Çend, Çiqas

Çi: Çi

Çira, Çirê: Çira, Çire, Çima

Çi wext: Çi wext

Senî, Senîn: Çawa, Çawan

DERSA 4

Di pratîka yekem de me qertafên kesî nivîsandibûn, niha jî wekî şablonekê dubare dîkin, piştî de mijareke dî bi nimûneyekê binivîsin:

Ez ... (y)a: Ez ... im / me

Ti ... (y)î: Tu ... (y)î [nêr]

Ti ... (y)a: Tu ... (y)î [mê]

O ... (y)o: Ew ... (y)e [nêr]

A ... (y)a: Ew ... (y)e [mê]

Ma ... (y)ê: Em ... in / ne

Şima ... (y)ê: Hûn ... in / ne

Ê ... (y)ê: Ew ... in / ne

Ez ... nîya: Ez ne ... im / me

Ti ... nîyî: Tu ne ... (y)î [nêr]

Ti ... nîya: Tu ne ... (y)î [mê]

O ... nîyo: Ew ne ... (y)e [nêr]

A ... nîya: Ew ne ... (y)e [mê]

Ma ... nîyê: Em ne ... in / ne

Şima ... nîyê: Hûn ne ... in / ne

Ê ... nîyê: Ew ne ... in / ne

O wendekar o: Ew xwendekar e

A wendekar a: Ew xwendekar e

O mamosta yo: Ew mamoste ye

A mamosta ya: Ew mamoste ye

O wendekar nîyo: Ew ne xwendekar e

A wendekare nîya: Ew ne xwendekar e

O mamosta nîyo: Ew ne mamoste ye

A mamosta nîya: Ew ne mamoste ye

Wekî ji nimûneyê dixuye gava me ji bo mê got "Ew ne xwendekar e", di dawîya "wendekar" de "-e"yek zêde bû, "A wendekare nîya". (Di dimilî de zayend gelek girîng e, li her derê tesîra wê tê dîtin lewma em dê jî li her derê li ser zayendê binivîsin.) Çawa ku di dimilî de ji bo "Ew" hem "O" hem "A" heye ji ber zayendê, eynî wisa di hin navdêran de û di hemî rengdêran de jî formên nêr û mê hene. Navdêrên ku formên wan ên nêr û mê ji hev cihê ne wekî nimûneya "wendekar" bi pirranî navên zindîyan in. Wekî di helbet di zazakî de jî wekî kurmançî zayenda pirraniya peyvan yan nêr e yan mê ye (nimûne: nan (nêr), qeleme (mê)).

Em binêrin bê çawa formên mê fêm bikin:

1- Eger di dawîya forma nêr de herfeke bêdeng hebe, di forma mê de "-e"yek dê li dawiyê zêde be:

wendekar> forma nêr

wendekare> forma mê

baş> forma nêr

başê> forma mê

2- Eger di dawîya forma nêr de herfa "a" û herfa "î" hebe forma mê jî eynî ye, naguhere. Lewma, di nimûneya "A mamosta nîya" de peyva "mamosta" wekî xwe ma. Li jêr nimûne ji bo peyvên dawîya wan "a" ye:

Hosta> hem nêr hem mê ye

Hera* (:fireh)> hem nêr e hem mê ye

*Ji bo "hera" forma "hîra" jî heye.

3- Eger di dawîya forma nêr de herfa "e" hebe, di forma mê de ew herfa "e" dibe "î" (yan jî "ê", lê em dê "î"yê nîşan bidin.)

Ev bi pirranî di rengdêran de çêdibe:

newe (:nû)> forma nêr

newî> forma mê

werde (:xwarî)> forma nêr [nimûne; nano werde: nanê xwarî]

werdî> forma mê [nimûne; şamîya werdî: şîva xwarî]

Di dawiyê de, çima di nimûneya "A wendekar a" de ji bo mê "wendekar" e lê ne "wendekare" ye.

Bersiva vê pirsê jî di pratîka duyem de ye ku me gotibû: Eger kopula bê "-e" ji dawiyê dikeve. Ji bo behtir bê fêmkirin çend nimûneyên dî binivîsin:

- A keynek a: Ew keçik e (Eger em binêrin li ferhengê dibînin ku keçik wekî "keyneke" hatiye nivîsandin lê li vir ji ber qaydeya jorîn "-e" dikeve.

- A baş a: Ew baş e (rengdêra baş eger mê be dibe "başê" lê li vir ji ber qaydeya jorîn e ket)

Ev hemî qayde ji bo "ti"ya mê jî hene, anku:

Ti baş a: Tu baş î

Ti başê nîya: Tu ne baş î

Ti wendekar a: Tu xwendekar î

Ti wendekare nîya: Tu ne xwendekar î

DERSA 5

Bila mijara me ya vê carê hejmarên kurdî bin, em dê vê carê hejmarên kurdî bi her sê zaravayan (dimilî, kurmancî û soranî) bibînin:

Hûmarî-Jimarekan-Hejmar

1. Hûmarê Tamî-Jimare Tewawekan-Hejmarên Tam

	Kirmanckî	Soranî	Kurmancî
1	yew	yek	yek
2	di/didi	dû	du/dudu
3	hîrê	sê	sê
4	çar, çehar	çîwar	çar
5	panc	pênc	pênc
6	şeş	şeş	şeş
7	hewt	hewt	heft
8	heşt	heşt	heşt

9	new	no	neh
10	des	de	deh
11	yewendes	yazde	yanzdeh
12	diwês	diwazde	diwanzdeh
13	hîrês	siyazde	sêzdeh
14	çarês	çiwarde	çardeh
15	pancês	pazde	panzdeh
16	şîyês	şazde	şanzdeh
17	hewtês	hevde	hevdeh
18	heştês	hejde	hejdeh
19	newês	nozde	nozdeh
20	vîst	bîst	bîst
21	vîst û yew	bîst û yek	bîst û yek
22	vîst û didi	bîst û dû	bîst û dudu

23	vîst û hîrê	bîst û sê	bîst û sê
30	hîris	sî	sî
31	hîris û yew	sî û yek	sî û yek
32	hîris û didi	sî û dû	sî û dudu
33	hîris û hîrê	sî û sê	sî û sê
40	çewres	çil	çil
50	pancas	penca	pêncî
60	şeştî	şest	şêst
70	hewtay	hefta	heftê
80	heştay	heşta	heştê
90	neway	newed	nod
100	se	sed	sed
101	se û yew	sed û yek	sed û yek
102	se û didi	sed û dû	sed û dudu

103	se û hîrê	sed û sê	sed û sê
110	se û des	sed û de	sed û deh
120	se û vîst	sed û bîst	sed û bîst
121	se û vîst û yew	sed û bîst û yek	sed û bîst û yek
130	se û hîris	sed û sî	sed û sî
200	di sey	dû sed	du sed
300	hîrê sey	sê sed	sê sed
1000	hezar	hezar	hezar
2000	di hezarî	dû hezar	du hezar
100.000	se hezar	sed hezar	sed hezar
1.000.000	milyonêk	milyonêk	milyonek
2.000.000	di milyonî	dû milyon	du milyon

2. Hûmarê Rêzkî-Jimarekanî Pileyî-Hejmarên Rêzîn

	Kirmanckî	Soranî	Kurmancî
1.	yewin	yekem	yekem
2.	diyin/didin	duwem	duyem
3.	hîrêyin	sêyem	sêyem
4.	çarîn, çeharîn	çiwarem	çarem
5.	pancin	pêncem	pêncem
6.	şeşin	şeşem	şeşem
7.	hewtin	hewtem	heftem
8.	heştin	heştêm	heştêm
9.	newin	noyem	nehem
10.	desin	deyem	dehem
11.	yewendesin	yazdeyem	yanzdehem
12.	diwêsin	diwazdeyem	diwanzdehem
13.	hîrêsin	siyazdeyem	sêzdehem

14.	çarêsin	çîwardeyem	çardehem
15.	pancêsin	pazdeyem	panzdehem
16.	şîyêsin	şazdeyem	şanzdehem
17.	hewtêsin	hevdeyem	hevdehem
18.	heştêsin	hejdeyem	hejdehem
19.	newêsin	nozdeyem	nozdehem
20.	vîstin	bîstem	bîstem
21.	vîst û yewin	bîst û yekem	bîst û yekem
22.	vîst û didin	bîst û duwem	bîst û duyem
30.	hîrisin	sîyem	sihem
31.	hîris û yewin	sî û yekem	sî û yekem
32.	hîris û didin	sî û duwem	sî û duyem
40.	çewresin	çîlem	çîlem
50.	pancasin	pencayem	pênciyem

60.	şestîyin	şestem	şêstem
70.	hewtayin	heftayem	heftêyem
80.	heştayin	heştayem	heştêyem
90.	newayin	newedem	notem
100.	seyin	sedem	sedem
1000.	hezarin	hezarem	hezarem

DERSA 6

Yekhejmariya Nediya

Di dimilî de yekhejmariya nediya bi çend awayan çêdibe.

1-) Awayê Yekem

Yew ...:

Yew camêrd: Camêrek (çemandî: yew camêrdî)

Yew cinî: Jinek (çemandî: wekî me berê gotibû, peyvên mê nayên çemandin)

Yew dest: Destek (çemandî: yew destî)

Yew qeleme: Qelemek (çemandî: peyvên mê nayên çemandin)

Yew destê mi: Destekî min

Yew qelema mi: Qelemeke min

2-) Awayê Duyem

-êk:

Camêrdêk: Camêrek (çemandî: camêrdêk)

Cinîyêk: Jinek

Destêk: Destek (çemandî: destêk)

Qelemêk: Qelemek

Destêkê mi: Destekî min

Qelemêka mi: Qelemeke min

Wekî tê dîtîn, di vî awayî de çemandî û neçemandî wek hev in, bi gotineke dî nayên çemandin.

3-) Awayê Sêyem

-ê: texmînen ev û awayê yekem bi hev re awayên herî zêde tên gotin in.

Camêrdê: Camêrek

Cinîyê: Jinek

Destê: Destek

Qelemê: Qelemek

Di vî awayî de gava îzafe (tamlama) çêdibe herfeke "d" lê zêde dibe:

Camêrdêdo baş: Camêrekî baş

Cinîyêda başe: Jineke baş

Destêdo gird: Destekî mezin

Qelemêda girde: Qelemeke mezin

Destêdê mi/Hesenî: Destekî min/Hesenî

Qelemêda mi/Hesenî: Qelemeke min/Hesenî

Di vî awayî de jî çemandin tine ye.

Hêjayî gotinê ye, li hin herêman forma "-ên" jî heye ku teqez forma "-ê" ji vê formê tê, ketina "-n" normal e. Tenê nimûneyeke ji bo wê dinivîsim: Camêrdên:Camêrek; Camêrdêdo baş: Camêrekî baş

DERSA 7

Rengdêr (1) - Pileya Sade

Di dimilî de rengdêr di pileya sade de, li gorî zayend û hejmara navdêrê xwe diguherin. Nimûne:

- baş: baş

merdimî baş: merivê baş

merdima başe: meriva baş

merdimê başî: merivên baş

Wekî tê dîtin, eger navdêr nêr be rengdêr jî di forma nêr de ye (me di pratîka 4em de behsa formên rengdêran kiribû ku çawa dibin nêr û mê), eger navdêr mê be rengdêr jî di forma mê de ye û eger navdêr pirrhejmar be rengdêr jî pirrhejmar e.

Ji ber ku me berê behsa pirrhejmariya navdêran nekiribû, li vir hinekî jê behs bikin: Navdêr di rewşa neçemandî de bi qertafa -(y)î dibin pirrhejmar: destî, qelemî, lingî, hevalî/embazî, birayî... Di rewşa çemandî de jî wekî kurmancî bi qertafa -(y)an dibin pirrhejmar: destan, qeleman, lingan, hevalan/embazan... Eynî bi vî awayî rengdêr jî bi qertafa -(y)î dibin pirrhejmar: başî, rindî, weşî, ciwanî... Çemandî: başan, rindan, weşan, ciwanan...

Eger ew nimûneyên jorîn di rewşa çemandî de bin, wê demê wiha dibin:

merdimê başî: merivê baş

merdima başe: meriva baş (wekî me di pratîka 2em de gotibû peyvên mê nayên çemandin)

merdimanê başan: merivên baş

Eger li şûna rengdêra "baş" rengdêreke dî hebûya, bo nimûne, rengdêra "newe (nû)" hebûya wê demê nimûne dê wiha bin:

embazo/hevalo newe: hevalê nû

embaza/hevala newî: hevala nû (çima newe bû newî, bersiv di pratîka 4em de ye)

embazê/hevalê neweyî: hevalên nû (me gotibû bi qertafa -(y)î dibin pirrhejmar)

Eger di rewşa çemandî de bin:

embazê/hevalê neweyî: hevalê nû

embaza/hevala newî: hevala nû

embazanê/hevalanê neweyan: hevalên nû

www.arşîvêkurdî.org

DERSA 8

Rengdêr (2) - Pileya Berhevdanê

Di pileya berhevdanê de bi giştî du awa hene, ew her du di kurmançî de jî hene. Paşgira "-êrî" (di kurmançî de wekî "-tir") û "hîna" (di kurmançî de wekî "hîn, hîna").

1-) -êrî

Karê mi karanê to ra vêşêrî yê: Karên min ji karên te zêdetir in. (vêşî: zêde)

Ez to ra pîlêrî/girdêrî ya: Ez ji te mezintir im. (pîl, gird: mezin; pîl bi pirranî ji bo berhevdana temenî tê gotin)

Divê bê gotin, li şûna "- êrî", "-êr" jî tê gotin.

2-) hîna

No ey ra hîna weş o: Ev ji wî hîn(a) xweş(tir) e.

Embazê mi embazanê to ra hîna baş ê: Hevalên min ji hevalên te hîn(a) baş(tir) in.

DERSA 9

Rengdêr (3) - Pileya Raserî

Di dimilî de pileya raserî bi vî awayî tê çêkirin: "tewr + rengdêr":

Birayo tewr pîl: Birayê herî mezin, Mezintirîn bira

Qelesa tewr newî: Qelesa herî nû, Nûtirîn qelesa

Embazê/Hevalê tewr baş: Hevalên herî baş, Baştirîn heval

Eger çemandî bin:

Birayê tewr pîl

Qelesa tewr newî

Embazanê/Hevalanê tewr başan

DERSA 10

LÊKER (1) - DEMA NIHA

Di dema niha de dimilî hinekî ji kurmancî cihê ye. Di kurmancî de ji bo çêkirina dema niha "di-" dikeve pêşîya rehê dema niha û qertafa kesî, lê di dimilî de "-(e)n-" dikeve navbera wan: di-XWAZ-im: WAZ-en-a; di-K-im: KE-n-a; di-D-im: DA-n-a

Piştî formula çêkirina dema niha, em dê bibînin ka çawa ji lêkeran rehên wan yên dema niha fêm bikin. Ji bo her komeke lêkeran em dê pratîkekê binivîsin.

Lêkerên transîtîf (gerguhêz) ên ku bi "-rd-ene" bi dawî dibin:

Di vê koma lêkeran de ji bo derxistina rehê dema niha divê ji dawiyê "-rd-ene" biavêjin. Nimûne:

ke-rd-ene: kirin > Ez kar ke-n-a: Ez kar dikim

we-rd-ene: xwarin > Ti nan we-n-î/a: Tu nan dixwî (/a ji bo jinan, me di pratîkên berê de behsa qertafên kesî kiribû)

be-rd-ene: birin > Ma to be-n-ê keye: Em te dibin malê

weta-rd-ene: wêrîn > O weta-n-o / A weta-n-a: Ew diwêre

Neyînîyên (negatîfên) nimûneyan:

Ez kar nê-kena: Ez kar nakim

Ti nan nê-wenî/a: Tu nan naxwî

Ma to nê-benê keye: Em te nabin malê

O nê-wetano / A nêwetana: Ew newêre

Wekî tê dîtîn, di dimilî de ji bo neyînîkirinê "nê-" dikeve pêşîyê û berevajî kurmancî "-(e)n-" (di kurmancî de "di-") ji formulê dernakeve

DERSA 11

LÊKER (2) - DEMA NIHA

Di pratîka berê de me formula çêkirina dema niha dabû û ji bo komeke lêkeran rehê wan ê dema niha nivîsîbû, niha jî komeke dî pêşkêşî we dikin

Lêkerên întansîtîf (negerguhêz) ên ku bi "-ya-yene" bi dawî dibin:

Ev koma lêkeran belkî koma herî zêde tê dîtin e. Di vê koma lêkeran de rehê dema niha bi avêtina "-ya-yene" çêdibe.

xebitî-ya-yene: xebitîn > Ez xebitî-yen-a: Ez dixebitim

şikî-ya-yene: şikiyan/şikestin > Şûşeyê awe şikî-yen-o: Şûşeya avê dişkê

lerizî-ya-yene: lerizîn > Destê mi lerizî-yen-ê: Destên min dilerizin

Ji bo vê koma lêkeran hinek awarte jî hene:

ame-ya-yene: hatin > Ez ye-n-a: Ez dihêm/têm

şî-ya-yene: çûn/çûyîn > Ti şî-n-a: Tu diçî (ti: mê ye)

bî-ya-yene: bûn/bûyîn > O be-n-o: Ew dibe (o: nêr e)

Lêbelê, meselen lêkera a-bîyayene: ve-bûn jî heye ku ev ne awarte ye, yenî wek "abî-yen-" çêdibe (Ber abî-yen-o: Derî vedibe/divebe), lewma ez dibêm teqez ewên jorîn awarte ne.

Wekî dî, di dimilî de awarte carinan gelek mimkun dibin, lewma ligel qaydeyên giştî divê em awarteyan jî bizanin.

DERSA 12

LÊKER (3) - DEMA NIHA

Dîtina rehên dema niha berdewam e. Niha jî lêkerên transîtîf (gerguhêz) ên ku dawîya wan "-na-yene" ye. Di vê koma lêkeran de ji bo dîtina rehê dema niha "a-yene" ji "-na-yene" diavêjin. Piştî çêkirina dema niha bi vê formulê dibe: rehê dema niha + en + qertafa kesî, her wekî nimûneyên jêrîn:

xebit-na-yene: xebitandin > Ez xebitn-en-a: Ez dixebitînim

şik-na-yene: şikandin > Ti şikn-en-î/a: Tu dişkênî

vur-na-yene: guherandin > Ma vurn-en-ê: Em diguherînin

Hinek lêker jî hene bi - nayene bi dawî dibin lê ev ji wan lêkerên jorîn cihê ne. Di van lêkeran de li pêşîya -nayene pêşgîrek heye, wek ro-, a- û hwd. Anku ne wek lêkerên jorîn in, ev lêkerên hevedudanî ne û li gorî -nayene tên kişandin. Wek mînak, ro-nayene: danîn > Ez kitabê xo ronana (ro-na-n-a) maseyî ser: Ez kitêba xwe datînim ser maseyê. Wekî tê dîtin eger li gorî rêbaza jorîn bûya divê "ron-en-" bûya lê bûye "ro-na-n-"

DERSA 13

LÊKER (4) - DEMA NIHA

Dîtina rehê dema niha ji bo koma lêkerên ku dawîya wan "-a-yene" ye.

Di vê koma lêkeran de ji dawîya lêkerê "-a-yene" bê avêtin rehê dema niha dimîne. Nimûne:

1. ters-a-yene: tirsîn/tirsiyan > Ez ters-en-a: Ez ditirsim
2. as-a-yene: xuyîn/xuya kirin > O as-en-o: Ew dixuye
3. zan-a-yene: zanîn > Ti zan-en-î/a: Tu dizanî (Ti zanî/a: Tu zanî)
4. perr-a-yene: firrîn > Ê perr-en-ê: Ew difirrin
5. çîn-a-yene: çînîn > Ma çîn-en-ê: Em diçinin
6. lerz-a-yene: lerizîn > Şima lerz-en-ê: Hun dilerizin
7. var-a-yene: barîn > Varan var-en-o: Baran dibare
8. rem-a-yene: revîn/reviyan > Ê rem-en-ê: Ew direvin
9. ş-a-yene: şîyan/karîn > Ez ş-en-a: Ez dişêm

Di vê koma lêkeran de awarteyeke navdar heye ku divê bê gotin, lêkera "dayene: dan/dayîn". Rehê vê lêkerê yê dema niha ji rêbaza jorîn cihê ye, ji bo dîtina rehî tenê "-yene" tê avêtin

dayene: dayîn > Ez da-n-a: Ez didim, Ti da-n-î/a: Tu didî...

DERSA 14

LÊKER (5) - DEMA NIHA

Dîtina rehê dema niha ji bo lêkerên ku dawîya wan "-it-ene" ye.

Ji bo dîtina rehê dema niha ji dawîya lêkerê "-it-ene" tê avêtin.

paw-it-ene: pan > Ez paw-en-a: Ez dipê

ram-it-ene: ajotin > O ram-en-o/ A ram-en-a: Ew diajo

kar-it-ene: çandin > Ma kar-en-ê: Em diçin

tir-it-ene: dizîn > Ê tir-en-ê: Ew didizin

Di vê koma lêkeran de hinek lêker hene li hin herêman ew "-it-ene" ya wan dikare bi "-a-yene" cihê hev biguherînin, me ew jî di pratîkeke de dabûn: çînitene=çînayene, cenitene: cenayene, zanitene: zanayene. Lêbelê ji van lêkeran zêdetir awayên duyem tên gotin û nivîsîn. Baştir e hûn jî yê duyem bizanin

Ji bo vê koma lêkeran awarte jî hene, awarte bi pirranî ew lêker in ku du awayên wan hene û li gorî awayên wan ên duyem tên kişandin û bi rêbaza jorîn rast nabin. Ev gelekî kêr in:

nim-it-ene: nixamtin / nim-na-yene: niximandin > Ez nimn-en-a: Ez diniximînim

Dê bidome.

Cihê lêkera alîkar ya dema bê di hevokê de

Lêkera alîkar bo avakirina dema bê anku futûrê di kurmancî de li gor devokan dikare bi yek ji van awayan be:

- **ê**: bo nimûne: "tu ê bikevî".
- **dê**: "tu dê bikevî"
- **wê**: "tu wê bikevî"
- **yê**: "tu yê bikevî"

Ji van forma "ê" di hemû devokên kurmancî de tê bikaranîn. Lê li gel wê, li gor devokan "dê, wê, yê" jî hene.

Di kurmanciya rojhilatî de forma "dê" (carinan "tê") li gel awayê "ê" li kar e. Di kurmanciya navendî de bi forma "ê" re herwiha şiklê "wê" tê xebitandin. Di kurmanciya rojavayî de forma serdest dîsa "ê" ye lê li gel peyvên bi vokalan bi dawî tên forma "yê" dikare were emilandin:

- "tu ê bikevî" yan "tu yê bikevî" lê tenê "ez ê bikevim" û ne "ez yê bikevim" ji ber ku "ez" ne bi vokalekê lê bi konsonantekê bi dawî tê û bikare "yê" bigire pey xwe.

Ji van hevokên sade diyar dibe ku lêkera alîkar ya dema bê (ê, dê, wê, yê) dikeve pey bikerê (kirdeyê, fail, subjekt) û berî lêkera (kar, fi'l, verb) serekî. Loma:

- "tu ê bikevî" rast e lê ne "ê tu bikevî", ne "tu bikevî ê", "tu bikevî ê" yan "ê tu bikevî".

Lê gelo di hevokên dirêjtir û xwedî zêdetir endamên hevokê de mesele çawa ye? Bo nimûne, eger em berkarên yekser û neyekser û herwiha temamker di hevokê de hebin, dê cihê lêkera alîkar ya dema bê (ê, dê, wê, yê) li kû be? Gelo cihê wê herdem sabit e yan jî mimkin e ku biguhere?

Kerem bikin em dîsa ji hevokê sade dest pê bikin û gav bi gav wê hevokê berfireh bikin:

- tu ê bibî.

Di vê hevoka bi biker (tu) û bi lêkereke serekî (bibî) de lêkera alîkar (ê) dîsa dikeve piştî bikerê û berî lêkera serekî.

Ka em niha jî berkareke yekser (objekteke dîrekt) lê zêde bikin:

- tu ê avê bibî.

Li vê derê berkar (avê) ketiye navbera biker (tu) û lêkera serekî (bibî). Lêkera alîkar (ê) li pey bikerê û berî berkarê (avê) û lêkera serekî (bibî) tê.

Em dikarin berkareke neyekser (objekteke indîrekt) jî lê zêde bikin:

- tu ê avê bibî malê.

Li vê derê berkareke neyekser "malê" li hevokê zêde de bûye lê cihê lêkera alîkar "ê" dîsa eynî ye anku li pey bikerê û berî hemû endamên din yê hevokê ye.

Mirov dikare berkara neyekser "malê" bi komikeke daçekî (li malê) veguhêze:

- tu ê li malê avê vexwî.

Cihê hin endamên din hatiye veguhastin lê cihê lêkera alîkar "ê" her li pey bikerê (tu) û berî hemû endamên din yê hevokê ye.

Mirov dikare hokerekê (zerf, adverb) jî li hevokê zêde bike:

- tu ê li malê têr avê vexwî.

Dîsa hokera "têr" jî nikariye tesîrê li cihê lêkera alîkar "ê" bike û wê raguhêze cihekî din.

Tek peyva ku carinan dikeve navbera bikerê û lêkera alîkar ya dema bê, hokera "jî" ye:

- tu jî dê li malê têr avê vexwî.

Heta ev keliştina navbera bikerê û lêkera alîkar jî tenê di kurmanciya rojhilatî serdest e. Di kurmanciya navendî û rojavayî de hokera "jî" adeten dikeve pey lêkera alîkar, ne berî wê:

- "tu ê jî li malê...", kêmtir "tu jî ê li malê..."

Wek ku tê dîtin, di hemû rewşan de mimkin e ku lêkera alîkar yekser li pey bikerê be.

Gelo lêkera alîkar ya dema bê herdem li pey bikerê tê?

Carinan lêkera alîkar ya dema bê berî bikerê jî tê:

- Ma heke li kursiya meclisê parlementerek biaxeve, **dê qiyamet** rabe?²⁹

Li vê derê "dê" lêkera alîkar û "qiyamet" jî biker e. Ev pêşxistina lêkera alîkar bi taybetî di hevokên pirsyarkî de mimkin e:

- Ma ... dê qiyamet rabe?

Lê di hevokên sade yên ragihandinê de wisa mimkin naxuye eger biker cînav be:

- *dê ew rabe. (ew dê rabe.)

Hin caran mirov dibîne ku lêkera alîkar ji bikerê tê dûrkerin. Kerem bikin li van hevokan binêrin:

- Ew li malê dê avê vexwe.
- Ew li malê dê têr avê vexwe.
- Ew li malê avê dê vexwe.

Lê ev hemû awa kêmtên bikaranîn û bi ihtimaleke mezin şaş in jî.

²⁹ http://www.amude.net/Nivisar_Kurdi_deep.php?newsLanguage=Kurdi&newsId=6972

HEJMAR Û HEJMARSAZÎ (beşa 2)³⁰

1. HEJMARÊN RÊZÎ

Mebest ji hejmarên rêzî (bi inglîzî *ordinal number*) ew formên navên hejmaran in ku di rêzkirina, dorkirina an sirakirina hejmaran de tê bikaranîn. Bo nimûne:

- ew di pêşbirkê de bû *duyem* / *duyemîn*
- sala *çaran* / *çara* / *çarê* ye ku ez li vî karî me
- newroz *bîst û yekî* adarê ye

Wek ku ji nimûneyên li jor diyar dibe, di kurmancî de hejmarên rêzî bi çendîn paşgirên ji hev cuda dikarin bên çêkirin:

- **-(y)em**: yek-em, du-y-em, sê-y-em, deh-em, sed-em, hezar-em...
- **-(y)emîn**: yek-emîn, du-y-emîn, sê-y-emîn, deh-emîn, sed-emîn, hezar-emîn...
- **-(y)an**: du-y-an sê-y-an, deh-an, sed-an, hezar-an...
- **-(y)a**: du-y-a sê-y-a, deh-a, sed-a, hezar-a...
- **-(y)ê**: yek-ê, du-y-ê, sê-y-ê, deh-ê, sed-ê, hezar-ê...
- **-(y)î**: yek-î, du-y-î, sê-y-î, deh-î...

Niha jî em yek bi yek van bidin nasîn: bergeh û deverên bikaranîna wan û herwiha dîrok û etîmolojiya wan.

1.1. Bi paşgira **-em**

Bikaranîn û varyantên wê

³⁰ Bo beşa 1, binêrin Kovara Kanîzar, hejmar 8: <https://zimannas.wordpress.com/2016/09/27/kovara-kanizar-hejma-8/>

Çêkirina hejmarên rêzî bi paşgira **"-em"** di kurmanciya nivîskî de niha berbelav e. **"-em"** herwiha paşgireke giştî ya sazkirina hejmarên rêzî ye: wek prensîp her hejmara bingehîn dikare bi alîkariya wê bibe hejmareke rêzî.

Bo nimûne:

Hejmarên bingehîn	Hejmarên rêzî
yek	yekem
çar	çarem
pênc	pêncem
deh	dehem
bîst	bîstem
sed	sedem
hezar	hezarem
milyon	milyonem

Eger hejmara bingehîn bi vokalekê bi dawî were, hingê li cihê **"-em"**, forma **"-yem"** li gel hejmarên **"du, sê"** dikare were bikaranîn:

- du > duyem
- sê > sêyem

Li şûna **"-yem"**, li gel hejmarên **"du, sê"** herwiha forma **"-hem"** jî mimkin e:

- du > duhem
- sê > sêhem

Li gel hejmarên 11 – 19 yên bi **"-de(h)"** bi dawî dibin, bi piranî paşgira **"-hem"** tê xebitandin:

- yazde(h) > yazdehem
- diwazde(h) > diwazdehem

- sêzde(h) > sêzdehem
- çarde(h) > çardehem
- pazde(h) > pazdehem
- şazde(h) > şazdehem
- hevde(h) > hevdehem
- hejde(h) > hejdehem
- nozde(h) > nozdehem

Lê kê mî caran ew dikarin bi paşgira ”-yem” jî bin:

- yazde > yazdeyem
- diwazde > diwazdeyem
- sêzde > sêzdeyem
- çarde > çardeem
- pazde > pazdeyem
- şazde > şazdeyem
- hevde > hevdeyem
- hejde > hejdeyem
- nozde > nozdeyem

Forma ”-wem” carinan bo sazkirina hejmara rêzî ji hejmara ”du” tê bikaranîn:

- du > duwem (yan ”diwem”)

Dehhejmarên rêzîkî 30 – 90 di kurdî de ti formeke standard baş wernegirtiye (bi taybetî dehhejmarên bi vokalan bi dawî dibin anku 30, 50, 70 û 80) lê bi alîkariya paşgira ”-em” û varyantên wê ew wiha tên an dikarin bên bikaranîn:

- bîst > bîstem
- sî > siyem, sîhem
- çil > çilem
- pêncî > pênciyem, pêncîhem
- şêst > şêstem
- heftê > heftêyem
- heştê > heştêyem

- not > notem

Eger hejmara bingehîn bi xwe ji navê çend hejmaran pêk hatibe, paşgira "-em" û varyantên tenê dikevin dawîya hemû hejmarê, ne dawîya her hejmara sade:

- bîst û yek > bîst û yekem (ne "*bîstem û yekem")
- sed û çil û şeş > sed û çil û şeşem (ne "*sedem û çilem û şeşem")
- dused > dusedem (ne "*duyemsedem")
- sêsed hezar > sêsed hezare (ne "*sêsedem hezare")

Peyvrêziya hejmarên rêzî yên bi paşgira "-em"

Hejmarên bi paşgira "-em" yan jî varyanteke wê saz kirî di bingeh de rengdêr in:

- kesa yekem – bidin ber "kesa şîrîn", "kesa navdar"

Ew dikarin wek rengdêran bi navberiya ravekan bi navdêran ve bîr girêdan:

- roja duyem
- birayê sêyem

Bidin ber: "roja xweş, birayê mezin".

Lê hejmarên rêzî herwiha dikarin li berî navdêran bîr bikaranîn bîyî ti ravek anku izafeyan:

- yekem car
- duyem roj
- sêyem kes

Bi vê peyvrêziya xwe ew dişibin cînavên destnîşankirinê, bo nimûne:

- sêyem kes (sêyem = hejmara rêzî)
- ew kes (ew = cînavê destnîşankirinê)

Lê du cudahiyan cînavên destnîşankirinê û hejmarên rêzî hene:

- Hejmarên rêzî dikarin li pêş yan jî li paş navdêrê cih bigirin ("yekem kes" û "kesa/ê yekem") lê cînavên destnîşankirinê tenê li pêş navdêrê ("ew kes" lê ne "*kes ew" yan "*kesa/ê ew")³¹
- Cînavên destnîşankirinê jî li gel navdêrê diçemin anku ditewin (ew roj > wê rojê, ew bira > wî birayî) lê hejmarên rêzî jî wek rengdêran li gor navdêran naçemin ("yekem roj > yekem rojê" – ne "*yekemê rojê")

Navdêrkirina hejmarên rêzî yên bi paşgira -em

Hejmarên rêzî yên bi paşgira "-em" dikarin herwiha wek navdêr jî bîn bikaranîn. Bo nimûne:

- yekemê pêşbirkê (li şûna "yekem kesê pêşbirkê" yan "kesê yekem yê pêşbirkê")
- duyema pêşbirkê (li cihê "duyem kesa pêşbirkê" yan "kesa duyem ya pêşbirkê")
- yekemên her welatî (kesên/komên yekem yên her welatî)

Wek ku tê dîtin, hejmarên rêzî di rewşa navdêrkirî de li gor cins û hejmara rêzimanî (yekhejmar an pirhejmar) ravekê (-a, -ê, -ên) werdigerin.

Peydabûna paşgira "-em" di kurmancî de û etîmolojiya wê

Paşgira "-em" û varyantên wê bi xwemalî di devokên kurmancî de li gel hejmarên bingeîn bo çêkirina hejmarên rêzî heta vê dawiyê peyda nedibû: yan ji mêj ve ew ji kurmancî wîndabû yan jî ti caran tine bûbû.

Lê dawiyê paşgira "-em" û varyantên wê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî di kurmanciya nivîskî de belav bûne. Hê jî bikaranîna wê di zimanê rojane de pir nadir e.

Paşgira "-em" û varyantên wê kevînar di zimanên îranî û hindûewropî de kevînar in tevî ku ew di kurmanciya devkî de peyda nabin/nedibûn jî. Ew di farisî de bi şiklê "-om" e, di pehlewî de "-um", di avestayî û sanskrîtî de "-eme", latînî "-imus", fransî "-ième". Bo nimûne:

- kurdî: yek-em

³¹ Cînav jî dikarin li pey navdêrê cih bigirin eger mesele xwedîtî (genetîv) be: "hevala/ê wê/wî".

- farisî: yekom
- avestayî: fret-eme
- sanskrîtî: pretheme
- latînî: pr-imus
- îtalî: pr-imo
- fransî: -uni-ème (tenê di hejmarên pêkhatî de, wek din "premier")
- lîtwanî: prî-mas
- latviyayî: pir-mais

Bi esehî nayê zanîn ka "-in" ya zazakî jî hevrehê "-em" e yan jî ji paşgira "-in" ya rengdêrsaz e.

1.2. Bi paşgira **-emîn**

Paşgira **-emîn** bi temamî hevwateriya paşgira **-em** e. Herdu dikarin herdem li cihê hev bînin bikaranîn:

- yekem – yekemîn
- çarem – çaremîn
- bîstem – bîstemîn
- sedem – sedemîn
- hezarem – hezaremîn

Heman varyant û guhertoyên paşgira "-em" (-yem, -hem, -wem) li gel paşgira "-emîn" jî hene: **-yemîn, -hemîn, -wemîn**:

- du-yem – duyemîn
- sê-hem – du-hemîn
- du-wem – du-wemîn

Ji aliyê peyvrêziyê ve jî herdu paşgir wek hev in: hejmarên rêzî yên bi wan çêkirî dikarin li pêş an jî paş navdêran bînin bikaranîn:

- roja yekemîn – yekemîn roj

Ji aliyê peydabûna xwe ya dîrokî ve jî herdu paşgir di kurmancî de nû ne: bi rêya zimanê nivîskî û medyayê ji soranî yan jî bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmancî. Paşgira "-în" di "-emîn" de heman paşgir e ku carinan rengdêran ji navdêran çêdike, bo nimûne "agir > agirîn, reng > rengîn, zêrr > zêrrîn".

Berevajî ku carinan tê gotin, paşgira "-em" ne kurtkirina paşgira "-emîn" e lê tarîxiyên "-em" kevntir e û dûv re paşgira "-în" lê hatiye zêdekirin.

Di ti haletan de ne zerûrî ye ku paşgira "-emîn" were bikaranîn: mirov dikare herdem "-em" û "-emîn" li cihê hev bixebitîne.

1.3. Bi paşgira -an

Hejmarên rêzî di kurmancî de dikarin herwiha bi paşgira -an ji hejmarên bingeîn bîn çêkin:

- roja çar-an
- cara pênc-an

Ji bilî hejmara "yek", hemû hejmarên din dikarin bi vê paşgirê ji hejmarên bingeîn bibin hejmarên rêzî:

- cara deh-an
- roja bîst-an
- şeva bîst û yek-an
- kitêba sed-an
- hejmara hezar-an

Varyantên wê ev in: -yan, -han, -wan:

- cara sê-yan
- cara yazde-han (yan "yazdeh-an")
- cara du-wan

Ev bikaranîn di kurmançî de xwemalî ye. Ew di kurmançiya navendî û rojavayî de li kar e lê di kurmançiya rojhilatî de nayê bikaranîn. (*Di kurmançiya rojhilatî de forma xwemalî "-ê" ye – li jêrtir binêrin.*) Li derveyî kurmançî, ew di soranî û lehceyên din yên kurdî de jî ne li kar e.

Di kurmançiya nivîskî de hin caran hejmarên rêzî yên bi paşgira "-an" an varyantên wê tên bikaranîn lê roj bi roj paşgira "-em" û varyantên wê (û carinan jî "-emîn" û varyantên wê) serî ji paşgira "-an" di vê mijarê de distînin.

Di kurmançiya devkî de "-an" adeten sivik dibe û wek "-a" dimîne eger li pey wê vokalek neyê:

- cara deha (< cara dehan)

Lê:

- ev cara dehan e

Lê bi devkî herwisa wiha jî mimkin e:

- ev cara deha ye

Ji aliyê peyvîrîyê ve cihê hejmarên rêzî yên bi paşgira "-an" û varyantên wê sabit e: ew dikarin tenê li pey navdêra ku rave dikin cih bigirin. Ne mimkin e ku ew bikevin berî navdêra raveber:

- "cara çaran" lê ne "*çaran car" (bidin ber "cara çarem[în]" û "çarem[în] car")

1.4. Bi paşgira -a

Hejmarên bingehîn dikarin herwiha bi alîkariya paşgira "-a" bibin hejmarên rêzî:

- cara çar-a
- roja pênc-a

Varyantên wê "-ya, -ha, -wa" ne:

- cara sê-ya / sisi-ya
- roja du-wa / dudu-wa
- roja pazde-ha / pazd-a

Ji aliyê cografî ve bikaranîna paşgira "-a" jî wek ya "-an" e: Ew di kurmanciya navendî û rojavayî de tê bikaranîn lê di kurmanciya rojhilatî û zarên din yên kurdî de nayê emilandin.

Hejmarsaziya bi paşgira "-a" bi giranî devkî ye û di zimanê nivîskî de hema-hema nayê dîtin. Li cihê wê adeten forma "-an" tê nivîsîn û êdî roj bi roj zêdetir li cihê vê jî "-em, -emîn" tên xebitandin.

1.5. Bi paşgira -ê

Hejmarên rêzî di kurmcî de dikarin herwiha bi paşgira "-ê" jî bîn çêkirin:

- cara yek-ê
- birayê çar-ê
- roja şeş-ê

Wek prensîp, ev paşgir di sazkirina hejmarên rêzî jî hejmarên bingehîn de bêsînor e:

- cara dehê
- cara bîstê
- cara sedê
- cara hezarê
- cara milyonê

Di kurmanciya rojhilatî, bi taybetî li Behdînan, ev awayê serekî yê çêkirina hejmarên rêzî ye. Di kurmanciya navendî de ev paşgira bo çêkirina hejmara rêzî jî peyva "yek" were bikaranîn. Lê wek din, ne di kurmcî û ne jî di zarên din yên kurdî de ev awa nayê bikaranîn.

Bi nivîskî ev awa di kurmanciya bi alfabeya kurdî-latînî de kêmtê dîtin lê di kurmanciya bi alfabeya kurdî-erebî de berbelav e ji ber ku kurmanciya bi alfabeya kurdî-erebî bi piranî li Behdînan tê nivîsîn ku ev awa lê li rewacê ye.

Varyantên wê ya serekî ya li pey hejmarên bi vokalekê bi dawî tên -yê ye:

- cara du-yê
- roja sê-yê / si-yê

Li gel hejmara "du" herwiha varyanta "-wê" jî mimkin e:

- cara du-wê / di-wê

Li gel hejmarên 11 – 19 dengê "e" yê dawiyê (yazd-e, diwazd-e, sêzd-e...) dikeve û paşgira "-ê" cihê wê digire:

- roja yazdê
- şeva sêzdê
- cara pazdê

Ji aliyê peyvrêziyê ve cihê hejmarên rêzî yên bi paşgira "-ê" û varyantên wê di komikên navdêrî de sabit e: ew dikare tenê li dûv navdêra raveber bê û ne mimkin e ku bikeve berî wê:

- cara yekê (ne "*yekê car")
- roja çarê (ne "*çarê roj")

Paşgira "-ê" wek sazkerê hejmarên rêzî ji aliyê etîmolojî ve ihtimalen ji paşgira "-ê" ya çemandinê ye. Lê herwiha mimkin e ku ew paşgireke sazkerê hejmarên rêzî ya kevnar jî be û hevrehê "-iye" ya avestayî ya xwedî heman rol be. Bo nimûne, avestayî "thriye" (sêyem, sêyê). Bi demê re guherîna "-iye" bi "-ê" ji aliyê dengnasî ve guherîneke asayî û normal e.

1.6. Bi paşgira -î?

Di hejmartina rojên mehan de formeke bi paşgira -î ya hejmaran di kurmancî de heye:

- yekî gulanê
- dehî sibatê
- bîst û yekî adarê

Di hin devokan de li cihê -î dikare paşgira -ê di vê rewşê de hene:

- yekê gulanê
- dehê sibatê
- bîst û yekê adarê

Ev dişibe formeke hejmarên rêzî. Lê di rastiyê de ew ne paşgireke hejmarên rêzî ye lê "-î" (yan varyanta wê "-ê") li vê derê daçek e ku cihê "li" digire wek ku "-î" li gel hin birrên din jî yên peyvan maneya "li" yan "ji" dide:

- nêzîkî wî bû (li wî nêzîk bû)
- dûrî min e (ji min dûr e)
- temaşeyî televizyonê dîkin (li televizyonê temaşe dîkin)

Bi gotineke din, bo nimûne "yekî gulanê" dibe "yek li gulanê".

Wek din, hejmarên bi paşgira "-î" wek hejmarên rêzî nayên bikaranîn. Anku mirov bikare bo nimûne li cihê "ew bû yekem" gotineke wek "*ew bû yekî" bi kar bîne.

ZÊDEBÛNA DENGÊ "R" LI PEYVAN

Kovara Kanîzar bi hevkarî li gel koma "Zimanê Kurdî" li ser Facebookê³²

Tê zanîn ku yek ji peyvên bi maneya "êriş/êrîş" yê di kurdî de tên bikaranîn "hicûm" yan "hucûm" e ku ji erebî tê û di wî zimanî de jî "hucûm" e. Tiştê ecêb ew e ku li hin deveran di kurdî de bûye "hîcrûm" yan "hucrûm" anku R lê zêde bûye.

Li hin deveran jî "hîcrûm, hucrûm" bi metatezê anku guherîna cihê dengan di peyvê de bûye "hurûjim, wirûjim".


Herwiha tê zanîn ku navê hejmara 90 li gor devokên kurmançî dikare "not, nod, newed, newêd, nehweêd, nehweêt, newhêt..." be. Di gelek zimanên din jî yê îranî de ew wek "newed, neved, nevet, newet..." e. Lê dîsa li hin deverên kurmançî, bi taybetî li Hekariyan, R lê zêde bûye û bûye "nehweêt".

Li gelek deveran peyva "bedel" ya ji erebî di kurdî de bûye "berdêl" yan "berdel". Dîsa peyva "mesele" li hin cihan bûye "mersele".

Di kurdiya kirmançî de peyva "kelem, kelemî" (lehane, bi inglîzî "cabbage") bûye "kelerm" anku dîsa R lê zêde bûye.

³² <https://www.facebook.com/groups/zimanekurdi/search/?query=Z%C3%AAdeb%C3%BBna%20deng%C3%AA%20R>

L. O. Fossum: Rêzimanê kurdî ya pratîkî



Kitêba *A Practical Kurdish Grammar* ji aliyê misyonerekî amerîkî yê bi navê L. O. Fossum ve hatiye nivîsîn û sala 1919 li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye çapkirin.

Kitêb ji nêzîkî 300 rûpelan pêk hatiye û naveroka wê wiha hatiye parvekirin: alfabeya kurdî (Kurdish), navdêr (nouns), rengdêr (adjectives), cînav (pronouns), lêker (verbs), hoker (adverbs), daçek (prepositions), girêdek (conjunctions), baneşan (interjections), peyvsazî (formation of Kurdish words), peyvên pêkhatî (Kurdish compound words), rastnivîsîn (Kurdish orthography), tevlihev (miscellaneous – ku bi piranî li ser navên deman û navên beşên laşî ye), hevoknasî (syntax) û ferhengok (vocabulary).

Berevajî gelek rêzimnivîsên biyanî yên ku berî Fossumî li ser rêzimana kurdî nivîsiye, ji pêşgotina Fossumî diyar e ku wî baş hay ji rêzimannameyên kurdî yên berî xwe yên bi zimanên ewropî hebûye. Ew jî wek gelek rêzimannivîsên berî xwe, di pêşgotina xwe de dest diavêje meseleya wê ka kîjan lehceya kurdî ji yên din "paktir" yan "resentir" e. Ew yên berî xwe rexne dike ku her yek ji wan lehceya berhema xwe ji yên dij "paqijtir" û "orişnaltir" dibîne lê taliyê ew bi xwe jî bi heman awayî pesnê ya xwe dide.

Fossum devoka Mihabadê wek bingehe kitêba xwe wergirtiye û bi wê dinivîse. Peyv û hevokên kurdî hem bi alfabeya kurdî-erebî ya wê demê (wek nivîsîna farisî ya niha) û hem jî bi alfabeya latînî (li gor rastnivîsîna inglîzî) nivîsîne. Di alfabeya kurdî-erebî de hereke (xaseten anku "e") bo diyarkirina hin vokalan hatine nivîsîn.

Berevajî gelek ewropiyên ku berî wî li ser rêzimana kurdî nivîsiye, wisa dixuye ku Fossum têra xwe baş kurdî (devoka kitêba xwe anku ya Mihabadê û derdorên wê) hîn bûye yan jî baş ji agahîderên xwe neqil kiriye.

Kurdî êdî bi alfabeya kurdî-erebî ya wê demê nayê nivîsîn lê bi alfabeyeke bi piranî vokalizekirî. Herwiha Fossum peyvên esil-erebî li gor orijîнала wan ya erebî dinivîse lê di nivîsîna kurdî y abi alfabeya kurdî-erebî de ew li gor dengnasiya kurdî tên nivîsîn. Di *A Practical Kurdish Grammar* jî de helbet kêmasî ûşaşiyên rêzimanî jî hene. Lê dîsa jî ew ji piraniya rêzimanên kurdî yên wê demê yên bi zimanê ewropî nivîsandî biserketîtir e û heta niha jî yek ji baştirîn rêzimanên kurdî yên berdest yên bi zimanê inglîzî (yan her zimanekî ewroî) ye.

Kovara Kanîzar û bloga Zimannas tevahiya vê kitêbê bi şanazî dixin xizmeta xwandevanên xwe:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2016/11/practical-kurdish-grammar.pdf>

Norwêjî wekû zimanêkî asayî³³



Nûsînî: Peter Trudgill

Wergêrran le Inglîsîyewe: Hesênê Qazî

Norwêjîyekan zîyatir pêyan xoş e wa bîr bikenewe lewaneye, barudoxî zimanî Norwêjî, seyr u semere u be dillnîyayîyewe naasayî bê. Ta ew cêyey degerrêtewe ser têgeyîştinî yekem, emin le cêy dîkeş da basim kirdûwe (bo wêne, birruwane Trudgill, 1995) ke, ew barudoxey zimanî Norwêjî têdaye nek her seyr u semere nîye, bellkû zorîş hêmin u me'qulaneye, be taybetî le ruwangey tehemulî zimanî u dêmokrasî zimanîyewe u le zor rûwewe dekrê cêy lêfêrbûn u tenanet lasayîkirdneweu pîyade kirdin bê le zorêk le beşekanî dinyada. Lem wutare da, emin beşî dûyemî ew têgeyîştine wate goya naasayî bûnî barudoxî zimanî Norwêjî şî dekemewe. Emin dellêm, egerçî le çend layenêkewe barudoxî zimanî le Norwêj zor degmen e , bellam eger le asoyekî berifirewantir da lêy birruwandrê , le rastîda seyr nîye. Dîyare karêkî hasane eger miro bîyewê zîyade lewey pêwîste seyrusemere bûnî komellnasîy zimanî modêrinî Norwêjî gewre katewe. Emin le xwarewe hêndêk lew layenane çirr dekemewe ke deyselmênin le ruwangey komellnasîy zimanewe Norwêjî be tewawî zimanêkî asayî

³³ **Têbînî wergêr:** em wutarey Peter Trudgill, yek le zimannasanî komellayetî nasrawî em buware, be mebestî dewllemend kirdinî lêduwan u yarmetî kirdinî zîyatir be rûnkirdnewey rêbazî çilonayetî pêweçaran be ziman/ şêwezare Kurdîyekan wergêrrdirawe. Aşkiraye lêduwan u lêkollînewey afirêner be bê piştbestin be tîorî zimanî, u be taybetî komellnasîy zimanî le merr barudoxî ziman/şêwezare Kurdîyekan hîçî lê şîn nabê. Be duway ew nûsîney pirofêsor Peter Trudgill da, dû nûsînî dîkeş sebarete be zimanî cûtstandarî Norwêjî ke zîyatir basî layenî pêşweçûnî mêjûyî ew standardane deken u le ruwangey cîyawazewe nûsrawin bo agadarî xwênerewanî hogirî babetî zimannasane pêşkêş dekrê.

ye u amaje beweş dekem le zor şwênî dîke le seransey dinya barudoxî zimanî ewto hen ke zor le nizîkewe we barudoxî zimanî Norwêjî deçin.

Norwêjî wekû zimanêkî Ausbau

Zor xellik le Norwêj wa wêdeçê pêyan wabê saz kirdinî goya " deskirdane"î Ny Norsk (Norwêjî Nwê) ta radeyek seyreu , amaje bew rastîye deken ke ew zimane hîç axêwerî bûmî nîye, le rastîda eme be tewawî şitêkî asayîyeu zorêk le şêwezare standardkirawekan le seransey dinya da saz kirawey deskirdin ke le layen plandarrêjanî zimanewe pêş xirawin ke zor car le ser binemay dozînewey zemîney hawbeşî nêwan lehcekanî qisepêkirdinî xorrskî ew kareyan raperrandûwe.

Serbaqî emeş layenêkî pêwendîdar u renge zor girîngtir heye ke deyslmênî berewpêşçûnî standardî Ny Norsk dekrê be tewawî be rewteîkî asayî dabindirê. Rêgeyek bo têgeyiştinî rûntir sebarete be barudoxî zimanî Norwêjî dekrê wurdbûnewe lew layeney barudoxî zimanî bê ke emin nêwim lênawe "zimannasîy komellayetî Ausbau"(birruwane (1992a;1992b Trudgill) . Em zemîney lêkollînewe ye le ser ew cwêkirdineweye dandirawe ke le seretawe Heinz Kloss (1967)encamî da, le nêwan ewey ew pêyan dellê " zimananî Abstand " Abstandsprache yan " zimanan le rûy mewda "u " zimananî Ausbau " Ausbausprache " zimanan le rûy dirrêj bûnewe ".

Gişt zimannasan zor be çakî lewe agadarin manay " zimanêk " , tenya beşêkî be pêy pêwere zimannasîyekanewe dîyarî dekirê. Ême be hemû qutabîyekanman ke taze le lay Ême dest be xwêndin deken dellêyn , ew pirsîyarey gelo şêwezarî zimanêk debê be " zimanêk " yan " lehceyek " dabindirê (yan dîsan şitêkî dîke) be hîçcor her be pêy birryarêkî zimannasane dîyarî nakirê. Lew bareyewe hokarekanî kultûrî, komellayetî, sîyasî u mêjûyîş dekrê dewrî zor qûllyan hebê. Kloss, be amaje kirdin bewey ke dekrê hêndêk le zimanan tenya u tenya be pêy pêwerî zimannasane be zimanî cîyawaz dabindirên, rûnakayî dexate ser em babete --- eweş le ber dûrî u mewday zimanî ewan le gell gişt şêwezarekanî dîkey ke hen. Le çuwarçêwey Urrûpa da, zor car zimanî Bask wekû nimûneyekî aşkiray zimanî Abstand basî lêwe dekirê. Çunkû hîç xizmêkî nizîkî le nêw zimananî dewer u berî xoyda nîye, u qet rêy tênaçê bikrê wekû lehcey zimanêkî dîke dabindirê.

Bellam, zorbey zimananî dîke --- zimananî Ausbau --- in , wate lew allugorraney le barudoxî zincîrey zimanî da rûyan dawê kewtûnetewe u peyda bûn u ewey ke be zimananî cîyawaz le yekitirî dadendirên behîçcor be tewawî le ber pêwaney zimanî nîye, nimûney kilasîkî le Urûpay Rojava ke tebî'etî zimananî ausbau nîşan deda le cîyawazî nêwan zimanî Allmanî u zimanî Holendî da derdekeê. Bellam, dekrê amaje be zor nimûney dîkeş bîkrê wekû cîyawazîyekanî nêwan zimananî Lehîstanî, Sillovakî u Çêkî: yan Norwêjî, Swêdî u Danmarkî: yan Purtugallî , êspanîyayî u Katallanî. Sebaret be nimûney Allmanî/ Holendî, dekrê billêyn (birruwane Chambers u Trudgill , 1997) ke zincîreyekî lehce rojawayîyekanî Gêrmanî hebûn ke le henawî ewanewe le mawey çendîn sedan da dû zimanî standardî cîyawaz seryan hellhênawe, wate Holendî u Allmanî. Ême lehcekanî ew zincîrey zimanîye ke le Holend u Bêljîk qiseyan pêdekrê be lehcey zimanî Holendîu ew lehcaney de nêw zincîrey zimanî Allman, Swîs u Utrîş da qiseyan pêdekrê be lehcey ser be zimanî Allmanî dadenêyîn --- emeş be tewawî le ber hoy xeyrî zimanî.

Be bekarhênanî qisey Hawgen (1968) dellêm , lehcekanî zimanî Holendî ew lehcanen ke bestiraneweyek be standardî Holendîyewe nîşan deden: wate, ewan pişt be standardî Holendî debestî bew manayey axêweranyan wekû zimanî standard çaw le Holendî deken ke be şêweyekî xorrsî le gell şêwe zimanî xoyan deguncêu , ewan Holendî standard be mebestî xwêndinewe u pênuşîn fêr debîn. Her awaş , lehce Allmanîyekan ,ew lehce rojawayîye gêrmanîyanen ke pişt be standardî Allmanî debestî u pêroyî lê deken, her le ber heman hoy le merr Holendî basman kird. (sinûrî cugrafîyayî le nêwan lehce Holendîyekan u lehcekanî zimanî Allmanî be wurdî debê lew şwêne dîyarî bîkrê ke sinûrî sîyasîye le nêwan wullatanî Holend u Allman da.) ew dû zimane standardane ke qa'îde u rêşayan bo dandirawe wate kitêbî rêzimanu qamûsîyan bo dandirawe, u xawenî samanî edibîn ke bew standardane nûsirawin , her yekey beserî xoyan debê be serbexo dabindirên – detuwanîn billêyn , her kam lewan hebûnêkî serbexoyan heye. Bem pêye detuwanîn çemkî zimanî ausbau binasênîn u billêyn zimanêkî ausbau çîye: zimanî ausbau zimanêke ke şêwezarekî standard kirawî heye legell gişt şêwezare nastandardekan ke le ast ew standarde peywest bûn u bestiraneweyek le xoyanewe nîşan deden.

Em nasandine be cuwanî rûnî dekatewe ke zimanan tenê saz kirawey kultûrî nîn bellkû le barî tuwanayekîyewe saz kirawey le gorranhatûşîn. Le ber ewey ke serbexoyî dîyaredyekî sîyasî u kultûrîye ta ewey ke dîyardeyekî zimannasî bê, şêwezarekan dekrê serbexoyî wedest bihênin yan serbexoyî xoyan le dest biden. Skatlendî, Allmanîy Textayîyan (Plattdeuwtsch) u Pirrovênsal giştîyan

nimûney ew zimananen ke bûn be lehce: Ewan serbexoyî xoyan le dest da u bûne pašiko u girêdirawî zimananî dîke (wate Inglîsî, Allmanî u Ferranseî). Bellam zimanî dîkey ewto hen ke serbexoyîyan wedest hênawe: Efrîkans u Meqdûnîyeyî her dûkyan lehcey (Holendî u Bullxarî – yan renga Sirbî) in ke êsta bûnete ziman: ew dû zimane zimanî ausbau in ke dirêj kirawnetewe yan saz dirawin yan le lehcekanî pêşûwewe pêş xirawin u peydabûn.

Dû layenî em babete le gell baskirdinî barudoxî zimanî Norwêjî da degoncên. Yekemyan eweye, ke ême cîyawazî nêwan zimananî ausbau u abstandman dest nîşan kird. Legell eweşda, em destînîşankirdiney cîyawazîyan coreyek sade kirdineweye. Çunkû, aşkiraye , abstand yan mewday zimanî dîyardeyeke kemptazor rêge deda be dirêcey ew mewdaye. Xallî dûyem eweye, egerçî ême gutiman xesletekanî zimanî zor girîngtirîn bo pêname kirdinî zimananî abstand u ew girîngîyeyan bo zimananî ausbau nîye, bellam deşzanîn ke pêwendîyekî serincrrakêş le nêwan em duwane da heye. Katêk be anqeste hewil dedrê bo têkdanî pile u hellkewtî ziman be hêrş kirdine ser serbexoyî şêwezare standardekan – zor car be mebestî sîyasî – be asayî mewda u dûrî zimanî debê le ber çawbigîrê. Boye, le salanî 1930 yekanî êspanîyay faşîst da ke sîyasetêkî be nawendewe girêdan berrêwe deçû, Franço y dîkitor hêrşî birde ser serbexoyî zimanî Katallanî be hellweşandinewey beşî ziman u edebîyatî Katallanî le zankoy Barçelonau weşan u billaw kirdinewey bew zimane qedexe kird, serbaqî ewe ew derfeteşî hebû hikûmetekey billê ke Katallanî " berrastî zimanêk nîye" bellkû tenê " lehceyekî êspanîyayîye" eweş le ber weyekçûnî aşkiray zimanî ew dirawsêyane u peywest bûnyan le zincîrey cugrafîyayî lehceyî da.

Be pêçewaneu, zor girîngtir bo şîkirdinewey em mebestey lêre basî lêwe dekeyn , ême hemûman gwêman lew metollege bûwe ke " ziman lehce yeke ke erres u hêzî deryayî hebê", bellam le rastîda be asayî hebûnî erresêk u hêzêkî derîyayî bes nîye(lewaneye be pêwîstî hokarî zor serekîş nebin, tenanet bo zimananî ausbau îşe, wek nimûney bûjanewe u zîndû bûnewey zimanî Katallanî deyselmênî, bellam eme basêkî dîkeye). Ca boye hewildanî be anqest bo ewey lehce bikrê be ziman be asayî debê gewrekirdinewey abstand î zimanîşî legellda bê wate mewday dûr biirêteweu, her weha pêşxistinî amrazî dîke bo wedî hênanî pirrojeyekî taybetî, wekû bekarhênanî rênûsêkî nwê yan tenanet dekarkirdinî elfûbêyekî be tewawî cîyawaz. Bo nimûne, standardî zimanî Meqdûnîyeyî ta radeyekî serincrrakêş , be rêgey pirrosey pillandarîştinî zimanî pêş xira, le ser binemay zincîrey lehce Sillavîye Başûrîyekan, ke lebarî cugrafîyayî her weha zimanîyewe, lehcegelî here dûr bûn le zimanî Bullxarîu le zimanî Sirrbo-Kirrowatî --- wate lehcekanî Başûrî Rojaway Meqdûnîye. Dîyare be

hellkewt ewe nekira. Eger miro bîyewê îdî'a bika lehcekey xoy le rastîda zimanêke ew demî miro debê destew dawênî tepkekanî serbexoyî bê wekû hebûnî qamûs, kitêbî rêziman û rênûs û zor lemaneş girîngtir, hebûnî nêwêk bo zimanêke. Bellam gumanîş leweda nîye ke miro heta mewda u dûrî nêwan zimanêkey xoy u dirawsêyekanî, berîntir ka, ke qefî zincîrey lehceyî hawbeşin, baştir e. Bem rêgaye da miro ew metirsîye kem dekatewe ke ewanîtir îdî'a biken ke zimanêkey miro " le rastîda " hêşta lehcey zimanêkî dîkeye.

Lêre, le basî zimanî Norwêjî da, ême detuwanîn amaje bikeyn bew cexte taybetîyey ke Ivar Aasen le ser lehce Rojawayîyekanî Norwêjî kirdî. Ewe zor car wekû serincdan u îstgirtin le ser ew lehcanê nîşan dirawe ke ew be " paktirîn " yan " têkneçûtirîn " şêwezarî zimanêkey dadenan. Bellam hellbet yek lew ştaney ke Aasên hewlî deda bîka ewe bû serbexoyî bo zimanî Norwêjî wedest bihênê, wate cwêbûnewe u serbexoyî le zimanî Danmarkî hawterîbî serbexobûnu cwêbûnewey netewey Norwêj le wullatî Danmark . Ca boye, her bew şêweyey ke zimanî Meqdûnîyeyî serbexoyî xoy bedest hênawe u le Sîrrbo- Kirrowatî u Bullxarî cwê bûwetewe be rêgey cext kirdin le ser ew dereceye le xo dûrxstinewey zimanî ke pêy kirawe bîka, Aasê îş zor be wurdî ew lehce Norwêjîyaney hellbijard ke dûrtirîn lehce bûn le zincîrey lehcey Danmarkî (her weha Swêdî), u le barî zimanîyewe lehcey here dûr bûn le wan, bo ewey ew lehcanê bibin be binemay zimanêkî standard kirawî nwê, ke duwacar bû be zimanî Norwêjî serbexo. Ewe karêkî here me'qûlu, betewawî asayî bû ke debû bîka.

Norwêjî Wekû Zimanêkî Firenorm

Hokarêkî dîkey ke be çawî xellkêkî zor wekû barudoxî naasayî zimanî Norwêjî debîndirê ewe ye ke bedest hênanî serbexoyî bo zimanî Norwêjî taqe hewlî Ivar Aasen nebû, bellkû akamî karekey geyîşte ewey ke êsta em zimanê dû şêwey standardî heye: Ny Norsk (Norwêjî Nwê), rolley şêwezarêk ke dirêcey abstand î wate mewday le zimanê deru dirawsêkan here dûre u: Bokmål (zimanî Danmarkîy Norwêjî) ke zor we zimanî Danmarkî deçê bellam êsta cîyawazî rêzimanî , wuşe u rênûsî le gell Danmarkî ewende heye ke nakrê be zimanî Danmarkî dabindirê, cige le hêndêk le piştîwananî Ny Norsk nebê ke heta êstaş Bokmål nek be Norwêjî, bellkû be Danmarkî dezanin. Eme girînge lêy tê bigeyîştirê ke tenanet em barudoxêş degmen nîye. Ber le hemûşit le ruwangey mêjûyîyewe degmen nîye. Norwêjî taqe zimanêkî Urûpayî nîye ke le katî bedesthênanî serbexoyî sîyasî netewe da dû rêge çareserî rikeberî hebûbê bo damezrandinî zimanî standard. Le pirrosey pêşweçûnî standardî modêrnî zimanî Yonanîş da larî u narrêkî hebû le ser ewey ke kame rêbaz weberbigirê . Le Yonanîş dû layenî çareserî rikeber le beranber yekitirî da rawestabûn, yekyan

deyewîst ew standarde le ser binemay şêwezarî Dêmotîkî saz bikrê ke le ser bin _ lehce bûmîyekan pêk hatibû, layenekey dîkeş deyewîst şêwezarêkî dîke ke zor êlîtîstî [şêwe zimanî nuxbe]tir bû, wate Katharevousa pêş bixrê. Egerçî, lew nimûneye da (birruwane Cahru, Trudgill, 1993), meseley abstand u ausbau le gorrêda nebû, le ber ewey ke zimanî Yonanî zimanêkî ausbau nîyeu hîçcore pêwendî u xizimayetîyekî zimanî le gell zimanî Tirkî da nîye, ke zimanî destelatî kolonyalî pêşû bû le Yonan. Lew sallaney duwayîda, rikeberî u kêşeke yek la kirawetewe, u Yonanî Dêmotîkî cêgey Katharevousa yan Yonanî petî u pakî teqrîben le gişt bestên u çuwarçêweyekda girtûwetewe. Le Norwêjî heta billêy dêmokiratîk da, cêgey hebûn u manewey her dû çareserîyekan wate cûtstandardî kirawetewe.

Lemeş zîyatir, xallî dûyem eweye ke ême debê be şêweyekî serdemîyane yanî lem zamaneda temaşay em dîyardeye bikeyn ewîş eweye hîç naasayî nîye ke zimanêkî taqane zîyatir le yek standardî hebê. Şêweyek le têrruwanîn le barudoxî zimanî Norwêjî eweye bigutrê Norwêjî zimanêkî taqaney cûtstandarde. Lêre da debê emeşman le berçaw bê ke serbexoyîş , wekû abstand , dîyardeyekî alloze ke kemptazor rêge deda be hebûnî derecey mewday dûrî u nizîkî. Sebaret be zimanî Norwêjî modêrin detuwanîn billêyn ke coreyek serbexoyî hawbeş heye le nêwan Bokmål u Ny Norsk da ke herdûkyan şêwezarî serbexon ke be wurdî le 'eynî zincîrey lehceyî kewtûnetewe u peyda bûn, egerçî deşkirê Ny Norsk be taybetî be rojaway Norwêj (u Bokmål, renga bikrê, be taybetî be Başûrî Rojhellatî Norwêjewe bîlkênîn).

Ew pêçellpêçî u allozîyane sebarete be serbexoyî zimanî hêndeş naasayî nîn. Bo wêne dekrê amaje bikeyn be şêwe cîyawazekanî Inglîsî standard ke le dinyay Inglîsî zimanda hen , ke cîyawazîyekanyan le hemû buwarekanî zimanîda u her weha le rênûsîşda debîndirêu,eme giriftêk bo têgey serbexoyî zimanî saz deka. Hêndêk lew şêwezare standardane be rûnî zor pile u hellkewtî yeksantiryan heye le ewanî dî, standarde Inglîsîyekanî Ustiralîyayî, Nîwzîlendî, Efîrçay Başûrî, Karayîbî, Skatlendî u Irlendî be şêweyek le şêwan mafyan lew serbexoyîyeda le standardî Inglîsîy Inglîsî u standardî Inglîsîy Emrîkayî kemptire. Bellam eme aşkira u rûne ke zimanî Inglîsî, wekû zimanêkî fire nawend, wek Norwêjî, zîyatir le yek şêwey standardî heye. Nimûney dîkey ewto le êspanîyayî, Portugali, Holendî u jîmareyekî tirî zimananda debînîn.

Le merr barudoxî zimanî Inglîsî renga baştirîn şêwe ewe bê wekû nwênerî nimûney nîwe- serbexoy nêwzed bikeyn bo şêwezare cîyawaze neteweyîkan. U nîşanekanî emeş bewe ra denasrêtewe ke ta radeyek şêwezarî standard kirawî cîyawazî heye u ewey ke hemû kes be 'eynî zimanî dadenê ke le

gell destê cîyawazekani lehce nistandardekan le wullatani cîyawaz da xoy deguncênê. Lewaneye hebin dijî ew qiseye derkewin, bellam şitî seyr sebarete be barudoxî zimanî Norwêjî eweye, ke be pêçewaney zimanî Inglîsî, dû standardî em zimane le çuwarçêwey wullatêk le serbexoyî da hawbeşin. Pallpiştî em qiseye zor ptewe. Barudoxekan cîyawazin, boye ême natuwanîn be hasanî wekû zimanêkî fire nawend amaje be zimanî Norwêjî bikeyn ême hewcêman be baskirdinî nimûney rûntir heye bo ewey bîselmênîn ke barudoxî zimanî Norwêjî şitêkî degmenu rêzperr nîye. Eme dû nimûney dîke. Hîndî u Urdu zor car wekû zimanî cîyawaz dadendirên. Le gell eweşda, rêgey waq'îtir eweye ke ewan, be 'eynî ziman dabindirên be dû standardî serbexo we , ke car car be zimanî Hîndûstanî nêwzed dekirê. Egerçî zimanî Urdu taqe zimanî resmîye le Pakistan, bellam le Hîndûstan hem Hîndî u hem Urdu be dû zimanî resmî denasrên. Eger le Hîndûstan le kesêk bipirsî gelo ew be zimanî Hîndî yan Urdu qise deka : wek ewe waye le Norwêj le kesêk pirsîyar bikey gelo be Bokmål yan be Ny Norsk qise deka: zor car pirsîyarêkî ewto hîç wullamî bo nîye. Le astî qise pêkirdinda ,ew " zimanane" le yektirî cwê nakirênewe. Cîyawazîyekeyan le nûsîn daye, Hîndî be elfûbêyî Devanagari u Urdu be elfûbêyî 'Errebî denûsrê. Le astî bekarhênanî wuşeş da, cîyawazin, her ew core cîyawazîyey ke le nêwan Ny Norsk u Bokmål da heye, Hîndî zor wuşey le Sanskrit ewe xuwestûwetewe, u Urdu le 'Errebî u Farsîyewe.

Sirrbo- Kirrowatî nimûneyekî dîkey zor çake. Le Yugoslavîyay pêşû da, zimanî serekî neteweyî bew nêwe denasra u bew teqelle Inglîsîyey ke le nêwanyanda dandirawe be cuwanî u be rûnî nîşan dedrê ke ême basî zimanêkî taqane dekeyn be dû normî cîyawazewe. Her wekû Hîndî/Urdu, elfûbêy cîyawaz bo nûsînyan dekar dekrê, şêwey Kirrowatî elfûbêyî Latînî bekar dehênê u şêwey Sirrbî elfûbêyî Çyriş. Cîyawazî fonolojî, rêzimanî u wuşeyîş le nêwanyanda heye. Her wek Norwêjî cîyawazîyêkî cugrafîyayîş le peresendyanda bedî dekrê, şêwey Kirrowatî zîyatir le ser binemay lehce rojawayîyekan u Sirrbî zîyatir le ser binemay lehce rojhellatîyekan pêgeyştûn. Dîsan wekû Norwêjî, egerçî , le Yugoslavîyay pêşû zor alloztir bû u, her wekû Hîndî/Urdu, ewey ke axêweran kameyek le şêwekan bo nûsîn bekar bihênin ta rradeyekî zor bestirabûwewe be nasênêy êtnîkî u dînî ewan ta ewey ke le ber layenî zimanî bê. Ca boye pirsîyar kirdin le kesêk gelo be Sirrbî yan Kirrowatî qise deka dekra le ew perrî rojawa u ew perrî rojhellatî wullat be pêy bestiranewey zimanî wullam dirabayewe, bellam le nawçe nawendîyekanî wullat wullamî pirsîyareke be pêy bestiranewey ênîkî dedirayewe.

Le weta hellweşanî Yugoslavîya, barudoxeke le ber hewlî hkûmetekanî Kirroatîya u Sirrbstan ke îdî'a deken le rastîda emane dû zimanî cîyawazin zor alloztir u pêçellpêçtir bûwe. Leweş zîyatir, ew

hewlane jîyanî le Musullmanekanî Bosnîyayî ke le barî cugrafîyayîyewe le nawend dejîn dijwar kirdûwe (birruwane Trudgill, 1995). Le katêkda hêndêk Kirrowat le Sarayêvo lewaneye be xoşîyewe wullam bidenewe ke be Kirrowatî qise deken , u hêndêk Sirrbî le 'eynî şar da ke be wurdî be heman lehce qise deken lewaneye be xoşîyewe billên ke be Sirrbî qise deken, rûn nîye Musullmanekan, eger rêgeyan nedrê le wullamda zaraway Sirrbo- Kirrowatî bekar bihênin, debê billên be çi zimanêk qise deken. Emeş pe pêy wîst u dillxuwarzî hukûmetekanî Kirrowatîya u Sirrbistan. Ca boye hîç seyr nîye ke êsta hukûmetî Bosnîya raygeyandûwe pêy xoşe zimanekeyan be nêwî Bosnîyayî hellbidrê. Hengîn zor wê deçê zimanêk ke be pêy pêwerî zimanî hêştâ me'qûlaneye pêy bigutrê Sirrbo-Kirrowatî le dahatûyekî nizîk da dû şêwe na bellkû sê şêwey standard kirawî lê bikewêtewe.

Axêweranî Musullmanî Urdu u axêweranî Hîndûy Hîndî pêwîst naka hemîşe pêyan xoş bê pêyan bigutrê ewan zimanekeyan yekeu 'eynî zimane, her wek bekarhênanî zaraway Sirrbo- Kirrowatî le lay nasyonalîstanî Kirrowat u nasyonalîstanî Sirrb wek kifrêkî rehay lêhatûwe. Her awaş, dîyare be xoşîyewe be şêweyekî zor nermtir, hêndêk le Norwêjîyekan dijî ewen bigutrê ke Ny Norsku Bokmål zimananî cîyawaz nîn u şêwey cîyawazî zimanêkî taqanen --- lêre da babetgelî girîngî nasêney girûpî u takî ser helldeda.

Bellam çawdêrêkî bêlayan le derewe ra, emin pêm waye, bituwanê tewaw be dillnîyayîyewe billê , ke lêre da, le gişt sê nimûnekanda,bas basî zimananî taqanen ke xawenî serbexoyî hawbeşin. Ême dekrê wekû zimananî fire norm amaje bew core zimanane bikeyn. Webîr bihênnewe ew nasandiney wa bo ausbau bûnî zimanêk le serewe da basman kird wate: zimanêkî ke le şêwezarêkî serbexoy standard u lehce nastandaredekan pêk dê ke em lehcanewe bew standarde bestirawnetewe. Ca boye bo ewey ewan be dû zimanî cîyawaz dabindirên şert her ewe nîye ke dû standardî serbexoyan hebê, bellkû debê dû komelle lehceşyan hebê. Allmanî u Holendî dû şêwezarî standardî serbexon ke legell dûbeşî cîyawazî zincîrey lehceyî deguncên. Ewe raste ke le nimûney Sirrbo-Kirrowatî, nimûney Bokmål / Ny Norşik u Hîndî/Urdu da dû (yan zîyatir) şêwezarî standard hen. Bellam, ewey lêre da girêng bê eweye ke l emerr her kamêkyan tenya yek komelle lehce bewan bestirawnetewe, ca boye ewan yek zimanin. U, be pêçewaney axêweranî Allmanî yan Holendî, axêweranî ew zimananey basman kirdin boyan heye le hellbijardinî standardekanda serpişik bin. Eme demangeyênête ewey ke debê manay nasandinî ziman allugorr keynu billêyn " zimanêk birîtiye le yek yan zîyatir şêwezarî serbexoy standard le gell gişt ew şêwezare nastandardaney ke bew yan be ewan bestirawinetewe". U ewe nasandinêkî tewaw u bê emlaw ewlaman sebarete be zimanî fire norm le ber dem ro denêu,

bew pêye derdekewê ke zimanî Norwêjî nimuneyekî berz u bê kunukeleberî ewtoye: zimanêk ke dû yan zîyatir formî standad kirawî heye be taqe komellêk le lehcey na standardewe.

Jêderekan (References)

1. Chambers, J.K., and Peter Trudgill 1997, *Dialectology* Cambridge: Cambridge University Press, 2nd edition
2. Haugen, Einar 1966, The Scandinavian languages as cultural artifacts. In J. Fishman et al. (eds) *Language problems in developing nations*. New York: Wiley.
3. Jahr, Ernst Hakon, and Peter Trudgill 1993, Parallels and differences in the linguistic development of Modern Greek and Modern Norwegian. In E. H. Jahr (ed.), *Language conflict and language planning*. Berlin: Mouton de Gruyter. pp. 83–98.
4. Kloss, Heinz 1967, Abstand-languages and Ausbau-languages. *Anthropological linguistics* 9, 29–41.
5. Trudgill, Peter 1992a, The Ausbau sociolinguistics of Greek as a majority and minority language. In M. Makri-Tsilipakou (ed.), *Proceedings of the 6th International Symposium on the Description and/or Comparison of English and Greek*. Thessaloniki: Aristotle University. pp. 213–35.
6. Trudgill, Peter 1992b, Ausbau sociolinguistics and the perception of language status in contemporary Europe. *International Journal of Applied Linguistics* vol. 2.2: 167–77. Trudgill, Peter 1995, *Sociolinguistics: an introduction to language and society*. London: Penguin, 3rd edition.

Serçawe: Em deqe bespasewe le mallperrî Språkrådet (Encumenî Zimanî Norwêjî) wergîrawe u wegêrdirawete ser zimanî Kurdî

“5 000 peyvên kurdî di Quranê de”

Husein Muhammed

Ne carekê û du caran min ji kurdan, heta ji kesên maqûl û zana jî idîayeke wisa bihîstîye ku dibêje “5 000 peyvên kurdî di Quranê de hene”. Adeten ev argument hingê tê kirin gava ku kesek dixwaze etîmolojiya hin peyvên ji erebî red bike.

Helbet gelek kes li ser zimanan diaxivin û ne hewce ye ku mirov her peyva her kesî bi cidî û ji dil bigire. Lê ev gotin ji aliyê hin kesan ve jî tê kirin ku di nav mijûlên û pisporên zimanê kurdî de navdar û qedirgirtî ne jî.

Herî dawîn min ev idîa ji Zeynelabidîn Zinar bihîst ku heta li zanîngehan jî dersên zimanê kurdî dide.

Z. Zinar wiha dinivîse: “... Di Qurana Pîroz de 5.000 peyvên kurdî hene...”



(<https://www.facebook.com/groups/133337890056895?view=permalink&id=1198892863501387>)

Mixabin ne Zeynelabidîn Zinar û ne jî ti xwediyan din yên vê idiyê ti caran ji mirovî re nabêjin ka bi rastî ew 5 000 peyv çî ne ku ew ji kurdiya wan piştrast in lê me rebenên din ti hay ji meseleyê nîne.

Lê ka em bi xwe hinekî li meseleyê binêrin:

Quran yek ji kitêbên herî vekolandî yê hemû dinyayê ye. Bi gotineke din, gelek lêkolînên zanistî, edebî û zimannasî jî li ser hatine kirin. Gelek ji wan ji aliyê misilmanên bawermend, hinek ji dijberên misilmanan ve û gelek jî ji hêla kesên kê-m-zêde bêalî ve li gor şert û mercên zanistî hatine kirin.

Ji aliyê zimannasî ve belkî giringtirîn çavkaniya heyî Korpûsa Quranê ye (<http://corpus.quran.com/>). Bi alîkariya çavkaniyên wiha mirov dikare li hejmara peyvên Quranê (orişînal bi zimanê erebî, ne wergerên wê yê bi zimanên din) jî binêre û wan wiha rêz bike:

- **Hejmara hemû peyvên di Quranê de 77 430 e.** Di vê hejmartinê de heman peyv dikare tenê carekê yan heta bi dehan caran hatibe dubarekirin.
- **Hejmara peyvên ne wek hev 18 994 e.** Di vê hejmarê de formên çemandî yê heman peyvê ji hev cuda hatine hesabandin. Bo nimûne, di vê hejmartinê de peyvên wek “kir, kirin, kiriye, kiribû, nekir, nekirine...” her yek wek peyveke serbixwe hatiye hejmartin.
- **Hejmara peyvên bi bistîk an bejnên cuda (bi inglîzî stem) 12 183 ye.** Di vê hejmartinê de bo nimûne peyvên wek “di-bêj-im, di-bêj-î, ne-bêj-in, bi-bêj-e...” wek eynî peyv hatine hejmartin lê peyvên wek “kirin” û “kar” ji hev cuda hatine hesabandin.
- **Hejmara peyvên serbixwe (lemma) 3 382.** Di vê hejmartinê de tenê peyvên serbixwe yê di ferhengan de cih digirin hatine hejmartin û hemû formên wan yê çemandî jî wek wan li gel wan hatine hesabandin. Bo nimûne, peyvên “dikim, nakim, kir, nekirin...” hemû di vê hejmartinê de wek beşek ji peyva “kirin” hatine hejmartin û hemû ev form bi hev re di vê hejmartinê de tenê yek peyv in.
- **Hejmara peyvên ji rehên cuda 1 685 ye.** Di vê hejmartinê de hemû peyvên ji eynî rehî anku peyvên ku etîmolojiya wan digihe hev, hemû wek yek peyv bi tenê hatine hejmartin.

(Binêrin: <http://quickestwaytoquran.blogspot.fi/2013/08/number-of-unique-words-in-quran.html>)

Niha meseleya giring ji me re xala dawiyê anku **hejmara peyvên ji rehên cuda (1 685) ye.** Ew diyar dike ku di hemû Quranê de “tenê” 1 685 peyvên ji rehên cuda hene.

Ji aliyê zimannasî û etîmolojî ve ti guman jê nîne ku hinek ji peyvên Quranê bi eslê xwe ne erebî ne. Bi heman awayî hemû peyvên Peymana Kevn (Tewratê) bi eslê xwe ne îbrî ne, hemû peyvên Peymana Nû (Incîlê) ne aramî yan yûnanî ne, hemû peyvên Avestayê ne avestayî ne û hwd. (Bo Quranê binêrin bo nimûne: <http://muslimmatters.org/2008/05/21/the-arabic-quran-and-foreign-words/>)

Lê çawa be jî, di Quranê de “tenê” 1 685 peyvên rehên wan ji hev cuda hene.

Guman jê nîne ku piraniya (lê helbet ne hemû) rehên cuda yê peyvên Quranê bi eslê xwe erebî ne. Li dûv wan jî peyvên ji îbrî û/yan aramî wergirtî hene ji ber ku îslam jî li ser heman tradisyonê hatiye avakirin ku cihûtî û filetî jî ilham û ava xwe jê girtiye.

Carinan heman peyv di erebî, aramî û îbrî de heye ji ber ku erebî ew peyv ji îbrî yan aramî wergirtiye. Lê gelek caran jî heman peyv di her sê zimanan de heye ji ber ku her sê ziman jî lêzimên hev in û ji heman makezimanê samî ne. Wek çawa ku di kurdî û farisî de gelek peyvên wek hev hene bêyî ku kurdî ew ji farisî yan farisî ew ji kurdî wergirtibin (ji ber ku herduyan ew ji makezimanekî hevpar wek mîras wergirtine), wisa gelek peyvên hevpar yê erebî, aramî û îbrî jî wek mîras bo her sêyan ji makezimanekî hevpar mane.

Li pey peyvên samî, di Quranê de hejmareke peyvên bi eslê xwe ji yûnanî hene. Sebeb ew e ku yûnanî hem zimanê kultûrê yê wê demê û hem jî zimanê Peymana Nû (Incilê) bû.

Li dûv yûnanî, hejmareke peyvên pehlewî tî. Pehlewî zimanekî îranî yê wê demê bû û zimanê fermî yê Imparatoriya Sasanî û herwiha zimanê dîne zerdûştî bû.

Ji ber ku pehlewî zimanekî hevrehê kurdî û farisî ye, mirov belkî bikare bibêje ev peyvên bi eslê xwe ji pehlewî yê di Quranê de “peyvên kurdî” yan jî “peyvên farisî” ne. Belkî ji hemûyan rasttir ew e ku mirov ji peyvên wiha re bibêje “peyvên îranî” yan jî “peyvên bi eslê xwe îranî”.

Lê çawa be jî hejmara peyvên wiha di Quranê de ne digihe 5 000, ne 500 û ne 50 jî. Em bi merdanî bihejmêrin jî, bi zorê mirov dikare xwe bigihîne 10 – 15 peyvên cuda yê Quranê yê ku bi eslê xwe îranî (pehlewî, farisî yan kurdî) bin!

"Panc Hezarî Çekuyê Kurdî Quran de!"

Nuştex: Husein Muhamed

Kurmanckî ra açarnayîş: Roşan Lezgîn

Ne reyke ne di rey, mi kurdan ra, heta kesanê maqul û zanayan ra, îdîayêka wina eşnawita ke vanê "Panc hezarî çekuyê kurdî Quran de estê." Bitaybetî gama ke wazenê etîmolojîya tayê çekuyanê erebkî red bikerê, nê argumantî aver anê.

Helbet zaf kesî ziwanan ser o qisey kenê, coka hewce nêkeno ke merdim her vateyê her kesî cidî bigêro. La na îdîa hetê tayê kesan ra bena ke mîyanê zanayanê kurdan de namdar ê. Mesela, tewr peynîyan de mi na îdîa Zeynelabidîn Zinarî ra eşnawite. Yew suhbetê xwu yê Facebookî de vano "... Di Qurana Pîroz de 5.000 peyvên kurdî hene..." La çi heyf ke ne Zeynelabidîn Zinar û ne zî wayîrê na îdîa ra tu keso bîn caran merdimî rê îzeh nêkenê ke heqîqeten nê panc hezarî çekuyî kamcîn ê ke kurdkiya înan ra hende emîn ê. Coka mi bi xwu waşt ez nîzdîye ra biewnî na mesela ra.

Quran, ê kitabana ra yew o ke dinya de tewr zêde ser o xebate biya. Bi vateyêko bîn, hetê îlmî, edebî û ziwannasîye ra gelêk cigêrayîşî ser o bîyê. Zafê nê xebatan hetê musulmananê bawermendan ra bîyê. Qismêk hetê muxalifanê musulmanan ra û gelêk xebatî zî hetê merdîmanê bêterefan ra şertanê îlmî gore bîyê.

Hetê ziwannasîye ra çimeyo tewr muhîm belkî *Korposê Quranî* bo (corpus.quran.com). Sayeyê xebata ke nê çimeyî de nîşan dîyena merdim eşkeno hûmara çekuyanê metnê orijînal yê *Quranî* bivîno.

Nê çimeyî gore *Quran* de pêro pîya 77 430 çekuyî estê. Na hûmare de, yew çeku beno ke tena reyke tede bivîyaro beno ke bi desan rey bivîyaro.

Nînan ra 18 994 çekuyî seypê nîyê. Na hûmare de çekuyê halê oblîkî cîya-cîya hesab bîyê. Mavajin, karê sey "kerd, kerdiş, kerdo, kerdbi, nêkerdo, nêkerdbi..." her yewe sey çekuyêka xwusere hesab bîya.

12 183 çekuyî bi heceyanê cîya-cîyayan ê. Çekuyê sey "va-na, va-nê, me-va-jê, bi-va-jê..." eynî çeku hesab bîyê. La karê sey "kerdiş" û "kar" cîya hesab bîyê.

3 382 çekuyî xwuser ê. Na hûmare de tena çekuyê ke ferheng de xwuser ca gêne estê û heme formê înanê oblîkî zî înan dir hesab bîyê. Ma vajin, karê sey "keno, nêkeno, kerd, nêkerd..." heme sey qismêkê karê "kerdene" hesab bîyê, yanî nê heme formî tena sey yew çeku hesab bîyê.

1 685 çekuyî zî kokê xwu cîya yo. Nê hûmaritişî de çekuyê ke eynî kok ra yê û etîmolojîya înan yewbînan gêna, pêro sey çekuyêk hesab bîyê.

Ma rê çîyo muhîm nê çekuyê peyên ê. Yanî nê 1 685 çekuyê ke kokê xwu cîya yo.

Hetê zîwanansîye û etîmolojî ra guman tede çin o ke qismêk çekuyê *Quranî* bi eslê xwu erebkî nîyê. Bi no hawa, heme çekuyê *Tewratî* zî bi eslê xwu îbrankî nîyê û heme çekuyê *Încîlî* zî aramkî yan yunankî nîyê. Û xwura heme çekuyê *Avesta* zî bi zîwanê avesta nîyê. La senî bibo zî, *Quran* de neke 5 000, tena 1 685 çekuyê kokê xwu cîya estê. Û guman tede çin o ke, pêro nêbo zî, zafê nê çekuyanê ke kokê xwu cîya yo, eslê xwu erebkî yê.

Erebkî ra dima, çekuyê ke îbrankî yan aramkî ra gêrîyayê estê. Çimkî îslamîyet, mesîhîti û cihûdîti eynî tradîsyonî ser o awan biyê. Heto bîn ra, tayê çekuyî bi eynî hawa erebkî, aramkî û îbrankî de estê. Çimkî erebkî bi xwu îbrankî yan aramkî ra çekuyî girewtê. La reye esta eynî çekuye her hîrê zîwanan de zî xwura esta, çimkî nê her hîrê zîwanî eqreba yê, grûba samî ra yê. Ma vajin eynî seke kurdî û fariskî de gelêk çekuyê ke seypê yê estê, seba ke her di zî eynî grûba zîwanî ra yenê coka merdim nêşkeno vajo kurdî fariskî ra yan fariskî kurdî ra girewtê. Bi no qayde, zaf çekuyê muşterekî sey mîrasê grûbe, erebkî û aramkî û îbrankî de estê.

Seba ke o wext yunankî hem zîwanê kulturî hem zî zîwanê *Încîlî* bi, coka çekuyanê zîwananê samî ra dima gelêk çekuyê ke eslê xwu yunankî yê zî *Quran* de estê. Yunankî ra dima qederek zî çekuyê pehlevkî *Quran* de estê. Çimkî pehlevkî o wext zîwanê resmî yê Împaratorîya Sasanî û zîwanê dîne zerduştîye bi.

Seba ke pehlevkî kokê kurdî û fariskî hesab bena, coka belkî merdim bieşko nê çekuyê ke *Quran* de bi eslê xwu pehlevkî yê ra vajo "çekuyê kurdî" yan "çekuyê fariskî". Labelê rastê ci na ya ke, merdim

nê çekuyan ra vajo "çekuyê îranî". Axir hûmara nê çekuyan zî *Quran* de 5 000 nîya, 500 nîya û 50 zî nîya. Eke ma bi ciwanmêrdîye bihûmarin zî ancî bi zor 10 yan 15 çekuyê bê. Hende!

CUDAHİYÊN DENGNAŞÎ DI LEHCEYÊN KURDÎ DE

Nasandina mijarê û peyvnasiya wê

Baş tê zanîn ku ferq û cudahî di navbera lehceyên (zaravayên) kurdî de hene. Lê kêm vekolînên zanistî û zimannasî li ser hatine kirin ka ew cudahî bi rastî çi ne.

Mirov dikare cudahiyên navbera ziman yan zaravayan li ser sê beşên berfireh parve bike:

- **cudahiyên peyvî** (bêjeyî, leksîkal, *lexical*): ziman yan zaravayên cuda peyvên cuda bo heman tiştî bi kar tînin. Bo nimûne, bi maneya "vê gavê, vê demê, vî wextî" piraniya kurmancan bi lehceya xwe peyva "niha" (yan "nika, noke, nihe") bi kar tînin. Lê soranîxav adeten van peyvan bi lehceya xwe bi kar naînin. Li cihê wê di soranî de peyva serdest "êsta" (yan "êste") ye. Di zimannasiyê de mirov ji diyarde û fenomenên wiha re dibêje "cudahiyên peyvî" (cudahiyên leksîkal).
- **cudahiyên teşenasî** (pirtiknasî, morfolojîk, *morphological*): ziman yan zaravayên cuda peyvan bi awayên cuda diçemînin û teşe û şiklên cuda yên rêzimanî didin wan. Bo nimûne, tiştê ku ji hin perr û kaxezan pêk tê, bi hev ve hatiye girêdan û tiştê de hatine nivîsîn, hem di kurmancî û hem jî soranî de bi navê "kitêb" (hin caran "pirtûk, pertûk") tê nasîn. Lê gava ku ez behsa wan tiştên xwe bikim, ez ê bi kurmancî bibêjim "kitêbên min" lê bi soranî bibêjim "kitêbekanim" ku ew jî her maneya "kitêbên min" ya kurmancî dide lê bi şikl û teşeya xwe jê cuda ye. Eger ez çavên xwe li naveroka wê bigerînim û lê binêrim, hingê ez bi kurmancî wê "dixwînim" lê bi soranî "dexwênim" (yan "exwênim"). Di zimannasiyê de ji diyarde û fenomenên wiha re "cudahiyên teşenasî" (cudahiyên morfolojîk) tê gotin.
- **cudahiyên dengnasî** (fonolojîk, *phonological*): ziman yan zaravayên cuda hin dengên (herfên) ji hev cuda hene yan jî di hin peyvan de dengên wan ne wek hev in. Bo nimûne, di tirkî de dengê Ö heye ku di kurdiya standard de nîne yan dengê X di kurdî de heye lê di tirkîya standard de peyda nabe. Carinan heman deng di herdu ziman yan zaravayan de hene lê dîsa

jî di hin peyvên de dengên wan ji hev cuda ne. Bo nimûne, organa leşî ya ku mirov pê dinyayê dibîne di soranî de bi peyva "çaw" tê nasîn. Her sê herfên wê di kurmançî de hene lê dîsa jî piraniya kurmançîxavan bi lehceya xwe wî tiştî ne bi peyva "çaw" lê bi awayê "çav" bi nav dikin. Diyardeyên wiha di zimannasiyê de bi navê "cudahiyên dengnasî" tên naskirin.

Di vê nivîsarê de em ê li ser vê nuqteya dawiyê anku li ser cudahiyên dengnasî di lehceyên kurdî de rawestin.³⁴ Em ê di vê vekolînê de kurmançî bidin ber van her sê lehceyên din yên serekî yên kurdî:

- soranî
- kurdiya başûrî (feylî, kelhurî, kirmanşanî)
- zazakî

Vekolîna me dê hewl bide ku hem hevdemî (sinkronîk, *synchronic*) be û hem jî dîrokî (diyakronîk, *diachronic*) be. Anku em ê hem bibêjin ka niha rewş çî ye (hevdemî) û ka çawa peyda bûye yan guheriye (dîrokî). Lê di vê nivîsarê de em ê bi kûrahî neçin nav mijara guherîna wan dengên lê em ê tenê bibêjin ku filan deng bûye bêvan deng yan filan deng ji fistan dengî kevntir yan nûtir e. Bo xwandevanên ku dixwazin delîlan bo van idiyên me bibînin, em bala wan dikişînin ser nivîsarên me yên yek bi yek li ser dengên kurdî û peydabûn û guherîna wan dengên.³⁵

Hêjayî bibîranînê ye ku gava em bibêjin filan deng di filan lehceyê de wiha ye, mebesta me ne ew e ku ew di her peyva wê lehceyê de wisa ye û ne jî mexseda me ew e ku ew deng yan ew peyv di her devoka wê lehceyê de wisa ye. Gava ku em behsa dengê dikin yan hin nimûneyan didin, em ê hewl bidin ku nimûneyên serdest di wan lehceyan de bidin. Lê ev nayê wê maneyê ku ew nimûne di her devoka yan devera wê lehceyê de heye û nayê wê wateyê jî ku ew peyv yan ew deng nikare li hin deverên wê lehceyê bi awayekî din be.

Hedefa vê vekolînê ne ew e ku hewl bide diyar bike ku lehceyên kurdî pir ji hev dûr in yan jî pir nêzîkî hev in. Armanca me tenê ew e ku van cudahiyan ji aliyê rêzimanî ve berçav bikin.

³⁴ Nivîsareke me ya li ser her sê cudahiyên dengnasî, teşenasî û peyvî di navbera kurmançî û soranî de di kovara *Nûbihar* de, di hejmara 132 havîn 2015 de hatiye belavkirin

³⁵ Nivîsarên me yên li ser dengên kurdî û peydabûn û guherîna wan li ser bloga me *Zimannas* hatine belavkirin: <https://zimannas.wordpress.com/>

Armanca vê vekolînê ew e ku lehceyên kurdî piçekê baştir binase û binasîne (bide nasîn). Herwiha armanc ew e ku bi destnîşankirina cudahiyên heyî têgihiştina van lehceyan li ber qisekerên lehceyên din hêsantir bike.

Armanca vê vekolînê bi ti awayî ne ew e ku idia bike ku yek ji van lehceyan ji yên din "resentir", "kevnartir", "moderntir" yan "pêşketîtir" e. Bi kêmi, qet nabe ku ev vekolîn bi ti awayî wisa were fehmkirin ku dengên yek ji van lehceyan ji yên din "rasttir" in. Her zimanî û her lehceyê sîstema xwe ya dengnasî (fonolojî) heye û her ziman û lehce wek xwe rast û hêja ye.

Ev vekolîn û yên berî wê

Dengnasî yek ji beşên serekî yên zimannasiyê ye (li gel teşenasiyê anku morfolojiyê û hevoknasiyê anku sîntaksê). Loma di piraniya berhemên li ser zimanê kurdî de, herwiha beşek ji dengnasiya kurdî re jî hatiye terxankirin.

Berhevdana dengnasî ya hin lehceyên kurdî jî berê hatiye kirin. Bi taybetî berhevdana hin devokên soranî û kurmançî ji aliyê zimannasê brîtanî D. N. MacKenzie ve di kitêbên wî *Kurdish Dialect Studies* (Vekolînên zaravayên kurdî) I – II ji destpêka salên 1960 ve berdest in. Lê ew tenê li ser hin devokên kurmançî û soranî ye, ne kurdiya başûrî û ne jî zazakî tê de cih digire û herwiha ji devokên kurmançî û soranî jî tenê behsa devokên li Başûrê Kurdistanê dike.

Di navbera kurmançî û zazakî de çend berhemên hêja yên rêzimanî hatine nivîsîn, bo nimûne kitêbeke Roşan Lezgîn ya rêzimana zazakî bi kurmançî û rêzenivîsên Seîd Veroj li ser berhevdana kurmançî û zazakî bi herdu lehceyan di kovara War de. Ev herdu berhem bi berfirehî behsa teşenasiyê (morfolojiyê) û hevoknasiyê û heta qederekê behsa peyvnasiyê jî dikin lê mixabin berhevdana dengnasî di wan hema-hema bi temamî hatiye jibîrkirin.

Ji her çar lehceyên ku em ê li vê derê bidin ber hev, kurdiya başûrî (devokên feylî, kelhurî, kirmaşanî...) ji her sê yên din (kurmançî, soranî, zazakî) pir kêmtir tê nivîsîn û berhemên bi wê hema-hema peyda nabin. Xweşbextane yek ji berfirehtirîn û kûrtir kitêbên rêzimana kurdî li ser devokên vê lehceyê hatiye nivîsîn: kitêba Ismaîl Kemendar Fettah (Ismaîl Kamandâr Fattah) *Les Dialectes Kurdes Méridionaux* (Devokên Kurdiya Başûrî) bi zimanê fransî.

Ev şaheser bi qasî 160 rûpelan cih dide dengnasiya kurdiya başûrî û devokên wan dide ber hev lê mixabin ew jî ti berhevdanekê di navbera kurdiya başûrî û lehceyên din yê kurdî de (kurmancî, soranî, zazakî, hewramî...) nake. Herwiha ji ber ku kitêb bi fransî hatiye nivîsîn, mixabin piraniya kurdan nikarin feyde jê bibînin.

Anku çendîn berhemên hêja li ser dengnasiya kurdî jî hene lê mixabin bela-wela û pelate ne. Helbet ev vekolîn deyndarê wan e jî lê dixwaze bi carekê her çar lehceyên li gor hejmara qisekerên xwe mezin yê kurdî bi carekê bîne ba hev û wan bi kurdî pêşkêşî kurdîhezan bike.

Ev vekolîn dê hewl bide her nuqteya behskirî bi nimûneyan isbat bike. Nimûneyên kurmancî û soranî giştî ne û dikarin di gelek ferheng û kitêban de bên dîtin. Nimûneyên ji kurdiya başûrî bi temamî ji kitêba behskirî ya Ismaîl Fettahî ne. Nimûneyên ji zazakî jî dikarin di gelek ferhengan de bên dîtin lê min bi xwe hewl daye ku yek bi yek li ber ferhenga Malmîsanijî ya zazakî-tirkî xwe ji wan piştrast bikim.

CUDAHİYÊN DENGNAŞÎ DI NAVBERA KURMANCÎ Û SORANÎ DE

Kurmancî V Soranî: W, M, V

Di peyvên xwemalî yê soranî de V hema-hema peyda nabe.³⁶ Li hevberî V ya kurmancî di soranî de bi piranî W heye:

kurmancî	soranî
çav	çaw
nav	naw
sêv	sêw
şev	şew

³⁶ Peyva "hevde" (17) yek ji kêma awarteyan/istisnayan e.

Lê hin caran jî li cihê V ya kurmancî di soranî de M heye:

kurmancî	soranî
dev	dem ³⁷
ev, eve	em, eme

Di peyvên ku ji kurmancî yan zimanên din wergirtî de V carinan di soranî de jî tê bikaranîn:

kurmancî	soranî
evîn	evîn (ji kurmancî)
mirov	mirov (ji kurmancî)
televizyon	televizyon (ji zimanekî ewropî)
vîdyo	vîdyo (ji zimanekî ewropî)

Tarîxiyên V / W yê piştî vokalan ji M yan B peyda bûne û di kurmancî de bûne de bi piranî bûne V û di soranî de W.

Soranî RD Kurmancî R yan RT

Di hejmareke mezin ya peyvan de di soranî de koma dengên RD heye ku di kurmancî de tenê R heye:

soranî	kurmancî
birdin	birin
kirdin	kirin
mirdin	mirin
pard	pir ³⁸
sard	sar
xwardin	xwarin

³⁷ "Dem" (wext, çax, zeman) ya kurmancî di soranî de jî bi forma "dem" heye lê di soranî de bi vê maneyê zêdetir peyva "kat" tê bikaranîn.

³⁸ Bi maneya "rêya di ser avê re", ne bi wateya "gelek, zehf, zor".

Heman koma dudeng di lehceyên din yê kurdî û zimanên din yê îranî de jî heye, bo nimûne zazakî “berden, kerden, merden, warden” yan farisî “borden, kerden, morden, x(v)arden”.

Di zimanên kevn û navîn yê îranî de li cihê vê R-ya kurmancî û RD-ya soranî, zazakî û farisî RT hebû. Paşî ew bûye RD û taliyê D jî ji kurmancî ketiye. Anku tarîxiyên di kurmancî de D ji pey R ketiye, ne di soranî de li pey R zêde bûye.

Lê di soranî de hin caran jî RD heye ku di kurmancî de hevberî wê ne tenê R lê RT heye. Bo nimûne, bi soranî “bijardin”, bi kurmancî “bijartin”. Ev T nîşana demên borî ye, wek di peyvên “hat, got, sot...” de. Anku tarîxiyên RT hebû lê paşî di soranî de li ber modela RD-yên peyvên wek “birdin, kirdin” ew jî bûye RD.

Lê ku carinan li hevberî R ya kurmancî di soranî de RD heye, ev nayê wê maneyê ku herdem li cihê R ya kurmancî di soranî de RD hebe. Di piraniya haletan de di soranî de jî wek kurmancî tenê R heye. Bo nimûne “bar, car, ser, sîr, sor” di soranî de jî “bar, car, ser, sîr, sûr” hene anku di wan de jî D peyda nabe.

Kurmancî ST- Soranî EST-, S-, ST-

Berevajî kurmancî, soranî li destpêka peyvên komên konsonantî qebûl nake. Li cihê ku di kurmancî de ST li destpêka peyvê hebe, di soranî de bi piranî EST heye:

kurmancî	soranî
stêr	estêre
stûr	estûr
sto, stu	esto
Stembol	Estemboł

Tarîxiyên ev deng ST bû lê di soranî de E li destpêkê hatiye zêdekirin.

Carinan jî li şûna zêdekirina E li ST, T jê dikeve: kurmancî “standin, stendin”, soranî “sendin”.

T-ya ST ne tenê ji destpêka peyvê lê dikare herwiha ji dawiya peyvê jî bikeve: kurmancî “dest”, soranî “dest, des”.

Lê di soranî de jî di peyvên ji kurmancî yan ji zimanên ewropî wergirtî de ST jî dikare li destpêka peyvê peyda bibe. Bo nimûne, “stran” ji kurmancî û “studyo” ji inglîzî.

Ne tenê ST, lê komên din jî yên konsonantî di soranî de diguherin. Bo nimûne, kurmancî “şkeft”, soranî “eşkewt”.

Lê herdem ev guherîn di soranî de jî peyda nabe: kurmancî “spî, şkandin, şkestin”, soranî “spî, şkandin, şkan”.

Ç, K, P, T

Di kurmancî de du yan zêdetir dengên her yekê ji herfên Ç, K, P, T li destpêka peyvan dikare peyda bibe. Parvekirina serekî ya van peyvan li wê ye ka ew deng li destpêka peyvê bipif (“req”, bi inglîzî *aspirated*) e yan jî bêpif (“nerm”, *unaspirated*) e. Bo nimûne:

deng	nimûneyên bipif (req)	nimûneyên bêpif (nerm)
Ç	çar	çav
K	kurdî	kirin
P	perde	pênc
T	têr	te

Di soranî de Ç, K, P, T li destpêka peyvê herdem bipif (*aspirated*) in anku “req” in. Di nav yan dawîya peyvên xwerû de ew adeten bêpif (*unaspirated*) in anku “nerm” in. Di kurmancî de jî li nav û dawîya peyvê ew adeten bêpif in lê bêpifîti li destpêka peyvê jî dikare hebe.

Bo nimûne, di kurmancî de Ç-ya peyva “çar” bipif e anku req e lê Ç-ya peyva “çav” bêpif e anku “nerm” e. Lê di soranî de Ç-ya peyva “çaw” jî her wek ya peyva “çwar” (çar) bipif e anku “req” e.

Di gelek devokên kurmancî de konsonantên P, S, T, Z awayên xwe yên emfatîk anku “qelew” jî hene: “pez, sed, tav, zanîn”. Di soranî de rola emfatîkiyê/qelewiye li gel van konsonantan yan nîne yan jî pirr kêr e.

H

Di kurmancî de H dikare li destpêk, nav û dawiya peyvan peyda bibe. Di soranî de H nikare li dawiya peyvan bibe. Loma bo nimûne:

kurmancî	soranî
deh	de
neh	no
guh	gwê
reh, rih	reg, rîş

Mebest ji H li vê derê tenê H-ya wek di peyva "heval" de ye (bi alfabeya kurdî-erebî هه). H-ya wek di navê "Hesen" de (bi alfabeya kurdî-erebî هه) di soranî de jî di peyvên ji erebî wergirtî de li dawiya peyvan jî mimkin e: ruh روح (ruh, can, giyan, derûn).

Li destpêk û nava peyvan jî H di kurmancî û soranî de ne herdem wek hev e. Li nava peyvan de li cihê komdengê EH yê kurmancî di soranî de gelek caran A heye:

kurmancî	soranî
pehn	pan
tehl	tał
mehr	mare

Hin caran jî bin çareyên din hatine dîtin, bo nimûne kurmancî "bêhn", soranî "bon".

Li destpêka peyvan hin caran li cihê H ya kurmancî di soranî de "vala, xalî" ye anku ti deng nînin. Bo nimûne, kurmancî "hesp, hêsan, hejmartin, hesin" (herwiha "asin"), bi soranî "esp, asan, jimardin, asin".

Lê carinan jî di soranî de H yan HE heye lê cihê wan di kurmancî "vala" ye yan jî dengê "eyn" (ع, ئ). Bo nimûne:

kurmancî	soranî
war	hewar
jar (herwiha "hejar")	hejar

ewr	hewr
erd	herd, 'erz

Tarîxiyen peydabûn û ketina H mijareke aloz û piralî ye. Em ê li vê derê neçin nav wê mijarê ji ber ku di nivîsareke din de me bi berfirehî behsa wê kiriye.³⁹

E û I

Gelek caran li cihê “i” ya kurmançî di soranî de “e” heye. Bo nimûne:

kurmançî	soranî
bi (wek “bi destan”)	be
li (wek “li malê”)	le
bihar	behar
(ez) dikim	dekem
gihandin, ghiştin ⁴⁰	geyandin, geyiştin

Wek ku ji nimûne “dikim / dekem” diyar dibe, di kurmançî de paşpirtika berdewamiyê li gel piraniya lêkeran “di-“ ye⁴¹, lê di soranî de “de-“ yan jî “e-“ ye.⁴²

Tarîxiyen E di kurmançî de bûye anku formên bi E kevntir in.

Ê û Î

Li cihê Î ya kurmançî di soranî de gelek caran dengê Ê heye. Bo nimûne:

³⁹ Binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/08/10/denge-h-peydabun-u-guherina-wi/>

⁴⁰ Herwiha “gehandin, ghiştin”.

⁴¹ Li gel hin lêkeran forma serdest “t-“ ye, wek “ez tîm / tînim”.

⁴² Di soraniya nivîskî de bêbiryariyeke berçav di navbera “de-“ û “e-“ de di vê rewşê de heye. “De-“ forma devokên mukrî û hewlêrî ye, “e-“ forma devokên silêmanî û kerkûkî ye. Herdu jî bi berfirehî di zimanê nivîskî de tên dîtin lê “de-“ serdesttir e.

kurmancî	soranî
Îran	Êran
kî ⁴³	kê
diçînim (çandin)	deçênim (çandin)

Wek ku ji nimûneya dawiyê diyar e, rehê dema niha yê lêkerên bi paşpirtika “-andin, -endin” di kurmanciya standard de -în- e lê di soraniya standard de -ên- e. Ji ber ku hejmara lêkerên wiha di kurdî de mezin e, ev rêjeya Î di nivîsên kurmancî de û nisbeta Ê jî di nivîsên soranî de pir dike.

Li aliyê din, di çend peyvan de di kurmancî de Ê lê di soranî de Î heye: kurmancî “mêvan” (herwiha “mêhvan, mihvan”), soranî “mîwan”.

Tarîxiyên bi piranî Ê bûye Î, ne berevajî.

E û Ê

Paşgira lêkeran di demên niha û bîr de li gel kesê sêyem yê yekhejmar (ew) di kurmancî de bi piranî E ye lê di soranî de Ê ye. Bo nimûne, “(ew) diçîne / distîne, dixwîne”, soranî

(kurmancî / soranî)	kurmancî	soranî
çandin / çandin	diçîne	deçênê
standin, stendin / sendin	distîne	desênê
xwandin, xwendin / xwêndin	dixwîne	dexwênê
nivîsîn / nûsîn	dinivîse	denûsê

L û Ł

Hem di kurmancî û hem jî di soranî de du varyantên dengê L hene ku adeten ji yekê re tê gotin “L-ya zirav” û ji ya din re jî “L-ya qelew”.

⁴³ Bi forma xwe ya çemandî / tewandî “kê”.

L-ya zirav bo nimûne di van peyvên de peyda dibe: “law, lez, lêv, lîmon, lome, lûfik”. L-ya qelew jî bo nimûne di van peyvên de peyda dibe: “silav, welat, sala 2016”.

Di alfabeya kurdî-erebî L-ya zirav wek ل û L-ya qelew jî wek ل̤ tê nivîsîn. Di alfabeya kurdî-latînî de adeten ew ji hev nayên cudakirin ji ber ku di kurmançî de ew ne du dengên fonemîk in anku guherandina yekê ji wan bi ya din nikare maneya peyvê biguherîne. Di soranî de rewş cuda ye loma di alfabeya kurdî-erebî ya zêdetir li gor pêwîstiyên soranî saz kirî ew du herfên ji hev cuda ne.

Cudahiya dengnasî li vê derê di navbera kurmançî û soranî de ew e ku gelek peyvên ku di kurmançî de bi L-ya zirav jî, di soranî de bi L-ya qelew in. Li vê derê bo diyarkirina cudahiya dengên peyvên kurmançî û soranî, em ê dengê L-ya zirav bi herfa L û dengê L-ya qelew jî wek ل̤ binivîsin.

Bo nimûne:

kurmançî	soranî
belê	beḷê
dil	diḷ
gul	guḷ
hilbijartin	heḷbijardin
mal	maḷ

Tarîxiyên di peyvên îranî de (bo nimûne “dil, gul”) ev deng RD bûn lê paşî di kurmançî de bûne L û di soranî de jî bûne ل̤. Di peyvên ji erebî (bo nimûne “belê, mal”) eslê dengê L bûye lê di soranî de bûye ل̤.

Di hin devokên soranî de (bo nimûne di hewlêrî de) li cihê L-ya qelew adeten ne L-ya zirav lê R heye: “maḷ → mar”, “beḷê → berê”. Heman diyarde di hin devokên kurmançî de jî di hin peyvên de peyda dibe: “bila / bela → bera / bira”.

Kurmançî –Ū /-UH, soranî –WÊ

Li pey konsonantên C, D, G, K û N li cihê dengê Ū yan komdengê UH yê kurmançî, di soranî de gelek bi piranî komdengê WÊ heye. Bo nimûne:

kurmancî	soranî
guh	gwê
nû	nwê
gûz	gwêz
dijûn (sixêr, xeber)	cwên
(ji / li) kû	(le) kwê(we)

Ev dengên ji hev cuda bi piranî ji îraniya kevn “-ew-” hatine û di kurmancî de bûne “û, uh” û di soranî de “wê”.

Kurmancî “xwe-” soranî “xo-”

Li cihê komdengê “xwe-” yê kurmancî, di soranî de hin caran komdengê “xo-” heye. Bo nimûne:

kurmancî	soranî
xwe	xo
xweş	xoş
xwelî	xot(emêş)

Di soranî de komdengê “xwe-” qet peyda nabe lê li cihê “xwe-” ya kurmancî, di soranî de herdem “xo-” nîne lê carinan hin dengên din hene. Bo nimûne:

kurmancî	soranî
xwedî, xwedan / xudan, xweyî	xawen
xwendin, xwandin	xwêndin

Tarîxiyên “xwe-” kevnartir e û “xo-” ji wê peyda bûye. Di hin devokên kurmancî de jî “xwe-” bûye “xo-” yan “xu-” lê di piraniya devokan de û di kurmanciya standard de forma “xwe-” hatiye parastin.

Di hin zimanan de G berî hin vokalan wek [g] û berî hinên din jî wek [c] yan [j] tê gotin. Bo nimûne, di inglîzî de adeten G wek [g] tê gotin lê di peyvên wek “geology” (jeolojî) û “Germany” (Almanya) de wek [c] tê gotin. Di haletên wiha de di fransî de G wek [j] tê gotin. Loma bo nimûne peyva fransî “géologie” gava ku ketiye kurdî û tirkî wek “jeolojî” (bi kurdî) yan “jeoloji” (bi tirkî) tê nivîsîn anku G-ya wê bûye J.

Di gelek zimanên ewropî de C adeten wek [k] tê gotin. Lê bo nimûne di îtalî de, gava ku dengê “e” yan “i” li pey wê be, hingê C wek [ç] tê gotin. Bo nimûne “cento” [çênto] anku “sed, 100” û “cinque” [çînkwe] anku “pênc”.

Diyardeyeke wiha di piraniya devokên soranî de jî heye. Gava ku dengê “ê” yan “wê” bikeve peyv G, G wek [ç] tê gotin. Gava ku ew deng bikevin pey K, hingê K wek [ç] tê gotin. Bo nimûne:

kurmancî bi nivîsîn û gotinê	soranî bi nivîsînê	soranî bi gotinê
guh	gwê	[cwê]
kî, kê	kê	[kê]
(ji / li) kû	(le) kwê(we)	(le) [çwê]we

Niha ti diyardeyeke wisa di kurmancî de nayê dîtin. Lê tarîxiyên tiştekî wisa di zimanên îranî de bi giştî (kurmancî jî di nav de) qewimiye. Wek encama wê, peyva kurdî “çi, çî” ji peyva proto-hindûewropî “*k^wis” çêbûye. Lê heman peyva proto-hindûewropî di kurdî de wek “kî, kê” anku bi K jî maye. Di proto-hindûewropî de “çi” û “kî” herdu bi eynî peyvê dihatin pirsîn û heta niha jî di hin zimanên hindûewropî de herdu peyv bi dengê [k] ne, bo nimûne fransî “qui” [kî] anku “kî” û “que” [ki] anku “çi”.

CUDAHİYÊN DENGNAŞÎ DI NAVBERA KURMANCÎ Û KURDIYA BAŞÛRÎ DE

Mebest ji “kurdiya başûrî” (kurdîy xwarig) komeke çendîn devokan e ku li beşên herî başûr yê Rojhilata Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê (ji deverên soranîxav başûrtir) tên axiftin. Navên cuda li vê koma devokan tên kirin: feylî, kelhurî, kirmaşanî... Lê her yek ji van her sê navan tenê beşek ji vê koma devokan e loma di zimannasiyê de zêdetir navê “kurdiya başûrî” li van devokan hatiye kirin.

Li Rojhilata Kurdistanê bajarên mezin yê ku piraniya rûniştvanên wan bi kurdiya başûrî diaxivin Kirmaşan û Îlam in û li Başûrê Kurdistanê jî Xaneqîn û Mendelî ne.

Hêjayî gotinê ye ku hewramî / goranî, lekî û lurî nêzikî qisekerên kurdiya başûrî yan jî di nav wan de dijîn lê kurdiya başûrî ne hewramî, lekî yan lurî ye. Ji mêj ve gengeşe li ser kurdîbûna hewramî, lurî û heta dereceyekê lekî jî heye lê di nav zimannasan de ti şik û guman ji kurdîbûna kurdiya başûrî nîne.

Anku kurdiya başûrî ji aliyê zimannasî ve ji hewramî, lekî û lurî zêdetir nêzikî kurmancî û soranî ye. Heta hin caran tenê behsa “kurdiya bakurî” anku kurmancî û “kurdiya başûrî” bi merema soranî tê kirin heçku kurdiya başûrî tine be yan jî beşek ji soranî be.

Lê hem ji aliyê dengnasî ve û hem jî ji aliyê rêzimanî ve kurdiya başûrî ji soranî cuda ye. Em ê cudahiyên dengnasî li jêr bibînin. Ji aliyê rêzimanî ve yek ji taybetmendiyan herî mezin di navbera kurdiya başûrî û zaravayên din yê kurdî de ew e ku di kurdiya başûrî de ergatîvî peyda nabe.

Bi armanca dirêjnebûnê, li jêr em ê li cihê gotina “kurdiya başûrî” tenê peyva “başûrî” bi kar bînin. Lê li vê derê mebesta me bi ti awayî ne “kurdiya Başûrê Kurdistanê” ye (ti tişteki wisa nîne jî ji ber ku Başûrê Kurdistanê bi çendîn lehceyan cuda diaxive: kurmancî, soranî, kurdiya başûrî, hewramî, şebekî...) lê merema me “devokên kurdiya başûrî” anku bo nimûne feylî, kelhurî û kirmaşanî ne.

Di piraniya devokên başûrî de di gelek peyvên de li cihê B ya kurmancî û soranî W heye. Heman diyarde hem di peyvên xwemalî (îranî) û hem jî yên ji erebî wergirtî de peyda dibe:

kurmancî	soranî	başûrî
baran	baran	waran
kitêb	kitêb	kitaw
xirab	xerap	xiraw
xerîb	xerîb	xerîw

Tarîxiyên kurdiya başûrî (û hewramî) di peyvên xwemalî de W parastîye lê ev W di kurmancî, soranî û farisî de bûye B. Li aliyekî din, di peyvên ji erebî wergirtî de kurmancî û soranî parêzvanên B ne lê kurdiya başûrî ew jî kiriye W.

Tarîxiyên kurmancî jî B-ya / P-ya piştî vokalan dikir V / W û soranî jî ew dikir W. Bo nimûne, pehlewî “sêp”, farisî “sêb” lê kurmancî “sêv” û soranî “sêw” yan avestayî “xsep-”, farisî “şeb” lê kurmancî “şev” û soranî “şew” yan avestayî “xvepne-”, farisî “x(v)ab” lê kurmancî û soranî “xew” yan avestayî “ebre-”, farisî “ebr” lê kurmancî “ewr” û soranî “hewr”. Lê di peyvên ji erebî wergirtî de kurmancî û soranî êdî bi piranî B ya piştî vokalan jî diparêzin, berevajî kurdiya başûrî ku wê B niha jî dike W.⁴⁴

Kurmancî V Başûrî W

Ji bilî çend devokên biçûk, di kurdiya başûrî de jî wek di soranî de dengê V di peyvên xwemalî de peyda nabe. Li cihê V ya kurmancî adeten W heye lê di hin devokan de di bin tesîra farisî û/yan hewramî de M li cihê V ya kurmancî heye. Bo nimûne:

kurmancî	soranî	kurdiya başûrî
çav	çaw	çaw
mêvan	mîwan	mîwan

⁴⁴ Em haydar in ku di hin devokên kurmancî de jî xaseten li Serhed û Navenda Anatolyayê B ya piştî vokalan ji peyvên ji erebî wergirtî de dibe W yan V: kitêw, kitêv. Lê li vê derê armanca me ew bûye ku em berhevdanekê di navbera kurdiya başûrî û kurmanciya giştî de bikin.

nav	naw	naw
zava	zawa	zawa
zevî	zewî	zewî (→ di hin devokan de “zew, zeü”)

Di vê meselê de kurdiya başûrî jî li gel soranî ye. Ev V-ya / W-ya piştî vokalan tarîxiyên ji M ya îraniya kevn e. Ew di kurmancî de bûye V, di soranî û başûrî de bûye W lê di zazakî, hewramî, farisî û gelek zimanên din yên îranî de wek M maye.

Kurmancî Û Başûrî Ü / Î / Û

Hevberî dengê Û ya kurmancî û soranî, di piraniya devokên kurdiya başûrî de dengê Ü (wek tirkî yan almanî lê dirêjtir). Bo nimûne:

kurmancî	soranî	başûrî
zû	zû	zü
dûr	dûr	dür
rû	rû	rü
mû	mû	mü

Di vê meseleyê de kurmanciya giştî û soranî wek hev in û ji kurdiya başûrî cuda ne. Lê hêjayî gotinê ye ku li aliyekî hemû devokên kurdiya başûrî Û nakin Ü lê dikin Î anku li cihê “zü, dür, rü, mü”, hin devok wan dikin “zî, dîr, rî, mî”.

Ev heman diyarde di kurmanciya rojhilatî (bi taybetî di behdînî) de jî heye. Anku li cihê “bûk, dûr, zû, mû” mirov dibêje “bük / bwîk, dür / dwîr, zü / zwî, mü / mwî” û li hin deveran (xaseten li Dihokê) heta wek “bîk, dîr, zî, mî” jî. Di vê meseleyê de kurmanciya Behdînan û kurdiya başûrî wek hev in.

Tarîxiyên ev deng Û bûye û di kurdiya başûrî de bi Ü yan Î guheriye. Li çend deverên kurdiya başûrî jî formên bi Û hatine parastin: “mû, zû, dûr, rû”.

Kurmancî O Başûrî Û

Li cihê O-ya kurmancî û soranî, di kurdiya başûrî de adeten dengê Û heye. Bo nimûne:

kurmancî	soranî	başûrî
roj	roj	rûj
zor	zor	zûr
kor, kore	(kwêr)	kûr
(dew)	do	dû

Tarîxiyên ev deng O bûye û di kurdiya başûrî de guheriye û bûye Û. Piştî ku Û di kurdiya başûrî de bûye Û, cihê Û vala bûye û li gor teoriya veguheztina vokalan, O ji cihê xwe liviye û cihê valabûyî yê Û-yê girtiye (ji ber ku Û ji cihê xwe çûbû cihê Û-yê ku berê betal bû.)

Eynî diyarde di kurmanciya rojhilatî de (xaseten li Behdînan) jî peyda bûye: “roj → rûj / ruj, got → gût / gut” piştî ku ji ber guherîna Û bi Û cihê Û-yê vala mabû.

Başûrî RD Kurmancî R

Berevajî kurmancî lê wek lehceyên din jî yê kurdî û piraniya zimanên din yê îranî, kurdiya başûrî jî RD parastiye û D-ya li pey R nexistiye. Bo nimûne:

başûrî	soranî	kurmancî
birdin	birdin	birin
kirdin	kirdin	kirin
mirdin	mirdin	mirin
pird	pird	pir
sard	sard	sar
xwardin	xwardin	xwarin

Wek ku tê dîtîn, kurdiya başûrî û soranî di vê meseleyê de wek hev in. Di rastiyê de tenê di kurmançî de RD bûye R, wek din lehceyên din yên kurdî û piraniya zimanên din yên îranî RD wek xwe hiştiye (li jêrtir li berhevdana kurmançî û zazakî binêrin.)

L û Ł

Di piraniya devokên kurdiya başûrî de jî, wek di soranî de, gelek caran li cihê L-ya zirav ya kurmançî, L-ya qelew (Ł) heye. Bo nimûne:

kurmançî	soranî	başûrî
keçel	keçeł	keçeł
dil	dił	dił
gul	guł	guł
bela	bela	bela

Di hin devokên başûrî de, bi taybetî li Kirmaşan û Mendelî Ł peyda nabe û li cihê wê jî L heye. Tarîxiyên meseleya Ł wek di soranî de ye: di peyvên xwemalî de Ł ji RD ya îraniya kevn e, di peyvên ji erebî de ji L ye.

Ç, K, P, T

Dengên Ç, K, P û T di kurdiya başûrî de (wek di soranî de lê berevajî kurmançî û zazakî) li destpêka peyvan herdem bipif anku “req” in (bi inglîzî *aspirated*). Li nav û dawiya peyvan, xaseten di kîteyê negirankirî de, bîpif in anku “nerm” in (*unaspirated*).

Kurmançî ST Başûrî S, ES, HES

Kurdiya başûrî, wek gelek lehce û zimanên din jî yên îranî yên niha (lê berevajî kurmançî û zimanên kevn û navîn yên îranî), komên konsonantî li destpêka peyvan red dike. Loma li cihê ST ya destpêkê tenê S heye yan jî E yan HE li S hatiye zêdekirin û wek ES yan HES peyda dibin. Heman diyarde di soranî de jî peyda dibe. Lê di cudahiya soranî û kurdiya başûrî li vir ew e ku soranî yan ST dike S yan

jî dike EST- anku yan konsonantekî diavêje yan jî vokalekê lê zêde dike. Lê kurdiya başûrî hem T diavêje û hem jî E (+ H) lê zêde dike. Bo nimûne:

kurmancî	soranî	başûrî
standin, stendin	sendin	sendin
stêr	estêre	hesare

Cudahiyeke din di vê meselê de di navbera soranî û kurdiya başûrî de ew e ku soranî li nav û dawîya peyvan bi piranî ST qebûl dike lê kurdiya başûrî di piraniya devokên xwe de ST li her cihê peyvê dike S:

kurmancî	soranî	başûrî
dest	dest, des	des
şêst	şêst, şest	şes ⁴⁵
zivistan	zistan	zimsan
Kurdistan	Kurdistan	Kursan

Tarîxiyên ST di zimanên îranî de li destpêk, nav û dawîya peyvan peyda dibe. Kurmancî ev komdeng di hemû pozisyonan de parastîye lê van lehceyên din ew kêr-zêde guherandiye.

Kurmancî -A- / -EH- Başûrî -YE-

Li cihê A yan EH yê kurmancî û A ya soranî yê navbera konsonantan di kurdiya başûrî de gelek caran dibin YE:

kurmancî	soranî	başûrî
kanî, kehnî	kanî	kyenî
tehl, tal	tał	tyeł
nizanim ⁴⁶	nazanim	nyezanim

⁴⁵ S-ya qelew wek di peyva “sed” de.

⁴⁶ Tarîxiyên “nazanim” wek “nakim, naxwim, nabêjim” ...

Kurmancî NG Başûrî Ñ

Di piraniya devokên kurdiya başûrî de li cihê komdengê NG yê kurmancî dengê Ñ [ŋ] heye ku dengê encama helîna N û G bi hev ve ye. Di hin devokên soranî de jî NG dibe Ñ lê di soranî de jî NG serdest e. Bo nimûne:

kurmancî	soranî	başûrî
deng	deng	deñ
reng	reng	reñ
bang	bang	bañ

Soranî XO- Başûrî XWE-

Berevajî soranî, kurdiya başûrî jî wek kurmancî komdengê “xwe-” yan “xue-” qebûl dibe. Li cihê wan di soranî de komdengê “xo-” heye. Bo nimûne:

kurmancî	başûrî	soranî
xwe	xwe	xo
xweş	xweş	xoş

Tarîxiyên ev komdeng bi awayê “xwe-” bû lê di soranî de bûye “xo”.

CUDAHİYÊN DENGNAŞÎ DI NAVBERA KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DE

Mirov dikare bibêje ku paradoksiyeke zimannasî ye ku di kurmancî û zazakî de li aliyekî tam eynî deng hene lê li aliyê din bikaranîna wan dengên di peyvên hevreh de bi awayekî pir zelal ji hev cuda ye.

Mebesta me ji “eynî dengên” ne ew e ku kurmancî û zazakî heman alfabeya kurdî-latînî bi kar tînin. Ew jî rast e lê mebesta me li vir ne herfên alfabeyê lê dengên zimanî ne. Bo nimûne, di alfabeya kurdî-latînî de tenê varyantek ji her yek ji herfên Ç, K, P, T heye lê hem di kurmancî û hem jî di zazakî de her yek ji wan bi dengê xwe varyantên bipif (req) û yên bêpif (nerm) jî hene. Herwiha di herdu lehceyan de ji bilî awayên zirav, herwiha awayên qelew jî yên dengên P û T peyda dibin. Anku ji aliyê maliyeta xwe ya dengên ve xwedî tam eynî dengên in. Lê di pratîkê de ew van dengên bi awayên pir ji hev cuda bi kar tînin.

Kerem bikin em van cudahiyan bibînin.

Kurmancî B

Zazakî V

Li destpêka peyvên xwemalî li cihê B ya kurmancî di zazakî de bi piranî V heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
ba	va
baran	varan
berf, befr	vewre
bîst	vîst

Di vê meselê de soranî û farisî wek kurmancî ne, hewramî û kurdiya başûrî bi W-ya xwe li van cihan zêdetir dişibin zazakî. Tarîxiyên ev deng di zimanên îranî yên kevn û navîn de V/W bû û paşî di kurmancî, soranî û farisî de bûye B.

Kurmancî V

Zazakî M/W

Li nav û dawiya peyvên li pey vokalan li cihê V ya kurmancî di zazakî de carinan M û carinan jî W heye:

kurmancî	zazakî
nav	name
gav	gam
av	aw ⁴⁷
şev	şew

Tarîxiyên zazakî M-ya îranî di van peyvan de parastîye û kurmancî ew kiriye V. Bo nimûne, kurmancî “nav”, zazakî “name”, farisî, belûçî û pehlewî “nam”, avestayî û sanskrîtî “name-”, inglîzî û almanî “name”, fransî “nom”...

Gava ku di van haletan de di kurmancî de V û di zazakî de W heye, hingê ew ji B/P yê îranî ne: P → B → V/W. Bo nimûne, kurmancî “şev”, zazakî “şew”, farisî “şeb”, pehlewî “şeb, şep”, belûçî “şep”, avestayî “xşep-”, sanskrîtî “ksep-”...

Di soranî û kurdiya başûrî de jî B/P ya îranî wek zazakî bûye W. Lê berevajî zazakî, soranî û kurdiya başûrî jî M-ya navbera vokalan wek kurmancî guherandiye lê nekiriye V lê W (ji ber ku V di soranî û başûrî de hema-hema peyda nabe).

Zazakî RD

Kurmancî R

Berevajî kurmancî lê wek piraniya lehceyên din yê kurdî û zimanên din yê îranî, zazakî jî komdengê RD parastîye. Bo nimûne:

zazakî	soranî	kurmancî
berdene	birdin	birin
kerdene	kirdin	kirin
merdene	mirdin	mirin
pirde	pirde	pir ⁴⁸
werdene	xwardin	xwarin

⁴⁷ Li gor devokan “awe, awi, awk...” lê ya giring bo me li vir ew e ku W tê de heye.

⁴⁸ Bi mebesta “rêya di ser avê re” (bi inglîzî “bridge”), ne bi wateya “pîrr, gelek, zehf” – hevrehê vê di zazakî û soranî de jî “pîrr” lê maneya wê di van lehceyan de “tîjî, mîşt, dagirtî” ye.

Anku di vê meselê de zazakî û soranî wek hev in û ji kurmancî cuda ne. Lê divê tenê ev cudahî mirovî nexapîne: hem ji aliyê dengnasî ve û hem jî ji aliyê rêzimanî ve soranî û zazakî ji soranî û kurmancî yan zazakî û kurmancî jî dûrtir e.

Zazakî E Kurmancî I

Di hejmareke pir mezin ya peyvan de di zazakî de E lê di kurmancî de I heye.

Em dikarin tabloya xwe ya li ser RD/R bi piranî li vir jî dubare bikin û hin peyvên din jî lê zêde bikin:

zazakî	kurmancî
berdene	birin
kerdene	kirin
merdene	mirin
wesar	bihar
berz	bilind

Tarîxiyên zazakî E parastîye û kurmancî ew di van û gelek peyvên din de kiriye I. Soranî û kurdiya başûrî jî di piraniya van peyvan de (lê ne di hemûyan de E kiriye I) lê ji berhevdana zimanên din yê îranî diyar e ku E bûye I, ne berevajî. Bo nimûne, kurmancî “kirin”, soranî “kirdin” lê zazakî “kerdene”, hewramî “kerday”, farisî “kerden”, pehlewî “kerten”, hexamênîşî “ker-”, avestayî “ker-”, sanskrîtî “ker-“...

Kurmancî XW Zazakî W

Li şûna komdengê XW yê kurmancî di zazakî de adeten W heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
xweş	weş
xwarin	werdene
xwendin, xwandin	wendene
xweh, xuşk	way

Lê hêjayî gotinê ye ku cînavê kurmancî “xwe” di zazakî de jî “xo, xwu” ye anku ev qeyd wî nagire.

Tarîxiyên kurmancî X parastiye û zazakî ew ji berî W xistiye. Herwiha hewramî û belûçî jî X ji vî komdengî avêtiye lê wek din lehceyên kurdî û zimanên din yên îranî yan XW parastiye yan jî W avêtiye.

Kurmancî J Zazakî C

Di peyvên xwemalî / îranî de li cihê J ya kurmancî adeten C heye:

kurmancî	zazakî
jîn	cenî
roj	roc ⁴⁹
jîn, jiyan	ciwayene

Hin caran jî li cihê J ya kurmancî di zazakî de Z heye, bo nimûne “jî” (herwiha) ku di zazakî de bi awayê “zî” ye.

Tarîxiyên zimanên îranî yên kevn de ev deng Ç bû, di kurmancî, soranî û başûrî de bûye J, di zazakî û hewramî de bûye C û di farisî de Z.

Kurmancî G Zazakî V

Di hejmareke bisinor ya peyvên de li cihê G ya kurmancî di zazakî de V heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
gul	vilî
gur(g)	verg
gotin	vatene

⁴⁹ Koma Xebatê ya Vate, ku li ser zazakî vekolînan dike û formên standard pêşniyaz dike, varyanta “roj” wek forma standard bo kurmancî tercîh kiriye. Lê ev ne ji wê ye ku piraniya zazakîxivan wê bi kar tînin lê ji ber ku ew form zêdetir nêzikî kurmancî ye û yek ji armancên ragihandî yên Vateyê bijartina formên nêzikî lehceyên din yên kurdî (bi taybetî kurmancî) ye.

Di vê mijarê de soranî, kurdiya başûrî, farisî û pehlewî zêdetir nêzîkî kurmancî ne lê dîsa jî tarîxiyên ev deng V yan W bûye. Bo nimûne kurmancî “gur(g)”, soranî, kurdiya başûrî û pehlewî “gurg”, farisî “gorg” lê hewramî “werg”, avestayî “vehrke-”, sanskrîtî “vrkes”, swêdî “varg”, inglîzî û almanî “wolf”...

Kurmancî H Zazakî Ø

Di hejmareke ne kêr ya peyvên hevreh de li cihê H ya kurmancî di zazakî de H nîne. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
hestî	este
hejmar	amar
hêstir, hesp	estor, istor
havîn	amnan (herwiha “hamnan”)

Di çend peyvên wiha de tarîxiyên H hebûye û ji (hin devokên) zazakî ketiye, bo nimûne “havîn / amnan”, bi soranî “hawîn”, hewramî û pehlewî “hamîn”, avestayî “ham-” anku H ji hin devokên zazakî ketiye (belkî di bin tesîra yan li ber modela “amarn” ya ermenî) lê heta di zazakî de jî di hin devokan de wek “hamnan” anku bi H maye.

Lê tarîxiyên bi piranî di van peyvên de H tine bû û ew paşî li kurmancî zêde bûye, bo nimûne kurmancî “hesp”, soranî “esp”, farisî “esb”, hewramî “esp”, pehlewî “esp”, avestayî “espe-”, sanskrîtî “eşve-”...

Kurmancî H Zazakî S

Di hejmareke bisinor ya peyvên de li cihê H ya kurmancî di zazakî de S heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
deh	des
bihar	wesar

Heman S di zazakî de hevberî H ya kurmancî di hejmarên 11 – 19 de jî heye: yewndes (yazdeh, 11), diyes (dazdeh, 12), hiryas (sêzdeh, 13)...

Tarîxiyên ev deng S bû, bo nimûne kurmancî, soranî, farisî, pehlewî “de(h)” lê zazakî “des”, avestayî “dese-”, sanskrîtî “dese-”, ermenî “tesn”, rûsî “dêsyati”... Tarîxiyên ew bi xwe jî ji proto-hindûewropî *K bû lê paşî bûye S û taliyê jî di hin zimanên îranî de bûye H anku formên bi H ji yên bi S nûtir in.

Lê hejmara peyvên wiha pir kêr e. Li aliyekî din, peyva “sê” (3) bi zazakî “hirê” ye anku li cihê S ya kurmancî H heye anku ev berevajî qeyda “kurmancî H – zazakî S” ye.

Kurmancî ST- Zazakî EST-, AST-

Wek soranî, kurdiya başûrî, hewramî û farisî, zazakî jî komên konsonantî li destpêka peyvê qebûl nake. Loma bo nimûne li cihê ST- yên kurmancî, di zazakî EST- yan AST- heye:

kurmancî	zazakî	soranî
stêr(k)	estare, astare	estêre

Tarîxiyên kurmancî ev komdeng parastiye lê guherîn di zazakî û ziman û lehceyên din yên îranî yên niha de peyda bûye. Bo nimûne, zazakî “estare, astare”, soranî “estêre” lê kurmancî “stêr(k)”, avestayî “ster-”, pehlewî “starek”, sanskrîtî “star”, inglîzî “star”, almanî “Stern”, latînî “stella”...

Zazakî A Kurmancî Î / Ê

Di rehê demên niha û bên yên gelek lêkeran de li cihê Î (carinan Ê) ya kurmancî di zazakî de A heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
ez di-mîn-im	ez man-en-a
ew di-xwîn-e	o wan-en-o
ew di-bê-n / di-bêj-in	ê va-n-ê

Herwiha di hin navdêran de jî li cihê Ê ya kurmancî, di zazakî de A heye. Herwiha berevajî kurmancî, zazakî A ya peyvên erebî nake Ê. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
hêk	hak
kitêb	kitab

Kurmancî H Zazakî Ş

Di çend peyvên de li cihê H ya kurmancî di zazakî de Ş peyda dibe. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
guh	goş
têhnî, tihî, tînî, tî	teyşan

Kurmancî K Zazakî H

Di çend peyvên de li cihê H ya kurmancî di zazakî de Ş peyda dibe. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
ker	her
kanî	henî

Tarîxiyên ev deng X bû lê di kurmancî, soranî û kurdiya başûrî de bûye K û di zazakî hewramî de H. Bo nimûne, kurmancî û soranî "kanî", kurdiya başûrî "kyenî", zazakî "henî", hewramî "hane", farisî "xan", pehkewî "xanig", avestayî "xan-", sanskrîtî "xan-" yan kurmancî û soranî "ker", zazakî, hewramî û belûçî "her", farisî û pehlewî "xer", avestayî û sanskrîtî "xere-"...

Kurmancî S Zazakî Ş

Di çend peyvan de li S ya kurmancî di zazakî de Ş heye. Bo nimûne:

kurmancî	zazakî
rast	raşt

Northern Kurdish poetic features with an application to translation

Edward Harry Magin Jr.

Master of Arts with major in Applied Linguistics

The Graduate Institute of Applied Linguistics

Supervising Professors: Dr. Brenda H. Boerger and Dr. Peter Unseth

This thesis is a study of poetic features in Northern Kurdish poetry. The corpus, which represents three periods of Northern Kurdish poetry: Neo-classical, New, and Modern, was gathered in Iraq during the Fall of 2009. While some studies of Northern Kurdish poetry exist in Northern Kurdish, this study is the first of its kind in English. The first part of the analysis is on the phonological level, where I identify verse forms and rhyme schemes found in the corpus. Much of the information concerning verse forms in Northern Kurdish poetry was obtained by means of interviews with poets and an editor of poetry. The second part of the analysis is on the syntactic level, where I identify deviations from common speech and variations in language that poets capitalize on to write their lines of poetry. In the final chapter, I apply these insights to the translation of an English poem into Northern Kurdish. I also analyze a translation of the same poem by a native speaker, identifying the poetic devices employed.

Read the full thesis here: https://zimannas.files.wordpress.com/2016/11/magin_edward-thesis.pdf

Theatrical Translation: Problems in translating ‘The Sandbox’ from Standard English into Central Kurdish

Haidar N Mohammed Ali and Ibrahim M Ali Morad

Abstract

Translating is a problematic process, and the problems rooted in different aspects, different types of translation might acquire various obstacles, including literary translation and theatrical translation. Amongst other types of translation, the translation of theater has specific problems, as it deals with text and spoken message. Besides, translating from a developed language like English into a minor language of Kurdish may face some other problems. This article, sheds light on the relationship between translation and theater and the problems faced in translating the theater of ‘the sandbox’ from English into Kurdish, and the how the problems of translation solved through different translational strategies.

Introduction

This article deals with the issues raised in translating a theatrical text from Standard English into Sorani Kurdish. In fact, the problems faced in this translation might be from different aspects, as theatrical translation contains textual and extra textual problems, including issues of performance and gesture signs, since any theatrical text is translated to be spoken on the stage.

There have been really few theatrical works translated from English in to Kurdish and performed on the stage, as in general, theatre has not had a good position in the society, the main reason is as stated by (Kardozi, 2012) that "cultural and individual awareness toward cinemaand theatre has been very weak, and Kurds found poetry more important than other forms of literature and art". That is relatively true, but still one can see some important and very significant theatrical works have been translated, for example Romeo and Juliet, Hamlet and Merchant of

Venice by Shakespeare. And the theatrical works which were translated mostly for an educational purpose, for encouraging learners to learn English, rather than any performance on the stage.

In this article, the focus is on the issues in translating a particular theatrical work, *The Sandbox* by Edward Albee, which has been translated from English into Sorani Kurdish in 2008, by Rebwar Zaynadin, at the University of Koya. It was first translated for the purpose of teaching it in a drama class, for the students of translation department, and then was performed on the stage by a group of actors at Koya Institution of Fine Arts. In this essay, in order to discuss the problems of translating the text in details, all the different aspects should be taken into consideration, such as: social, political, linguistic, performative and ideological.

